

ÇARÇIRA

Kovara Çandeyî ya Giştî

اـدـبـ لـهـ مـلـهـ اـدـبـ
الـعـ لـأـدـسـهـ اـدـدـسـهـ مـلـهـ
مـلـهـ مـلـهـ مـلـهـ مـلـهـ مـلـهـ
خـرـقـهـ لـهـ دـلـهـ دـلـهـ دـلـهـ دـلـهـ
مـلـهـ مـلـهـ مـلـهـ مـلـهـ مـلـهـ
دـلـهـ دـلـهـ دـلـهـ دـلـهـ دـلـهـ
مـلـهـ مـلـهـ مـلـهـ مـلـهـ مـلـهـ
مـلـهـ مـلـهـ مـلـهـ مـلـهـ مـلـهـ

Naverok

Kurmanciya Bakur û Dimilî:

- * Li Babet Nivîskar, Ziman û Elifbayê, Pertûkêt Dînê Ezidîyan.
- * Çend Şairên Klasikên Kurd.
- * Rojnamegerîya Kurdî li Kurdistana Bakur û li Tirkîyê-iii.
- * Elik û Fatik(Çirokek folklorik a bi zaravê Dimilî).
- * Beyannamey Şêx Seîdî Pîran.
- * Gergerînok an Siwarê bi tenê - iV - .
- * Hunermendekî Kurd,Lala Abdah Ameen.

Kurmancîya Başûr:

- * Le Çiwarçiray Mehabad da.
- * Zimanî yekgirtûy Kurdî.
- * Baxçey Şa'îran.
- * Pêwendî nêwan Kurd û Rûsyâ.
- * Folklor, Goranîy Sawer kutandnewe.
- * Mihemed Elî Kurdî û Çîrokî Diway serxoşî şetiye.
- * Kurtemejûyekî Kurdnasî le Elmanîya da.

ÇARÇIRA

Adar 1989 hejmar :4, 5, 6

Xwedî: PROJA KURDÎ,

Risingeplan 3,S 163 62 SPANGA, Sweden

Biha: 40 kron e - Ji bo derveyî Swêdê 15 DM.

Bankgiro: 468-1656

Berpîrsiyar: Ferda TURAN.

Redaksiyon: Malmisanij, K. Ali, M. Lewendi, K. Abdulla.

Raxistin: M. Lewendi,

ÇARÇIRA

Kulturtidskrift på kurdiska.

Nr 4, 5, 6 - mars 1989.

Utgivare: Kurdiska Projektet,

Risingeplan 3, 163 62 SPÅNGA.

Ansvarig utgivare : Ferda TURAN.

Redaktion :Malmisanij, K. Ali, M. Lewendi, K. Abdulla.

Xwendevanê hêja:

- * Proja Kurdî ku beşeke Belediya Stockholmê ye, di destpêkê de bîryar girtibû ku şes hejmarên kovara Çarçira'ye derxe. Piştî derketina sê hejmarên pêşîn, ji ber hin şertan û meselên ekonomîk hejmarên din bi derengî ketin. Ji ber vê yekê me bîryar da ku van her sê hejmarên mayî jî wek kitêbekê pêşkêşî xwendevanan bikin.
- * Piranîya gotarêne vê hejmarê di 1986'an de hatine amadekirin. Lewra em uzrê xwe jî xwendevan û xwedîyê gotaran dixwazin ku me bi derengî xist.
- * Wek tê zanîn Proja Kurdî di 1984'an de dest bi karê xwe kiribû û hetta sala 1990' ï wê karê xwe berdewam bike, piştî wê karê projê xelas dibe û Proja Kurdî tê girtin.
- * Em hêvîdarin bi van her şes hejmarên Çarçira' ye bi qasî dilo-pekê be jî fêda me gihîşibe tevgera rewşenbîriya Kurdi em xwe bextiyar dizanin.

Digel silavêne !

ÇARÇIRA

Ev nivîsara jêrin a prof. Qanatê Kurdo ku derheqê du kitê-bên dinê Êzidîyan de ye, ji “Govarî korî zanyarı kurd, Bergî yekem, beşî yekem, Bexdad, 1973 rûpel: 132-172” hatiye girtin. Tu guhertinek an lêzêdekirinek dî nivîsarê de nehatiye çêkirin, me tenê ew ji herfîn Erebi wergerandiye herfîn latini. Wêneyêن nivîsarê jî me lê zêde kiriye.

LI BABET NIVÎSKAR, ZIMAN Û ELIFBAYÊ, PERTÜKÊT DÎNÊ ÊZIDÎYAN

Prof.Qanatê Kurdo

Li babet ayîn,dîn,diyanet,jiyan û şerê Êzidiyan pêşberî dijminê xwe gelek pertûk û govarêt nivîsar hatine nivîsandinê.Mesele,heta navê sed û pêncî pertûk û nivîsarêt kurd li babet Êzidiyan da û bibliyografiya kurdnasiyê da(1) bi yeko yeko hatine nîşankirinê. Mamostayê berêz **Şakir Fetah** jî wek bîst û pênc navê pertûk û nivîsarên li babet Êzidiyan da li pertûka xwe da (“*Yezidiyekan û Ayînî Yezidi*”,*Silêmanî*, 1950) bi yeko yeko nivîsiye.Di vê nivîsara xwe da ez her bi tenê dixwazim derheqa nivîskar,ziman û elifbayê pertûkêt dînê êzidyan,yêt ku çapkırî çend gilîyan(qisan) binivîsim.

Li dunya yê da eşkira ye ku du pertûkêt dînê Êzidîyên kurd hene. Ew pertûk ev in **Kitaba Cilwe û Meshefa Reş**

Li babet wan her du pertûkan da gelek nivîsar bi cûre - cûre zimanan hatine nivîsandinê(nûsrâwin).

Ew merivêt ku derheqa van pertûkan da nivîsîne,hemî Rojhelatnas in.

Heryek ji wan fikrekê li babet wan da nivîsîne,belam heta nika ne eşkira ye kê ew pertûkan nivîsîne û kengê,berê pêşîn bi ci zimanî hatina nivîsandinê? Meram û mebestê min ew e, ku di vê nivîsarê da bi van

pirsan va mujûl bibim û bersiva van pirsan bidim. Gelek lêgerok(lê-kolîner)dinivîsin, ku li sed salîya 11-12 da zemanê xaçperestiyê da pertûkêt dînê Êzidiyan nivîsîne. Lakin çend lêgerok jî dinivîsin ku wextê nivîsandina wan ne aşkira ye. Mesele, **C.Lavkotka** di pertûka xwe da("Pêşketina Nivîsarê", Moskova, 1959,lapere:134-135)dinivîse: "Heta nika wextê nivîsandina vê heykelê li pertûkêt dînê Êzidîyan ne êyan e."

O.L.Vilîçêvskî jî li dîsêrtatsiya(têz) xwe da "Têkstên Êzidî" dinivîse ku ew pertûk li sedsaliya 17 da hatina nivîsandinê.(2)

Belam mamosta Şakir Fetah jî bi gotina merivêt din dinivîse: "Nûsrâwe rasteqînekan nîn, renge sed û penca salék lemew pêş nûsrabêtinewe."(3)

Belam qet kesek ji van lêgerana meseleyekî bi îspat gotin û fikra xwe nayine pêş û nîşan nake. Wisan jî (herweha)lêgerok îspat nakin bere pêşîn ew pertûk bi zimanê Erebî hatine nivîsandinê, yan jî bi Kurdî. Bi nivîsara mamosta Şakir Fetah em pê dihesin ku bi gotina zanyarê ereb **S.Dimiluci**"nivîskarêt pertûkêt dînê Êzidîyan bere pêşîn yan Ereb bûye, yan gawir buye, yan jî merivêt rafiz bûye".

Mamosta Şakir Fetah wisan jî dinivîse, ku bi gotina **Nûrî Paşa**"Nivîskarê wan pertûkan Nestorîyanî bûye." Belam Şakir Fetah bi xwe bi saff nabêje fikra xwe, ew her dinivîse:

"*Katî dananîşyan yek niye, danerîşyan herweha yek kes niye*"(4)

Bi fikra min nivîskarê wan pertûkan ne Ereb bûye, ne gawir bûye, ne Nestorîyan bûye, ne jî rafiz bûye.

Eger nivîskarêt wan Ereb, Nestorîyan, gawir û rafiz bûye, bo çi wan ew pertûk bi zimanê xwe nenivîsîne û bo çi wan bi zimanê Kurdî nivîsîne? Eger wan ev pertûk nivîsîne, bo çi wan bi elifbayekî ciyawaz nivîsîne? Evan pirsan ne eyan in. Wisan jî ne eyan e sebeb çi nivîskarêt van pertûkan ew bi elifbayê ne eyan û ne belav nivîsîne?

Hinek nivîskar dibêjin ku têkstêt dînê Êzidî yêt bi dizî ne, nivîskarêt wan ji tirsa xwe, nikaribûn wan têkstan bi zimanê Kurdî û elifbayê Erebî binivîsiyana. Bi fikra min ne wa ye;em dizanin ku li tarîxê da nav sed saliya 11-13 li welatên Rohilatanêzik da gelek destnivîsar ziddî prensibêt dînê musulmaniyê bi zimanê Erebî yan jî bi Farîsî nivîsandine. Wisan jî eyan e ku li nav wan sedsaliyan da cûre-cûre komêt(komeleyêt)rafiziyan, serokêt cûre-cûre komêt mezheb û dînî, bîr û bâwera xwe ya dînî, fîkr û diyaneta xwe ya dînî bi zimanê Erebî nivîsîne, yan jî bi zimanê Farîsî nivîsîne. Bi fikra min nivîskarêt pertûkêt dînê Êzidîyan jî karibûn ewa têkstêt dînê Êzidîyan binivîsandana, lakin wana ewa nenivîsîne, bi zimanê Kurdî û elifbayê serbixwe û xwerû nivîsîne. Pirs tê gotinê: Bo çi nivîskarêt wan pertûkan ewa nivîsîne? Ber-

siva vê pirsê her ev gotûbêje:Nivîskarêt van pertûkan bi eslê xwe Kurd bûne, ji ber vê yekê ewan xwestîye nivîsara xwe bi elîfbayê serbixwe û xwerû binivîsînin û bi vê cûreyê nîşan bikin, ku milletê Kurd xudanê dînê serbixwe ye,xwedanê elîfbayê neteweyî xwerû ye.

Li vira pêwîste bê gotin:dibe berî nivîsandina wan pertûkan ev elîfba hebûne? Dibê jî wextê nivîsandina wan,nivîsarêt pertûkêt dînê êzidî bi xwe ew elîfba pêk anîne? Em vê pirsê nizanin,lê pêwîst e em bê-jîn,ku nivîskarêt wan ew bi elîfbayekî xwerû û serbixwe nivîsîne, nek ji tîrsa xwe, nek ji wê yekê ku merivêt musulman pê nehesin û pey wan negerin, wan negirin û nekujin.

Sebeb ne ev e;sebeb ew e ku yan elîfbayê Êzidî ji mîj ve hebûye, yan jî nivîskarêt wan pertûkan teze ew elîfba pêk anîye û xwastîye nîşan bike ku milletê Kurd xudanê şaristanîya xwerû ye, xudanê dînê xwerû ye, xudanê elîfbayê xwerû ye .

Dinivîsin ku pertukêt dînê Êzidîyan bi destê merivêt ne-Kurd hatine nivîsandinê. Eger wisan e çîma(boçi) li wan pertûkan da kîmasî û şâşiyêt (çelemeye)ziman tunene(çu nîne).

Bi fikra min her çend ewan çak zimanê Kurdî zanibûya, dîsan ê ewan dê li rîeda şâşiyêt rîzimanû binivîsiyana. Belam bi nihêrîna min, ez di-bînim, ku têkstê Anatas Marî çapkirî da qet şâşîke rîzimana zimanê Kurdî tune. Ji ber vê em bêjin ku nivîskarêt pertûkêt dînê Êzidîyan merivêt Kurd bûye. Pêwîste dîsan bibêjin , ku Bitnerê Îranzan yê ku ev pertûk wergerandine ser zimanê Fransızî û Anatas Marî yê derhe-qâ dîtina(dozîneweya) wan da nivîsîye(5)û wisan jî lêgerokêt din bê şîk dinivîsin,ku herdu pertûk bi destê merivêt Kurd bi zimanê Kurdî hatine nivîsandinê. Bi vê gotinê û li ser binaxe û binyafêt corê nivîsandî em dikarin bêjin ku nivîskarê pertûkêt dînê Êzidîyan Kurd bûye, ku vê pirsê îspat bikin pêwîste em bi zimanê wan têksta va mujûl bin. Li tarîxa lêgerîna van têkstan da lêgerok dinivîsin ku bere pêşîn têkstê pertûkêt dînê Êzdî hatibûye terceme kirinê ser zimanê Erebî, li paşê ji zimanê Erebî wergerandine ser zimanê Îngilîzî, Fransızî û zimanê din, nika hemû terceme kom nekirine li cîkî. Cem min her bi tenê du şîveyêt wan pertûkan hene:

1-Yek ya çapkirina Anatas Marî ye (Foto kopya wê tekstê bi elîfbayekî xwerû ye).

2-Yek jî mamosta Şakir Fettah çapkirîye. Ew dinivîse ku ewî ew têkst ji zimanê Erebîwergerandiye ser zimanê Kurdî.

Min têkstê Anatas Marî û têkstê Şakir Fettah beramberî hev kirin û ez pê hesiyam ku li gelek ciyan ciyawazî û cudayî li nav wan da heye. Eva nîşan dike ku mamosta Şakir Fettah yan têkstê xwe bi rast terce-

me nekirine, yan jî divêt tekstê Erebî yê ku Şakir Fettah jê terceme kîrine, ji tekstekî Kurdî din hatîye wergerandinê . Li vira ez nikarim binivîsim ji kîjan(kam) şîveyê tercuma Erebî hatîye wergerandinê, ji têkstê eslî yan jî ji têkstekî ne eslî? Sebeb vê yekê ez nikarim saff bîkim kîjan têkst yê eslî ye, yan nêzîkî têkstê bere pêşin e. Pirsa qurs ewe, ku qet li têkstekî da sala nivîsandina wan nehatîye nîşankirinê. Belam her çend têkstê Anstas Marî bi elisbayekî cuda û xwerû hatîye nivîsandinê û elisbayê wî jî ne wek elisbayê Erebî, Nestorîyanî Û Yehudî ye. Ez difikirim ku têkstê Anstas Marî yê eslî ye(binaxeye) yan jî şîveyekê bere pêşîne.

Hewes û ıntirêsa min bi têkstê Anstas Marî va heye,çimkî bi harîkarîya lêgerîna wî em dikarin saff bikin bo çi ew bi elisbayê Erebî nehatîye nivîsandinê? Ji bo çi bi arîkarîya elisbayekî din hatîye nivîsandinê? Hemî lêgerok dînivîsin ku pertûkêt dînê Êzidîyan bi zimanê Kurdî hatine nivîsandinê, Mesele; C.Lavkotka li kitêbê xwe da “Pêşketina Nivîsarê” li rupelê 135 da dinivîse: “Zimanê van herdu pertûkan zareve Kurdî cîga ye” Mamosta Şakir Fettah jî dinivîse: “Yezidiyekan her dû nusrawî ayîniyan heye: Cilwe û Mesfeha Res, herdukişîyan be zimanî Kurdî nusraunetewe.”(6)

Ev gotinêt jorê rast in,lê heta nika nehatîye gotin û nivîsandin: Bi çi zaravê Kurdî ew pertûkane hatine nivîsandinê.

Li Kurdnasiyê da heta nika texmîn dikin ku ev pertûkane bi zaravê Kurmancî hatine nivîsandinê. Vê texmînê bi gotûbêjêt jêrîn me didin bawer kirinê 1- Êzidî bi zaravê Kurmancî taxivin,
2- Kakilê pertûkêt nivîsandî dîn û ayîna Êzidîyan e, her bi tenê divêt dîn û diyanetê wan Kurmancî nivîsandî be.

Belam pêwîste bêjin; ku bi arîkarîya lêgerîna lêgerokêt berê û bi lênihêrîna xwe li têkstê Anstas Marî çapkirî ez hatime ser wê fîkrê ku pertûkêt dînê êzidîyan bi zaravê kurmancî nehatîne nivîsandinê, bi soranî hatine nivîsandinê. Eva yeka eşkira dibe û tê ber çavan wextê em wan dixwînin beramberî zaravê kurmancî dikin. Mesele; wextê ez wan pertûkan dixwînim, ez di wan da meseleyêt wusan dibînim, yêt ku her bi tenê li soranî da didine xebitandînê (bekar dehênin). Mesele;lî tekstê wan pertûkan da ev meseleyêt jêrîn hene:

1-Cînavêt kurtkirî (kurtkiraw):-*m*, -*t*, -*i*, -*man*, -*tan*, -*yan*.

2-Pirtika navêt naskirî(nawekanî naskiraw):-*eke*, -*ekan*,

3-Li şûna pirtikêt hevbendî(îzafât):(yêt eslî jin/mê) *a,e,yêt eslî mîr/ nîr:-ê,-i*.

Li van pertûkan da pirtika hevbendî-î di emîlînin(bikartînin). Belam ew li soranî da eslî jin û mîr kêm nîşan dikin, li kurmancîya bakur da cînavêt

kurtkirî cî pirtika navê baskirî yan kêm bi kartînin yan jî qet bi kar naynin. Ev nîşana cudayîyê û ciyawazîyê dikine nav kurmancîya bakur û kurmancîya jêrîn(soranî).

Eger em baş li têkstêt pertûkêt dînê êzidîyan yêt Anastas Marî çapkirine bînêrin em dê bibînin ku li nav wan da ev nîşana têne ber çavan û eva îspat dike ku pertûkêt dînê ezidîyan bi soranî hatine nivîsandinê.

Ku xwendkarêt delal û xoşewîstê me vê gotinê bawer bikin, ez wan têkstan li du vê nivîsara xwe bi elisbayê latînî li tenîsta wan çap dikim. Nika pirs tê gotinê : eger ew pertûkana bi soranî hatine nivîsandinê, bo ci ew bi zaravê kurmancî nivîsîne û kê kengê ew nivîsîne? Heta nika ev pirsana jî nehatine gotinê û bersiva wan divêt bê nivîsandinê.

C.Lawkotka li kitêba xwe da dinivîse : “Heta nika bi me va êyan e ku eva heykeleke nivîsandîya, lê ci wextê peyda bûye, Bitner nîşan nekiriye.”(7) O.L.Vîlîçvîskî jî dinivîse: “Têkstêt dînê êzidiyan li sedsalîya 17 da hatine nivîsandinê.”(8)

Mamosta Şakir Fettah jî li kitêba xwe de dinivîse: “*Reng e sed û pena salêk lemew pêş nûsrawneewe*” . Ema piraniya (zorbeya)lêgerokan hesab dikin ku ev pertûkane li nav sedsalîya 11-12 da hatine nivîsandinê. Bi fikra min eva gotina paşîn rast e, lê sed mixabin ji bo îspat kirina vê yekê bona ku pirs temam bê saff-kirinê, lazim e çend meselan bînine ber çavan.

Gelek mirov zanin ku wextê şêx û pîrêt êzidîyan serhatîya serokêt şêxêt xwe bi ’edetî gilî(qisa) dikin ew dibêjin ku kitêb û defterêt dîn û ayîna êzidîyan bi destê **Şêx Hesen**, bi qelema Şêx Hesen hatine nivîsandinê. Hinek Êzidîyêt Sovyetîstanê nika jî dibêjin bi “**qelema Şêx Adî**” .

Bi nivîsara Şakir Fettah, Şêx Hesen li sedsalîya hicrî 594 da (1194-1195) ji da-yika xwe bûye, ku ew neviyê birê Şêx Adî bûye. Bi melûmatiyêt ereban Şêx Adî li sala 1062 da çûye rehmetê. Dinivîsin ku navnîşanêt Şêx Adî ev bûne: **Şêx Adî bin Misafir Merîwan**, hozanekî bi lîmet û zanyarê dîn û dîyanet bûye û nivîsarât wî bi zimanê erebî hene.(9)

Bi vê yekê em pê dihesin, Şêx Adî û neviyê wî Şêx Hesen bi eslê xwe ji bine-malekê ne, ji xelkê Merîvanê bûne.

Eva nîşan dike ku nivîsandina pertûkêt dînê êzidîyan bi navê du merivan va girêdayî ye; herdu meriv jî Şêx Hesen û Şêx Adî bûne û herdu ji **Mêrîvanê** bûne.

Mêrîvan jî çawan êyan e heta nika cî û wargeyê Kurdê Soran bûye. Eger em hesabê van malumatîyan bibînin em dê fam bikin ku çima pertûkêt dînê êzidîyan bi soranî hatine nivîsandinê. Bi vê şirokinê, bi vê gotinê em têne ser wê fikrê ku li nav sedsalîya 11-12 da pertûkêt dînê êzidîyan bi destê soran hatine nivîsandinê.

Li vira pirsâ ferz û muhim ne ewe; kê nivîsiye? Şêx Adî nivîsiye yan Şêx He-

sen? Pirsa bi nix ew e ku nivîsandina wan bi navê merivêt 'eyan û navdar va girêdaye, bi navê wan merivan va girêdaye, yêt ku li nav sedsala 11-12 da jiyane û eslê xwe jî soran bûne. Eger em hisabê van gotûbêjan bibînin, eger em malûmatîyêt tarîxî û serhatiyêt zargoñ bawer bikin em dê bêne ser wê fîkr û ser wê gotinê ku dîn û diyaneta êzidîyan fîkr û bîr û bawerîya wan der heqa afirandina dunyayê heta sedsalîya 11-12 li nav soran wek êzidîyêt kurd peyrevêt dîn û diyaneta pêşketîyêt xwe (bav û bapîrêt xwe) bun û paşê werge-riyane ser dînê musulmanîyê.

Bi gotûbêjêt 'ereban, Şêx Adî û Şêx Hesen ji binemala wan xelîfan bûye yêt ku li nav salêd 661-750 da li İraqê û Şamê hukumdarî dikirin(10). Ew dinivîsin ku ji vê binemalê navê du xelîfan hebûne: Xelîfe **Merwan I. El-Hekem** û Xelîfe **Merwan II El-Hîsmar**. Dinivîsin; Şêx Adî bin Misafir Merwan ji van Merwaniyan bûye. Bi vê gotinê Şêx Adî hesab dikin ereb.

Li babet vê gotinê û vê nivîsarê divêt binivîsim, ku navê **Merwan** çawan(weku) navê xelîfe nexebera(newiseya)erebî ye, ew xeber ji zimanê kurdî ketîye nav zimanê erebî;ew xeber ji erebî da şûna xebera **Merîwan** hatîye nivîsandinê. Di kurdî da herdu şîwe jî hene:**Merwan/ Mervan/Merîwan**. Navê Merwan/ Merîwan yan navê qebîla kurdê Merîwanê ye, yan jî navê cî û warê(nahîya) Merwanê /Merîwan e.

Bê şik herdu xeber jî xeberê kurdî né. Bi qanuna zimanê erebî Merwan yan Merîwan nayê şîrokirinê. Zimanê kurdî da xeberêd mîna vê xeberê esîrandî gelek in, mesele; Merwan, Merîwan, Helwan, Şîrwan, Sîrwan, Berîwan yêt din.

Eger em gotina tarîxzanan bawer bikin, ku xelîfît Umeyedan û Îbbasîdan li wextê hukumdarîya xwê gelekî ketibûn ber îtaeta şaristanîya Sasanîyan(11). Em dê bêne ser wê fîkrê ku Şêx Adî bin Misafir Merwan bi eslê xwe ji Merwanê/Merîwanê ye.

Eger em gotûbêjêt nivîskarêt ereban qaîl bin, bêjin eva gotina ne rast e û bêjin Merwan xebera erebîye, dîsan divêt em bêjin pertûkêt dînê êzidîyan bi destê Adî bi zaravê kurmanciya jêrî(soranî) hatîye nivîsandinê. Eva pirsa mihim e û bi ferz e.

Di tarîxê da eyan e, gelek kitêbêt dînî, filosofî, tarîxî,şaristanî bi destê mirovêt ne ereb (bi destê Farisan, Tirkanû Kurdan)bi zimanê erebî hatine nivîsandinê jî; belam qet kesek nabêje û nanivíse ku nivîsarêt wan merivan ne yêt erebî ne, kesek wisan jî nanivîse ku ew nivîskar bi eslê xwe ereb bûne .Wi-san jî kesekî nenivîsiye ku bîr û bawer,diyanet û merîfeta wan kitêban ne yêt musulmaniyê ne; kesek tiştît awa heta nika nenivîsine, çimkî pirsa mihim ewe bi ci nivîsar hatine nivîsandinê û derheqa ci de wê nivîsarê da hatîye nivîsandinê; meseleyeke heweskar û intirêş jî heye; pêwîste ez wê jî bêjim. Ew pirs ev e ; ku heta nika li nav êzidîyan da şîweyêt dîn û dîyaneta êzi-

dîyan yêt bi zargotî jî hene. Lê sed car mixabin, heta nika ew têkst kêm hatîne kom kirinê. Eger ew nivîsandî bûna, çapkırı bûna me dê ew beramberî têkstêt Anastas Marî çapkırı bikira û em dê pê bihesyan qîmetê wan tarîxî û şaristanî çi ye.

Heta nika li Sovêtistanê her du têkstêt folklorî yêt dînê êzidî ji zarê şêxan hâtine nivîsandinê. Ew her du têkst jî nika li cem min in, her du jî bi zaravê kurmancî ne, ew der heqa efirandina dunyayê neqil dikan. Têkstêt bi destê **Loza Kazaryan** jî zarê Şêx Hemze sala 1920 da hatiye nivîsandinê, navê wê têkstê “*Qewla zebûna meysûre*”(12). Têkstek jî min sala 1939 da ji zarê Eloyê Silo li gundê Tîsêlê nahiya Axalkalakê komara Gurcistanê nivîsiye. Navê wê tekstê jî “*Surê Efrîna Dunyayê ye*”. Her du têkst jî bi stran têne gotinê, fîkr û kakilê wan mîna (wek) fîkr û kakilê her dû têkstêt Anastas Marî û Şakir Fettah çapkırı “*Meshefa Reş*” in. Li gelek ciyan ev têkstana mîna hev in, li hin ciyan jî ji hev dûr in.

Pirsa beramber kirina van têkstana, lêgerîna wan gelek mihîm e, çi li mesela tarîxa dîn û dîyanet û îdolojîya neteweyê kurdan, çi li mesela ziman û zara-vêt kurdan, çi li tarîxa lêgerîna şaristanîya neteweyê kurdan. Heyîn û nebû-na têkstê folklorî bi zaravê kurmancî û têkstêt Anastas Marî bi zaravê soranî nîşan dikan ku ew têkstane bi fîkr û kakil ve nêzîk hev in . Eger em tenê ser wê gotinê, pêwîste em bêjîn ku dîyaneta êzidîyan, dînê wan, li nav **Kurdistanê** belavkirî bû , ku êzidî heta nika jî li ser dînê bav û bapîrêt xwe diçin, ku kurdêt musulman bi zorbeyî û destê zorê wergeriyane ser dînê musulmanîyê.

Li paş vê gotûbêjê pêwîst e çend gîlşyan (bêjeyan) jî derheqa elîfbayê pertû-kêt dînê êzidîyan binivîsim.

Li nivîsara xwe ya jorîn da min li ci-cîyan çend qise derheqa elîfbayê pertû-kêt dînê êzidîyan gotin. Nika jî ez dixwazim çend gotûbêjan derheqa reng û ruyêt wan, derheqa sistem û prensîpâ pêkanîna wan binivîsim.

C.Lavkotka li kitêba xwe da “*Pêşketina Nivîsarê*”“*Pêşkewtinî nûsraw*” li rûpela 135 da dinivîse “Elîfbayê êzidî 33 tîpin, zorbey(pi-ranî) xwe ji elîfbayê Nestorîyanî ye. Tê da çend tîpêd xwerû hene; Ew tîp jî şexet êzidîyan zêde kirine, ku elîfba minasibî zaravê têkstan be. ” Bi fikra min eva gotina ne rast e. Elîfbayê pertûkêt dînê êzidîyan ne mîna elîfbayê Nestorîyanî ye. Ew wisan jî ne mîna elîfbayê erebî ye, ne jî mîna yê Yehûdî ye. Ew elîfbayê xwerû û neteweyî ye. Belam pê-wîst e bê gotinê ku elîfba li bin itaeta prensîp û sistema elîfbayê erebî hatîye rêk û pêk kirinê (binêre tabloya beramber kirina elîfbayan li jê-rê ye).

ئەن سەرەت - نەزەرەت	EREBI
ئەن سەرەت - نەزەرەت	YAHUDI
ئەن سەرەت - نەزەرەت	NESTORIYANI
ئەن سەرەت - نەزەرەت	EZDI-KURDI
ئەن سەرەت - نەزەرەت	LATINI-KURDI
ئەن سەرەت - نەزەرەت	EREBI
ئەن سەرەت - نەزەرەت	YAHUDI
ئەن سەرەت - نەزەرەت	NESTORIYANI
ئەن سەرەت - نەزەرەت	EZDI-KURDI
ئەن سەرەت - نەزەرەت	LATINI-KURDI

Tabloya beramberkirina elifbayan

Eşkera ye ku nivîsandin û xwendin bi elîfbayê erebî ji aliyê destê rastê despê dibe û berbi aliyê destê cepê diçe. Nivîsandin û xwendina têk-stêt pertûkêt dînê êzidîyan jî bi vî cûreyî ye. Li elîfbayê erebî da sê tip bi kar tînin bo nîşankirina çend sewtêt denganî li elîfbayê êzidî da jî wisan e.

Di herdu elîfbayan da prensîp û sîstema nîşankirina sewtêt denganî bi cûrekî ye. Mesele; tîpa I (*elîf*) li destpêka xeberê (wişeyê), li nîvê xeberê û li kutayîya xeberê sewta denganî (a) nîşan dike. Ew tîpa bi reng û cûrê xwe va, bi nivîsandina xwe vali elîfbayê erebî da, jî wisan tê nivîsandinê. Li elîfbayê erebî da tîpa (g) (*waw*) di sewtêt denganî (u,o) û di sewtêt bê denganî (v,w) nîşan dike. Li elîfbayê êzidî da şûna vî, tîpa (7) dinivîsin û ew tîp mîna tîpa (9) sê sewtên denganî (u,u,o) û du sewtên bê denganî (v,w) nîşan dike. Li elîfbayê erebî da bi arîkarîya tîpa (yê) sewtê denganî (ê,i) nîşan dikan, li elîfbayê êzidîya da jî wisan e. Di wê da bi arîkarîya tîpa (4) her du sewtêt (ê,i) nîşan dikan. Li elîfbayê erebî da sewtêt denganî kurt (e,i) nîvê xeberan da nanivîsin (nîşan nakin), wisan jî li elîfbayê êzidî da sewtan li nîvê xeberan da nîşan nakin. Li vira eyan

dibe ku prensîpa nîşankirina sewtêt denganî li herdu elîfbayanda mîna hev in, yan yek e. Eva qanûna û prensîpa wisan jî li nîşankirina çend sewtêt bê denganî da tê ber çavan.

Mesele; di herdu elîfbayan da bi arîkarîya tîpekê sewta (b) nîşan dikan.

Li elîfbayê êzidî da çar tîp zêde hene, ew her çar tîp ev in : **H, X, <, P,** Ev tîpana sewta **Z** (yê zimanê kurdî) nîşan dikan. Eyan e ku di elîfbayê erebî da çar sewtêt nêzîkî hev hene; ew sewt ev in : **ذ ط ح ز** Di zimanê kurdî da ev sewt tunene. Eva mesela jî nîşan dike ku elîfbayê ezidî bi prensîpa pêkanîna elîfbayê erebî hatîye danînê û çêkirinê. Yekêti û wekhevîya prensîp û sîstêma pêkanîna elîfbayê êzidî û erebî bi meseleyêt din va jî têr ber çavan û nîşan dikan ku elîfbayê êzidî bin itâéta elîfbayê erebî da ye. Lakin pêwîste bêjin ku elîfbayê êzidî bi temamîya xwe va ji elîfbayê erebî cudatir e. Ew wisan jî ji elîfbayê Nestorîyanî û yê Yehûdî ciyawaztir e. Ciyawazî û cudadî ya wî ji van elîfbayan di van meseleyêt jêrînda eşkera dibe. Tîpêt êzidî bi ferq û cawaz têne nivîsandinê, di elîfbayê êzidî da nîşanêt dîyakrîfik (niqtik û nîk) ne li ser tîpan hene, ne jî li bin tîpan hene. Di elîfbayê erebî da tîpêt yek cûreyî bi arîkarîya nîşanêt dîyakrîfik ji hev cuda dikan. Mesele; nîşan (2) bi dîyakrîfik sewta (H) nîşan dike, bi niqtikekê li ser (2) sewta (X) nîşan dike, bi niqtikekê li bin (2) sewta (C) nîşan dike. Bi sê niqtikan li bin (2) sewta (C) nîşan dike. Belam li elîfbayê êzidî

da bi guhastina halê tîpan sewtan ji hev cuda dîkin; Mesele; tîpa (T) li elîfbayê êzidî da sewta bê denganî (T) nîşan dike, lê di halê wergerandîda li sewta denganî (ê) nîşan dike; tîpa (P) li elîfbayê êzidî da sewta (R) nîşan dike, lê di halê wergerandîda (U) sewta (N) nîşan dike, Di elîfbayê êzidî da tîpa (P) sewta bê denganî (Z) nîşan dike, lê di halê paş û pêş wergerandî da ew tîp (Q) sewtêt denganî (î, ê, y) nîşan dike .

Li elîfbayê êzidî da tîpa (W) sewta (S) nîşan dike, lê di halê wergerandîda (M) sewta S nîşan dike. Xulase prensîp û sistema nîşankirina sewtan li elîfbayê êzidî da li gelek alîya va ji elîfbayê miletêt cîran ciyawazire.

Ciyawazîya elîfbayê êzidî ji elîfbayê erebî, Nestorîyanî û yê Yehûdî wisan jî bi rêz û kaşet xwe rast va tê ber çavan. Tîpêt elîfbayê erebî bi raste-rast rêzki-rî û goşekirî têne nivîsandinê, elîfbayê êzidî bi rêzkaşa zaxê xwe va elîfbayê "kvadrafye", lê elîfbayê hurandî û civane ye.

Bi lênihêrîn û lêgerîna xwe ez tême ser wê fikrê, ku elîfbayê êzidî bi destê merivê hozan, bi lîmet û zanyar hatîye pêkanînê, bi destê wî merivî hatîye danîn û çêkirinê, yê ku rind tarîxa nivîsandina elîfîbayan zanibûye û karibûye elîfbayê neteweyî pêk bîne. Ez li ser wê fikrê me, ku Şêx Adî serekê şêxet êzidîyan ew elîfbaye pêk anîye û pertûkêt dîn û ayîna êzidîyan nivîsiye. Bê şik meram û mebestê wî ew bûye ku ewî xwestîye nîşan bike ku dîn û diyaneta kurdêt êzidî cuda ye, ku ayîn, dîn û diyaneta wan ji pûçbûnê, winbûnê biparêze, ku peyrevê wî li cem xwe bihêlin, bixwînin, ezber bizanin û kakilê wan pertûkan ji êzidîyan ra bi ezber bêjin, lê nedine bi destê merivêt biyanî (ereb, yehûdî û gawir).

Vî teherî (bi vê cûreyê) ew pertûkane heta nika jî ji govekekê (silsilekê) ketiye destê govekeke din, lê nebûye elîfbayê neteweyî. Ew elîfbaya nebûye elîfbayê neteweyî, çimkî berepêşîn cem şêxet serekê êzidîyan bû ye. Ew şêx berpirsiyar bûne, wan pertûkan li cem xwe bihêlin û wek pertûkêt muqeddes nedine bi destê kesekî. Bi vê cûreyê ew pertûk nav komêt êzidîyan da maye û belav nebûye.

Eyane ku dîn û ayîna musulmanîyê bi zora şûr li nav kurdêt êzidîya belav bûye, êzidî mecbûr bûn xewle û nepenî (pena) bijîn. Sebebê vê yekê elîfbayê kitêbêt dînê wan nebû elîfbayê neteweyî. Sebeb vê yekê wî elîfbayê danîne "Elîfbayê Sirî" û navê pertûkêt dînê êzidîyan jî danîne "Pertûkêt Sirî" li rohilatnasîyê da ev nav li wan kirine, lê bi fikra min eva ne rast e, çimkî tarîxa peydabûna elîfbayêt milletên din li dunyayê wisan jî bûye, li bere pêşîn merivêt hozan, xudênas, elîfbayê pêkanîne, li paşê hêdî hêdî ew elîfba belav bûye û bûye bi elîfbayê neteweyî.

مِلْجَه مَبْرُوك

مُبَاشِر

اَنْدَلُسِيَّةِ مَلْجَه مَبْرُوك
الْعَلِيِّ رَاجِيَّةِ اَدَمِيَّةِ سَرَادِدَسِيَّةِ الْمَلَاهِ
بَارِقَه تَاجِيَّه زَيْلَه اَنْجَيَه اَنْجَيَه
كَوَافِه دَهَسَه دَهَسَه دَهَسَه دَهَسَه
بَارِقَه زَيْلَه اَنْجَيَه اَنْجَيَه اَنْجَيَه
دَهَسَه دَهَسَه دَهَسَه دَهَسَه دَهَسَه
بَارِقَه زَيْلَه اَنْجَيَه اَنْجَيَه اَنْجَيَه
دَهَسَه دَهَسَه دَهَسَه دَهَسَه دَهَسَه
بَارِقَه زَيْلَه اَنْجَيَه اَنْجَيَه اَنْجَيَه
دَهَسَه دَهَسَه دَهَسَه دَهَسَه دَهَسَه

مَلْجَه

Rûpelek ji Kitêba Cilwe

Çend qisan jî bêjim çawa pertûkêt dînê êzidîyan hatibûn dîtinê û xwendinê. Anastas Marî, yê ku pertûk dîtibûn û dabû Bitnêrê ïranzan ku ew wan bixwîne, li pêşîya têkstanda di kitêba Entropos da dinivîse: Li çiyayê Sincarê li kitêbxana Lalêşê, li sindoqekî hesinkirî min dîtin. Kîfta wê sindoqê li cem serekê Şêxêt êzidîyan bû, her bi ïzna wî nobedarê kitêbxanê derê sindoq ve-dike. Pertûkêt dînê êzidîyan digel kitêbêt Yûnanî, Asûrî, Erebî qedîm veşartibûn (13). Anastas Marî nabêjê çawan ewî ew pertûk ji sindoqê derxistin, kî da wî, yan jî ewî çawan reşê wan jî ber girtî. Eva pirsa ne eyan e, û ew ewqas jî ne mihim e, pirsa mihim ew e ku ewî ew pertûk dîtin û dane Bitnêr, ku bixwîne û tercime hîke. Bitnêr ew pertûk xwendin tercime kirin. Bi fikra min ew yeka miyesser bûye (hatîye serî) bi du cûra: yan ew bi xwe bi arîkarîya zanîna xwe, zanîna zimanî û elîfbayan ewî ew pertûk xwendin û tercime kirin, yan jî wextê Anastas Marî ew pertûk dîtin, ew li ba şêxêt serekêt êzidîyan hînî elîfbayêt êzidîya bûbû û li Bitner ra gotibû. Bersiva pirsa xwendina pertûkêt dînê êzidîyan ev e.

Dîtina (dozîneweya) wan, çapkîrin û tercumekirina wan pirseke gelek ferz û muhîm e li lêgerîna şaristanîya neteweyê kurd da.

Heta nika em dikarin her tenê li babet van pertûkan binivîsin. Dibe pertûkên din jî yêt ayîn û dîyaneta êzidîyan li cem şêxêt êzidîyan hebin. Bê şik ew pertûk hene, mesele li nav Êzidîyê Sovyetîstanê dibêjin ku “Zebûn” û “Mişûr”hene, Şêx wan nîşanî kesekî nakin, veşartine, çawan nivîsara muqedes “Bi nivîsara Auasten Layard em pê dihesin ku kitêbêt êzidîyan arizî hebûne, mesele, ew li kitêba xwe da “Discoveries in Nîneveh and Babilonda, London” (sala 1853, rûpelê:92) dinivîse:

Rojekê sibe qewal Yusif bi katibê Şêx Nasîva celde - kitêbekî anî nîşanî min kir, çawan ez pê hesiyam katib dikaribû wê kitêbê bixwîne. Di wê kitêbê da çend laperêt berê kevin hebûn, li wan laperanda beyta Şêx Adî hebû, li beyta da Şêx Adî pesnê xwe dide çawan efrînderê hemû tiştan, hemû ruhberan li rû dunyayê” Layard wê beytê tercume dike îngilîsî, lê sed mixabin texstê kurdî ewî çap nekirîye. Li paş tercuma xwe ya beyta Şêx Adî, Layard dîsan dinivîse:

“Li berê gelek pertûk, kitêbêt êzidîyan hebûne belam ew kitêb û pertûkane li şeran da win bûne, yan jî hatine sûtandinê”. Derheqa wê ye-kê da ew gotina Qewal Yusif tîne bîra xwe, ew dinivîse: “Qewal Yusif gote min, ku berê kitêbêt êzidîyan arizî hebûn, wextê mîrê Rewandîzê êrisî ser êzidîyan kir ew kitêb û pertûk win bûn û fevitîn; Ewî li babet beyta dayî bi min got ku têda qanûna ayîn û dînê êzidîyan nivîsandîye.

Ewî wisan jî got ku kitêbeke diyaneta êzidîyan heye, reşê wê li Tarâ-nê(?) heye. Bi gotina Qewal Yusif dumaya beyta ku min tercime kirîye li “ Kitêba Teselyeta Feqîra da heye”(14).

Meselêt jorin nîşan dikin ku pertûk û defterêt êzidîyan gelek hebûne lê bere-bere li nav şerê musulman û êzidîyan da win bûne, yan jî hatîne sûtandinê. Mesele, sala 1837 wextê sereskerê Romê, **Reşîd Paşa** bi êskerê xwe va hate ser êzidîyan gelek gund xirab kirin, jin û mîr qîr kirin, talan birin, ziyaret herimandin, tawis birin, jin û zaro jî hêşîr birin.

Gelek şerê awa li êzidîyan qewmîne, Roger Lescot kitêba xwe da gelek meselan tîne ber çavan êskerê Romê zeftkar, axa,beg û derebegêt Surmanan êrişî ser êzidîyan kirine, gund xirab kirine, jin û mîr kuştîne, talan kirine, zîyaretêt êzidîyan ruxandine. Belam pêwîste dîsan bêjîn ku êzidîyet kurd heta nika mane, xwe parastine. Ser ayîn û dîn û dîyaneta xwe jîyane. Bê 'şik heta nika pertûk û defterêt qanuna wan, ayîn û jîyîna wan, adetê xwe parastina wan li wan kitêb û defteran da hatîye nivîsandin û helbet li cem şexan, li cem meznêt êzidîyan mane, kî dizane dibe rojekê ew kitêb û pertûk bikevine destê zanyaran û dê bêne lê geyînê têda bê ber çavan yeketîya ayîn,dîyanet,ziman û tarîxa kurdêt êzidî û kurdêt Surman (15). Li kutayê da divêt bêjim ku berhevîya gotin û nivîsandina ev gotûbêjêt jêrînin.

1- Pertûkêt dîn û ayînê êzidîyan, yêt Anastas Marî dîtin û bi arîkarîya Bitnêrê ûrzan hatine çapkiranê, bi destê Şêx Adî, serokê Şêxêt êzidîya li sedsalîya 11-12 da hatine nivîsandinê.

2- Ew pertûkane bi soranî elîfbayê xwerû, serbixwe û neteweyî hatine nivîsandinê; bi serhatîyêt bi âdetî, yêt Şêxêt êzidîyan û bi nivîsana zanyaran tê îspat kirinê ku nivîskarê wan Âdî bûye.

3- Bi lêgerîn, wan pertûkan em pê dihesin û têne ser wê fikrê, ku heta sedsalîya 11-12 kurdê soran, yêt nahîya Merîvanê li ser dîn,dîyanet, ayînê bav û bapîrêt xwe bûne,yan jî peyrevêt dînê êzidî bûne.

4- Li paş parçê nivîsara li ser postê, ku li nahîya Suleymanîyê hatîye dîtin (16) em dikarin bêjîn ku pertûkêt dînê êzidîyan heykela lêtratura dûîne ku bi zaravê soranî (kurmancîya jêrîn) nivîsîne.

5- Eva heykela nivîsandî gelek û gelek giranbiha ye, qîmet û nirxê wî

gelek e, nek bi tenê li babet lêgerîna ayîn,dîn
û dîyaneta neteweyê me, lê wisan jî li babet lêgerîna tarîx û pêşketina
ziman û lîteratura me neteweyî.

QEWLÊ ZEBÛNÊ MEYSÛR

Ci zebûneke meysûr e
Çem 'ezir melik Ferxedîn destûr e
Metha bidin behrêd kûr e
ci zebûneke kêm taqete
Behrêd giran didin usfete
Me cema bin bi ev zare
Werin ji vê behrê bidin xebere
Wê behrda hene durêd cewahire
Metha bidin kibîr
Ev textê ser bûn mîr
Ya îlaho tu axayî, tu wezîrî
Xasa mîr dinase
Padîşahê durê kase, Kire rikna çiqasî esas e
Kire rikna riknî
Dur ji heybetê hincirî
Durê taqet nekir ber sekinî
Durê taqet nekir hilgirî
Dur ji renga xemilî
Sor bû, sipî bû, sefirî
Sor bû, sipî bû, geş bû
Hingê ne êrd bî,ne ezman bî,ne êrş bî
Padişayê min kê ra kêf xweş bî
Padişayê min kê ra herê kir
Husnetâ ji xwe çêkir
Şaxa mobetê jê çêkir
Jê çêkir şaxa mobetê



Yezidi kawals, drawn by Henry Layard in 1849.



Lalish sanctuary: east wall of inner courtyard, photographed by Athelstan Riley in 1886.

Destûr avîte qelema qudretê
Şikir avît me ser peşka mobetê
Padîşayê min li hukmê xuyî giran e
Avît nav van zor erkane
Werîn binêr Xarizî Nûrî ci nîşane
Xarizê Nûrî bi nave
Durê du cewahir hatin nave
Yek eyne,yek besere
Padîşayê min da durê nedere
Meksûs çendî bû çava
Sunet,qendîl malix mane heva
Birine ber padîşayê min şikayeta
Ya îlaho me ji te dibe muhbete
Me li vê xoşkir suhbete
Hed û sed çêkir
Heqîqet, şerîet, terîqet, ji hev cihê kir
Sinet mexbî bû,dihar kir
Padîşayê min dur anî
Mohbet avîte nave
Ezîzê min pê hilda çave
Padîşayê min ci ji durrê ra go
Jê vurîya avê
Padîşayê min ci gote durrê
Av ji durrê vurîya
Padîşayê min sefîne ser e
Serkî digere çar kenare
Mala xwe da sekînî go:“Heq were”
Av ji durrê verîya
Padîşayê li merkebê siwar bû
Lê seyirîn her çar yare
Ajote lalêşê go:“Heq were”
“Heq were”go sekînî
Havenet avîte behrê,behr pê meyinî
Dixanek jê dixinî

Çarde tebeq erd û ezman pê nijinî
Ev car bû padîşayê min sexir kire kere
Kire rikna riqaşî membere
Nika axa jê xeber da
Şaxekî din jî ji ber da
Kire rikna ezmana, erda
Padîşayê min rebîl û semed
Ewel te efişandin milîyaket
Te paşê ava kir doje, cinnet
Padîşayê min erd çêkir,ezman guheztin
Mecala erd bi rastin, nobeta qaza rastin
Çiqas padişayê min dunya dikir sefer e
Şikir dikir kevirê kiyer e
Pê nijinî rokkane çiqası mexbere
Îlaho rabin etata
Te zaîra dî çiqası xwî ya qeta
Te hinga jêra çekir doje,cinnete
Padişayê min erd çêkir, ezman guheztin
Mecale erd bi rastin
Nobeta qaza rastin
Lalêşê ji ezman dihat e
Erd şîn dibû gîha
Pê çayiran çiqasî qinyate
Padîşayê min îmî kir esas e
Şembê birî kirase
Çarşembê kir xilase
Paşê hevsed salî hev sur hatin dura nikase
Hevsed salî Ji berî Adem jimare
Ardê xwe ra negirtî şiyare
Hetanî lalêşê nûrî navda hinare
Lalêş navda dihate
Erdê şîn bû nebate
Pê zayinî Zêndî qinyate
Çar qisman anî, tev hinarand
Pê xalibe adem penijand
Nika şêxa ve mehlûm e

Hê di har nebû bû saz û qudûme
Navîna Adem hevsûr zor tixûb e
Hevsûr gerîya hat hindave
Xalibê Adem mabû bê kave
Bêje ruho tu çima naçî nave
Bandava hedirî
Def û şibêbî hat bihirî
Nûra Mobetê hingavte serî
Ruh hat qalibî Adem da hêrwirî
Adem ji wê kasê vexwar, vejîya
Mest bû hejîya
Goşt jê xwast wî ruhîya
Xwîn li canê wî gerîya
Adem wê kasê xar lê xoş tê
Keremeta kasê gihîştê
Meleka milê wî girt avêt bihîştê
Adem kasê vedixare
Keremeta kasê pêşva dîyare
Xo bênjî hişyar bû
Badî dilê min sêv anî
Xewmekî reb durî xofayî îmanê
Padişayê me ev jî xorfendîyê tofanê

(Ji desnivîsara Lazo Kazaryan)
Fonda 26, Antîkxana Wêjevanîyê û Hunerîyê, Êrivan.)

QEWLÊ SURA EFİRÎNA DUNYAYÊ

Ya rebî dunya hebû tarî
Tê da tunebûn mişk û marî
Te zîndî kir teze halî
Çi nema gul jî barî
Ya rebî tu hostayê kerîm î
Te vekir dê û dirba tarî
Tu hostayê her tiştî
Bihişt çêkir renge bî

Erd û ezman tunebûn
Dunya fire bê bine bu
îsan û heywan jî tunebûn
Te xa lê saz kir
Di behre da tenê hebû dir
Ne dîmaşîya, ne dîmaşîya
Te xaş ruh anî ber
Nûra xa lê peyda kir
Goşt û ruh hatine ber
Nura çavan lê hate der
Dest û pê lê kire leş
Lê şîrîn kir got û bêj
Xudavendê me hostayê rehmanî
Rê û dergeyê dunyayê vekir
Her tişt ji mera der anî
Bû bihuşt erd û avanî
Xudawendê tiştî dinase
Dura kesê jê kir esase
Jê peyda kir mîrî xase
Got: “Eva hê ne bese”
Durr ji heybeta êzdan hincinî
Taquet nekir, hilgerî
Ji rengê îsan xemilî
Sor û sipî lê hêwirî
Êzdanî me bi rehmanî
Husn û cemal ji me ra anî
Destûr da qelemê qudretê
Havên avîte behrê, behr pê meyanî
Dexanek jê der xwenî
Çarde tebeq erd û ezman pê nijinî
Êzdanê me durr der anî
Mabet avîte navê
Jê peyda kir du çavê
Jê herikî per avê

Av ji durê herikî
Bû behra bê serî, bê binî
Bê rê û bê derî
Êzdanê me ser behrê gerî
Êzdanê me sefîne çê kir
Îsan, heywan, teyr û tû
Cot bo cot li sefînê sîyar kir
Xudanê me sefîne ser e
Serîkî digere çar kenare
Sefîne qul bû, av kete sere
Marê xerê xa dane bere
Xudawendê me sefîne ajot
Ji kenar çû ber kenare
Ajote lalêşê got “Heq were”
Sultan Êzdî xweş rêber e
Lalêş ku riknê beşere
Niha êzdî jê xebere
Yarebî bangdikim şêxê mezin
Çavkanî, av jê dizên
Ya rebî te dinya çêkir, dinya bi xêr
Îsan tê da dijîn bi têr
Şevêt reş şevêt tarî
Cî nema gul jê barîn
Xudavendê kerîm û rehman
Kire rikn erd û ezman
Da ber ruh û ziman
Xudavendê me rebil semed
Efirandin milyaket
Cuda kir doj û cinnet
Xudavendê me erd çêkir, ezman guhaztin
Micale erdê bi rastin, nobeta qeza guhastin
Li gunehbarañ bû ruhustîn
Çiqas xudavendê me dinya dikir sefere
Sixir dikir dar û bere



Engraved by C. Burmester

A YEZIDI MAN & WOMAN FROM SINJAR.

45 Yezidis from Sinjar around 1820.

Pê nijinîne riknê mexbere
Xudavendê me hosta ber e
Lalîş jorda anî xware
Lalîş bû xaş cî û ware
Li erdê şîn bû nebate
Pê zeyinî zêndî qinyate
Xudavendê me rehmanî
Çar qisim ji me ra danî
Pê hebîba Adem nijinî
Xudavendê me rehmanî
Çar qisim li rû dinê danî
Yek ave, yek nûr e
Yek axe, yek jî agire
Xudavendê me bi rehme
Diyar kir saz û qudûme
Havîne Adem hevsûr zor tixûbe
Hevsur gerya hat hindave
Xaliba adem mabû bê kave
Go: "Roho, çima naçî nave?"
Xudavendê me qudrete
Zeyandî çiqas xulyaqete
Jêre çêkir doj û cinete
Xudavendê me erd çêkir, ezman guhastin
Mecala erdê bi rastin, nobeta qeza rastin
Ji ïsan qencîti xastin
Lalîş ji ezman dihate
Erd şîn dibû gîhate
Pê çeyiran çiqas qinayete
Xudavendê me ïnî kir esase
Şembî birî kirase
Çarşemê kir xilase
Hevsed sal paş hevsûr hat dura nikase
Hevsed salî ji berî Adem jimare
Erdê xa ra negirtî siyare

Heta lalîşa nûrî navda hinara
Û ban da rûh hedirî
Hat û çû bihirî
Nûra mobetê hingavte serî
Hat xalibê adem da hewirî
Xudavendê me rehmanî
Kasa surê ji Adem ra anî
Av ji kasê vexar, vejiya
Cî da mest bû hejîya
Goşt jê xast wî ruhî
Xwîn li canê wî gewirî
Xîret kete nav serî
Adem xar ji wê kasê
Sura kasê xaş lê tê
Keremeta kasê gihîstê, bihuştê
Meleka milê wî girtavê te bihuştê
Adem ji kasê vedixare
Keremeta kasê pêva diyare
Xa bênijjî bû hişyare
Go: "Ev erd çi xaş e"
Gîhayê şîn ser geşe
Roj roja mîrê keleşe
Xudavendê me rehmanî
Ji me ra keremek anî
Dem û dezgê baş danî
Hey ademo, rû dinê
Herdem bike îmanê
Xudavend em xilas kirin ji tofanê
Gelî mirîdan bikin karê
Xêra qudretê ji jor barî
Xa dûr xin ji neyarî
Keremeta xudavendê me hate xwarê

Erd û ezman didin xêrê
Hun jî bibin xudanê xêrê
Qet ji bîr nekin vê xeberê.

(Ji zarê Siloyê Elo, 55 salî, li gundê Tîsêlê nahîya Axalkalakê komara Gur-cistanê, sala 1939 da bi destê Q.Kurdo hatîye nivîsandinê.)

trankrîpsiyona ji herfên erebî:

МАHMÛD LEWENDÎ

1. Ж.С. Мусалян, Библиография по Курдо-
ведению. Москва, 1963.

(J.S.Museliyan, Bibliyografiya derbarey kurdnasi,Mosko, 1963)

2. О.Л. Вильчевский, "Езидские тексты,
Архив Академии наук
СССР Ленинград, Фонд, номер: I2 - IV".

(O.L.Vilçevskî, Tekstê Êzidi, binêre: Arşiva Akademiya Sovyet, li Leningrad, fonda jumar: 12-I-V.

3. Binêre: Şakir Fettah, Yezidiyekan û Ayinî Yezidî, Sileymanî, 1969, lapere: 19

4. Binêre disan li kitêba Şakir Fettah, lapere: 18

5. Binêre: Antropos, Wien,T. VI, 1911,P.32. (Govara Antropos, bergî 5, Wien, 1911, rûpelî:32

6. Binêre kitêba wî navgotî, rûpel:18

7. Binêre kitêba wî navgotî,rûpel:134-135

8. Binêre: kitêba Vilçevskî ya navgotî

9. Roger Lescot, Enquet Sur Les Yezidis, Beyrout, 1938,p: 32-34

10. Binêre: Roger Lescot, kitêba wî navgotî, rûpelê: 32-34

11. К.З. Босворт, " Мусульманские дина-
стии, Москва, 1971 стр. 30

(K.Z.Bosvort, Mîrnîşînêt Muslimanetîyê, Mosko,1971, rûpel: 30)

12. binêre: Fonda Wêjeyê ya Antikxana wêjeyaniyê û Hunerîyê, Erivan,Fonda: 10, Lazo.

13. Binêre: Kovara Antropos, berg: 6, Wien, 1911

14. Binêre: kitêba Layard ya navgoti, rûpel: 91-92

15. Binêre: kitêba Roger Lescot ya navgotî, rûpel: 101-128

16. Binêre: Reşîd Yasemî, Kurd û peywestgey nejadî w Tarîxî Ew, Téheran, 1946, rûpel: 118-120

- Binêre: Wisan jî Mîhemmed Behaeddin, Pîrê Şalbarî Zerdeşî, Bexdad, 1968, rûpel: 8-9

ÇEND ŞA'IRÊN

KLASİK

Z.ZINAR

RÛHÎ

Şêx Evdirehmanê Axtepeyi, navê wî yê asası, Ebdurrehman Şemseddîn Rûhî ye û kurê Şêx Hesenê Nûranî ye. Rûhî di diduwê meha Rebiûl ewel, sala 1270 yê hicrî de (1850) şeva êvara înê li gundê Axtepe ji dayîkê bûye (Dîyarbekir). Bavê Rûhî di rêçiku Nexşebendî de şexe-kî gihaştî û bi nav û deng bû. Di pey mirina bavê xwe de, Rûhî li ser rêçika wî na meşe, bes ew bi îlm û zanîn û nivîsandina pirtûkan ve lipikîye û meşiyaye.

Rûhî çar heb berhemên wî yên navdar hene. Ya herî navdar “Rewd û Neîm” e, “Dîwan”a helbestan û di îlmê kelamê de “Kîtab-ul Ebrîz” û “Kîtabu Keşfîz-Zelam”in.

Şêx Evdirehman di 14 ê adarê sala 1326 ê hicrî (29 adar 1910) de çûye dilovanîya xwe. Lê belê di pêşgotina “Dîwana Kerbelayî” de nivîsiye ku Rûhî di sala 1325 ê hicrî, beramberî sala 1906 ê mîladî de wefat kîriye. Lê belê li gor nivîsara di kovara xortêن şoresger ên Demoqrat (Devrimci Demokrat Gençlik Dergisi) hejmara 5-6 Heziran 1978, rû-pel 14 de, ew di meha sibatê sala 1905 an de mirîye. Rûhî li gundê xwe yê Axtepe veşartî ye û tirba wî, zîyaretgaha kurdan e.

Şêx Avdirehman sê birayêن xwe yên alim hebûne. Ew her sê evin: Şêx M. Nûr, şêx M. Sîrac û şêx M. Can. Şêx M. Can jî destnivîsarek bi na-vê “Teqrîz” wek dîwaneyekê li pey xwe hiştîye. Sê kurê şêx Evdirehman yê alim û edîb hebûne ew jî evin: Şêx Eskerî, Şêx M. Şewket û şêx

Muhemmed Kerbela. Şêx Eskerî û Muhemmed Kerbela jî, her yekê du pirtûk bi zimanê zikmakî nivîsîne.

Rûhî pirtûka xwe ya “Rewd û Neîm” di sala 1303 (1884) de nivîsîye û 240 rûpel e.

Ev malikên li jêr, ji“ Rewd û Neîmê” hatine jêderkkirin:

Bide îstîrahe ji bo qelbê min
Vekuj be’dekî ateşê kerbê min

Ji uşşaqqâ û sîgah û nerûzê bak
Xetim ke tu jê meclisa etrînak

Ne wala ye qelbê uşşaqqê hezîn
Çu ummanê zuxxar û qulzem yeqîn

Eger ci bi zahir perîşanîn em
Welêkin di batîn de sultanîn em

Xudanleşker in em bi ceyş û heşem
Hemî eskerê me sifufê di xem

Hezer ke jî hukmê me ey heft felek
Te yekser bikin xwîn bi şubhê şefeq

Ji bo aşiqan cumle xeddar û tu
Mûqîmî neyar û sîyehkar û tu

Xisûsa ji bo “Rûhî”yê Extepî
Zîyade bikerb û, bikîn û, çep û

Ezim Ebdurehmanê sahibhuner
Şehînsahê mulkê suxen sertesere

Xudanfezl û sihr û kelam û edeb
Şehê şairê kurd û Rom û Ereb

'Elemdarê iqlîmê şî'r im temam
Mûfewwed ji bo min re nezm û kelam

Ku bigrim di destê xwe rim û qelem
Ji nezmê li âlem bilind kim elem

Ji teşîra enwarê vê xameyê
Beyan kim gelek xarîqulâdeyê

Mîdada devê xameya şubhê mar
Ji yaran re turyaq e, zehrê neyar

Ji van quesdê min nîne erzê huner
Welê da li dunya bimînit eser

Ku Turk û Ecem qet nebêñ carekî
“Nehin Kurdî şair di misraekî”

Bizanin ku şair ji Kurdan hene
Ji uşşaçqê Turk û Ecem zêde ne

Welê bêxudan in nehin me reîs
Ku meqbûlî bin nik wî şîrê selîs

Me jî ger hebûya xudanek çunîn
Guhernas û qîmetşunas û emîn

Ji Kurdan gelek şairê sihrîdar
Bi nexme dihatin wekî mûsîqar

Welê çûn me dîtin ku em bêkes in
Ji bêçaregî kes bi me nahesin

ÇEND MALİK Jİ DÎWANA ŞÊX EVDİREHMAN :

Îd e, keyf û şahî ye nêv xas û âmê xulxul e
Yek yekan âşiq li sorgul mîsalê bulbul e

Nîne der qelbê me bestek, çunkî mecrûhî-kul e
Bêtебîb im, bêtебîb im, bêtебîb im, bê tebîb

Subhê îd e, her kesek der geştê sehra renge reng
Ser me ez xem cem'i bûne leşkerê Rom û Fireng
Der binê narê fîraqê keftime bê yar û şeng
Ez xerîb im, ez xerîb im, ez xerîb im, ez xerîb

Min ne Newroz e, ne îd e, min ne keyf û ne surûr
Dil ji hicranê melûl e nabitin şad û sebûr
Gerçî hala der fîraq im lê bi qelbê sade nûr
Der rekîb im, der rekîb im, der rekîb im, der rekîb

Turk û Tacik û Qeçer ber mulkê dil anîn hucûm
Pey bi pey, saet bi saet xaretê Kurdan dikan!

Weż û nesîhet kin bike
Têqrîrê bes gotin bike
Wesfê hebîbê min bike
Da çêbitin der dil eser!

Da çêbitin der dil tereb
Turk û Ecem Rom û Ereb
Guh din bi qanûnê edeb
Ser ah û kowvan û keser!

ŞÊX MÛHEMMED KERBELAYÎ

Mihemed Kerbela, kurê şêx EVdirehmanê Axtepeyî ye, di sala 1303 (1885) ê hicrî de li gundê Axtepe ji dayîk bûye.

Ewî di pey mirina bavê xwe de, ji mîrata bavê xwe bitenê pirtûkan hilaniye û mal û serweta din ji birayên xwe re bexşandîye. M. Kerbela ne zewicîye û xwe daye ilmê, zanînê û welatparêzîyê. Nav û dengê wî li Kurdistanê bi hunermendî, zanayî, rewşenbîrî, hozanvanî û bi welatparêzî belav bûye. Her çiqas zimanê wî Kurdî bû, lê di ilmê Erebî û Farisî de jî, pir zana û gihaştî bûye.

Niha em bi du berhemên M. Kerbela agahdar in: Yek Dîwana helbes-tan e, ya din jî , "Mîrsad - ul Etfal"(Amadegaha Zarûkan) e.

M. Kerbela, di sala 1303 (1914 ê hicrî, di meha mûherremê de Dîwana xwe nivîsiye.

Mîrsad-ul Etfal, bixwe ferheng e, û di sala 1331 (1912) ê hicrî de nivîsiye. Ewî bi zaravê Kurmancî- Fârisî, wek "Nûbar'a Ehmedê Xanî bi kês û qasiye nivîsiye. Ferheng ji 1350 bêjeyan hatîye meydanê. Tê de gotîye ku "ji bo etfal û ewladêd kurdan" amade kiriye.

Ev malikên li jêr me ji ferhengoka wî girtin

" Wekî wê Newbehara Şeyxê Xanî
Esasê wê ji bo etfalan danî !"

Ku da newrestegan û newnîhalan
Melektebánê Kurdan purşepalan

Bikin seyê di vê Mîrsadê eqser
Bigîjin mexsed û rahê di enwer

Ev nivîskarê hêja di serhildana Şêx Seîd de alîkarîyeke mezin û bi rû-met kiriye. Di pey sala 1925 an de, Komara Romê M.Kerbela jî biriye nefy û neyîstanê. Berê pêşîn wî birine bajarê Uşaqê. Li wir qederekî maye û ji wir birina bajarê Edenê.

Li neyistanê du salêن M.Kerbela qedîyan, û destûtra wî didin ku vege-re Kurdistanê. Ewî li biyanistanê gelek zorî û birçîtî û perîşanîyê dît. Di sala 1344 ê hicrî (1927) de ku ji neyistanê tê, li gundê xwe 16 sal ne xwe û xwarin kir, û jîmala xwe bi der nediket; bi şev û rojan, karê wê xwendin û mitale û nivîsandin Ewî gelek are, çay û qehwe ve-

dixwarin û her ku diçû jar û nexweş dibû!

M.Kerbela di sala 1358 ê hicrî (1939) de, li gundê Çûlê çûê dilovaniya xwe, û li gundê Axtepe jî hatiye veşartin. M.Kerbela di dawîya jîana xwe de weha gotîye:

“Ez sendoqek devgirtî hatim û devgirtî jî çûm!”

Ev malikên li jêr ji Dîwana M.Kerbela hatine jêderkkirin:

Turkê tazî, işwenazî, serwînazî, serfiraz
Cîlwesazî, remz û razî, der dilê hişyarî tê!

Selahuddînê Eyyûb î, weya Perwîzê Şêrîn î
Nizanim şahê Iran î, weyaxwud mîrê Kurdan î

Nema carek terehhum kî heta kengê cefakarî?
Nema taqet qesem billah bes e ev namusûlmanî!

Xemzeyê şehla'uyûnê Turkitaz
Hacim in ez Turkitazî el eman

Ez pîr bûm işqa min hêj cuwan e
Barek giran e dil natuwan e
Baxê dil wê kund tê da dixwîne
Ev sewda bo min mirin' ne jîn e

Ji bo min digrîn însan û melek
Cinn û teyr û heywan, erd û felek
Dûr ketme ya Reb ji çeşmê belek
Baxê dil wê kund tê da dixwîne
Ev sewad bo min mirin' ne jîn e

FEQE REŞÎDÊ HEKARÎ

Yek ji edîb û hozanê kurd Feqe Reşîdê Hekarîyê ye. Sed heyf û mixabîn ku derheq wî de tu agahdarîyeke diyar tune . Bes hozanê kurd ma-

mostayê mezin Cegerxwîn li ser Feqe Reşîd di helbesteka xwe de weha gotîye:

*“Yek dî dibéjîne wî Feqee Reşîd
Di zarê kurdî fêris û egîd
Nivîştek wî heye bi navê Sermehşer
Zarûkên kurdan dixwenin ezber”*

Derheq berhemên F.Reşîd de tu agahdarîyeke me tune . Bes berhemekâ wî bi navê “Sîrr-ul Meşher” bi tenê di destê me de heye. Ew jî helbest in, bi kêş û qaffîye û kite ne.

Sirmehşer ji 24 sernavan avakirî ye û 556 beyt in. Naveroka wê bi pîranî li ser felsefa olî ye û terbiye û şîret in.

Di beşa dawî ya pirtûkê de F.Reşîd weha gotîye:

“Ey feqî tarîxê benda te temam”. Ji vê rêzê dixwîyê ku wê ewî tarîxa nivîsandina pirtûka xwe li gor hisabê Ebcedê gotibe, wek Melayê Cizîrî çewa ku tarîxa dayikçebûna xwe û gelek tarîxên din di dîwana xwe de bi hisabê Ebcedê beyan kirîye! Û wek Feqîyê Teyran ku di gelek cîyan de tarîxan bi hisabê Ebcedê eşkera kirîye! Eger eva F.Reşîd jî wusan be, wê ev tarîxa nivîsandina Sirmehşerê be, Eger em ji bêjeya “Târîx”ê reqem bigirin, tarîx dike 1211 ê hicrî (1787m.). Çimkî F.Reşîd di helbesteka xwe de weha gotîye:

“Ela ey feqîyê sanî, heta kengê bikî dewran”

Ji vê yeka tê zanîn ku F.Reşîd xwe ji Feqîyê Teyran re duwemîn hesibandîye. Çimkî Melayê Cizîrî jî xwe ji jşêxê Sinânî re duwem hisêb kirîye. Ev rîveçûn di nav hozanan de gelek belav bû, ku yekê paşî xwe ji yekî ji pêşîya xwe re dikir duwemîn, yan jî sê,çar...û zêdetir. Ev mali-kên li jêr ji Sirmehşera Feqe Reşîd hatine jêderkkirin:

Eya ey waizê wezê
Xwe hişyar ke li vê lefzê
Me borandin bi vê terzê
Ji hed zêde gelek însan

Wan kirin malê yetîman her telef
Lew bûye îro li wan agir elef.

Wan ji xelqê ra digotin pur xeber
Lew ku îro bûne riswa serteser

Ev ew in hebû li nik wan şahidî
Weqtê déwayê digotin “me nedî”.

Şahidî dane bila heq wan heman
Ew dibûn şahid bi derew her zeman

Wan kirin hîle di nav kod û şehîn
Kêm kirin dirhem li huqqe dîgel mêtîn

Bibin guhdar ku ez bêjim
Temaşa kin bi qelb û can
Yekayek tev beyan kim ez
Bibînin hûn ecaîban

MELE ÜSÎV

Yek ji helbestvan û nivîskarêñ Kurd Mele Üsiv (Yusuf Töpçuođlu) e. pênc destnivîsarêñ wî hene, gîştik bi zaravê Kurmancî û bi tîpêñ Ere-bî nivîsî ne. Niha di destê me du heb berhemên wî hene. Li ser pirtûka wî ya bi navê “Menzûm Teqrîz”ê wêneyê wî jî heye. Mela Üsiv li dûr salêñ 60 î çûye ser heqîya xwe. Lê mixabin me tarîxe dayik çêbûn û mirina wî bi dest nexistin.

Destnivîsarêñ Mele Üsiv ev in ku li jêr nivîsî ne:

1- İRŞAD ÜL İBAD: Ev pirtûk bi naveroka xwe şerîet e. Pirtûk gelek mezin û fire ye, bi tîpêñ Erebî û bi zaravê Kurmancî nivîsî ye. Cara pêşî di çapxana “Nûr” de, Enqera, 1960, çap bûyê û 343 rûpele.

2- FERAİZ : Li gor sazûmana olî, parêvekirina mîrateyê li warisan beyan dike. Pirtûk cara pêşî ev jî di çapxana “Nûr” de, Enqera, 1960, çap bûyê û 57 rûpel e.

3- TUHFET ÜL AMİLİN

4- XUTBE : Ji ayet û hedîs û wazîn çak sazkirî ye û di limêjîn ïnan de tê xwendin.

5- MENZÛM TEQRÎZ : Ev pirtûk helbest e. Li ser mele û şêxên kevneperek yêñ zemanê ku dijayedîyê bi gelê xwe re dikin û wan bi tirsa ji Xwedê û Pêxember ditirsînin da ku ji serok û serdarêñ İslâmê re

serberjêrîyê bikin, beyan dike.

M.Ûsiv ji bil welatparêzî û gelparêzîyê ewî ji zimanê Kurdî re kar û barên gelek giranbiha kirine. Di nivîsandina berhemên wî de, edebî-yateka rind û çak heye. Ewî şerekî pir mezin li hember çîna serdest meşandîye û di rîza çîna bindest de cihê xwe yê bi şeref girtiye. Bo vê yeka her kurdek bo wî serî ditewîne û sipasîyênen xwe jê re pêşkiş dike.

Hin ji helbestê M.Ûsiv Evin li jêr:

Şêxê ku mexseda wî daîm dinya be
Ew ne şêx e, wellahî kêmtíre ji sa ye

Şêxê ku mexseda wî rahet û xwarin û xwab e
Wellahîn wekî kelb û şivanî nabe

Gerçî Kurmancîya me ne fesîh e
Fehma meñayê ji wê xayet melîh e

MELE ÜNISÊ ERQETÊNÎ

Yek ji nivîskar û zanayên Kurd mele Ünis e. Ewî di warê gramatîka Erebi de bi Kurmancî du heb pirtûk nivîsîne. Yek ZIRÛF e, ya din TERKÎBE e.

Kovara HAWARê derbarê wî de wiha nivîsîye:

“Jê re melayê Helqetînî jî dibêjin. Xuya ye ku ERQETÊN an HELQETÊN gundê wî ye. Vî melayî daye pey Elî TEREMAXÎ û kitêbên tesrifê ZIRÛF û TERKÎB bi zimanê Kurmancî nivîsandine. Min ne eserên Elî, ne yên Ünis dîtine. Ji lewra min nikarî bû ez hin tiştan ji wan belav bikim”.

(HAWAR sal: 9, hejmar: 33, rûpel: 13)

Sed heyf û mixabin derheq vî zana û nivîskarê me de bi fireyî agahdarîyek tune. Û derheq dayikçêbûna wî de, em li tarîxekê rast nehatin. lê belê Mînorskî di Ensîqlopedîya Îslamê de dibêje: “Mele Ünisê Helqetêni di sala 1200 ê hicrî de, 1785 ê mîladî, çûye ser heqîya xwe”. “Mihemed Merdûxî Kurdistanî li Mêjûyê Merdûx da dibêje: Li sedê duwazdem ê hicrî de çûye ser heqîya xwe”. “Li vir herdu tarîx yektirîn hev digirin. Xwedîyê sê berheman e di zanistîya serfê de TESRÎF û

ZIRÛF û TERKÎB bi zimanê kurdî ...” nivîsîne.

(Lêkolîna Dr. Marûf Xeznedarî ,Çapa bexda 1981, rûpel: 27)

Di medreseyê li Kurdistanê de, ew hersê pirtûkên mele Ûnis di destpêka xwendina NEHWÊ de têne xwendin. Kesê ku dixwîne tevan jber dike. ZIRÛF û TERKÎB li nik min hene. TESRÎF nîne. Lê belê tê gotin ku Tesrif pirtûka Mela Alî yê Zivingî ye. Ev çend jêderkêni li jêr me ji zirûfê girtin:

“Tu bizan: Hingî eşyayê di dunyayê da hene zerf e yan xeyri zerf e”.

“Tu bizan: Wekî neborit li zerfê tiştekî weku bixwazit lizûman bêweku xeber yan sille, dê hal bit”.

“Tu bizan: Çi te'elliq (hevgorîdan) bi fê'lê ve bit her wekî mezhebê Besrîyan, ci te'elliq bi îsm û fail ve bit her wekî mezhebê Kûffîyan”.

“Ev ilmê ku em îbtîda pê dikin: Ilmê Nehwê dibêjinê.”

Jêrdekêni ji TERKÎBÊ:

“ Tu bizan: Du mezheb (rêcik) carî bûne di terkîba Bismîllahê da. Mezhebê Besrîyan, mezhebê Kûffîyan.

Li mezhebê Besrîya cumleyê fêlî ye. Li mezhebê kûffîyan cumleyê îsmî ye.”

“ Ellah îsmekî mufred e (kit), mérîfe ye. Sebebê ilmîyetê lewra elîflam in, ji ber hemza mehfûz ve, lefzê mecrûr in, cerre bi kesr e. Bêweku mefûl û ileyhî ye ji bo îsmê amil di cerra muzaflileyhî da lefzen”.

ELÎ TEREMAXÎ

Kovara HAWAR (hejmar: 33, r: 13) nivîsîye ku :

Aleksander Jaba dibêje “...ku Kurmancan heta 1000 ê hicrî ilmê dîn û şerîfetê bi zimanê erebî dixwendin. Piştî 1000 î meleyek bi navê ELÎ, ji gundê Teremaxê, ji qeza Miksê rabûye û ji ber xwendinê çû heta Bexdayê. Elî di medresêni Bexda, Mûsil, Behdînan û Soran de xwend ...”

Elîyê Teremaxî piştî ku vegerîya welatê xwe, rabû di gundê xwe de medreseyek ava kir û bi zimanê Kurmancî kitêbeke Tesrifê çêkir û dersa feqehêni xwe bi Kurmancî got. Hêdî hêdî ew kitêb li Kurdistanê belav bû.”

Çend jêderk ji pirtûka Elî Teremaxî ku bi navê “Haza Kîtabû Serf Lîsanê Kurdî” ev in li jêr:

“ Î'lem tu bizan ey mufredê muzekeb ê muxateb, ku ji boyî tayîfa

Ekradan ra jî, lazim e ku bi zimanê Kurmancî û ji ilmê Serfê biza-nin. Lewra bîna û asasê hemû ilman li ser Serfê ye. Îlmê hisêb ke weku mêtzin e”

“Feslun, di fê lan da zemîr lazim e, bê zemîr fê 1 nabî...”, “Feslun, di behsa rîdada ye, mel ûmê te bibe nîda bi meña gazîkirin e. Yani gazî ferdekî, weya cemaetekê bikî, ew jî mexsûsê serfa nîdayê he-ye....”

MELE XELÎLÊ SÊRTÎ

Yek ji edîb û ronakbîr û nivîskarên Kurd Mele Xelîl e. Ew bi esl û az-beta xwe ji Hîzanê ye. M.Xelîl di sala 1167 ê hicrî (1753 M.) de li Hîzan ji dayîkê bûye û di sala 1259 ê hicrî (1843 M) de jî li bajarê Sêrtê miriye.

Çewa ku “Hîdayet ûl Arîfîn” dibêje, Muhemmed Tahir efendî di pirtûka xwe ya “Osmanlı Müellîfleri” de nivîsiye ku, wefata M. Xelîl di sala 1257 ê hicrî, beramberê 1841 ê mîlade bûye. Û li serê nivîsiye: “Seydayê Mele Xelîl di ewilê tehsîla xwe de bûye mezher ji bû dûâyê Şeyx İbrahîm Heqqî, xwedîyê “Merifetname”yê, bi delaleta bavê xwe Mele Hesen. Pişî ku tehsîla xwe li cem âlimê Kurdistanê temam kir, li wîlayeta Sêrtê îqamet kir û heyata xwe di belavkirina ilmê û nivîsandina esera de derbas kir!” Ewî 25 pirtûk nivîsine.

Eserê Mele Xelîlê Sêrtê ev in:

- 1- Tebsîret- ûl Qulûb.
- 2- Tefsîru Axir ûla Sûret- ûl Kehf.
- 3- Mînhacus'sîttet. Menzûm.
- 4- Teşîsu Qewaid- ûl Eqaid.
- 5- Dîyau Qelbîl Urûffî. Menzûm.
- 6- Sérhu ela Menzûmetî ş'şatîbiyetî fît- Tecwîd.
- 7- Mehsûl-ûl Mewahîb.
- 8- Muxlis.
- 9- Kîtabu fî Usûl-ûl Fiqhî.
- 10- Kîtabu fî Usûl-ûl Hedîs.
- 11- Zubdetu ma Fîl Fetawa el Hedîsiyye.
- 12- Muxteser.
- 13- Nebzetu mînel Mewahib-ûl Medenîyye.
- 14- Nehculenam fîl Eqaîd. Menzûm.
- 15- Nehculenam bi Luxet-ûl Kurdîyye. Menzûm.
- 16- Sérhu 'elel Qesîdet-ûl Mehîyye.

- 17- Rîsaletu Sexîr.
- 18- Îzhar-ul Usûn.
- 19- EL Qamûsus'sanî.
- 20- Îsaxucî.
- 21- Rîsaletu fil Mecaz wel Îstîâre.
- 22- Rîsaletu fil Adabîl Behsî wel Munazere. Menzûm.
- 23- Rîsaletu fil Wežî.
- 24- El Mentûquz'zumrûdîyye. Menzûm.
- 25- Mewlûd. Menzûm.

ÇEND HELBEST

Jİ MELE EHMEDÊ BATEYÎ:

Çi nesrîn û qerenfîl bû
 Ruhan û nîve nîv gul bû
 Li govendê şil û mil bû
 Li furwîşê û şîtrînê.

Li furwîş û şérîn tê bin
 Bi çîn çîn taze xweyn tê bin
 Ji baxê taze xwe tê bin
 Bi rev rev werdegog tê bin

Şerab û şerbet û saz in
 Delal û işwe û naz in
 Kemanc û úd û muxnî ne
 Kemanc û úd û mûnis bû

Ji bextêm roj xem-ava bû
 Xeyala min di batil hat
 Li min roja xem ava bû
 Şeva zulfê mûqabil hat

Belê dara di gul pê ve
 Henar û zerbeh û sêv e
 Siha zulfê ketî nêv e
 Jî belgan da cela cil hat

Âşiqê zulfa reş im
 Âşiqê şeyda ye zulf
 Bê bade lew serxweş im
 Serxweş û sewda ye zulf.

Serxweş im ez vê demê
 Keftime tora xemê
 Suhtime wê berçemê
 Çîmekî reña ye zulf.

Rahet û sebr û selam
 Tu yê çapkî xwesheram
 Kolê te me ez xulam
 “Bateyî” dilşa ye zulf

Ecel saqî bi des min da
Meya baqî dpeyalê da
Ji wê rojê heya îro
Dilê min ma dxeyalê da

Şefeq da erd û esmanî
Li min dil bir bi êsanî

Dixwum sondê bi Senanî
Zuleyxa bû di Misrê da.

Wekî min dît li govendê
Gelo ya Reb tejî çendê
Nehin ev reng I'Semerqendê
Di Belxê û Buxara da!

ÇEND HELBEST JÌ MEWLUDA BATEYÎ

Girtî yek qebde ji nûra xwe Xweda
Gote wê: Kûnî hebîbê Ehmeda

Her kesê hazir biket ew yek teâm
Ba bixwûr û şerbet û qedrek temam

Çunkî bêemrî ji Adem bû zîhar
Nûr, ji enyê hate puştê bû sitar

Ey şivanê godekê zîba dilêr
Xweyza wî berxê ji dîdara te têr

Ez ji kê nalim ji kî gazin bikem
Herçî ew bêjîte min dê ez we kem

Hem ji bo huccac û xuzzatan temam
Hem ji bo vê meclisa sahibteám
Hem ji bo her çar îmamê cadeê
Hem ji bona katibê vê nusxeê
Bo cemiê muslîmîn û salîhe
Bo feqîrê Bateê elfatîhe!

ROJNAMEGERİYA KURDÎ Lİ KURDISTANA BAKUR Û Lİ TİRKİYÊ

III

Malmîsanij
&
Mahmut Lewendî

15-DEMOKRAT DOGU
(Rojhelata Demokrat)
1950

Em derheqê vê rojnamê de zêde tiştekî nizanin. Di hejmareke rojnama Dicle Kaynağı'yê de hatiye nivîsîn ku di 1950'yi de bi navê Demokrat Doğu rojnameyek derketiye. Nivîskarê vê nivîsa Dicle Kaynağı'yê dide diyarkirin ku Demokrat Doğu jî ji alî wan bi xwe hatiye derxistin*.

* binêre rojnama Dicle Kaynağı, Nisan 1952, r: 1

16-AGRI

Ankara, 1953

Ev kovar ji alî xwendekarêن Agriyî yên unîversîte ve ji 1953'yan û vir de (heta 1957'an ?) her sal hejmarek hatiye derxistin*.

17-HENEK

Ankara, 1955 (?)

Ev kovar di 1955'an (?) de li Anqerê ji alî xwendekarên Di-yarbekirî yên unîversîte ve hatiye derxistin.

Kovara Henek bi Tirkî buye û tenê hejmarek derketiye.

18-CUDI

1956 (?)

Kovara Cûdî (Cudi)*, di 1956'an (?) de ji alî xwendekarên Cizîrî yên unîversîte ve hatiye derxistin.

19-DERSIM

Ankara, 1957 (?)

Ev kovar ji alî xwendekarên Dêrsimî yên unîversîte ve, di 1957'an (?) de li Anqerê hatiye derxistin*.

* Derheqê vê kovarê de me'lûmat ji Naci Kutlay hatiye girtin.

* Cûdî: Navê çiyayekî li hêla Cizîra Botan e.

* Derheqê vê kovarê de me'lûmat ji Naci Kutlay hatiye girtin.

20-CERİDE-İ DERSİM

(Rojnama Dêrsim'ê)
İstanbul, 1957 (?)

Ceride-i Dersim ji alî xwendekarêن Dersimî yên unîversîte ve, di 1957'an (?) de li Îstenbol'ê hatiye derxistin.

21-İLERİ YURD

Diyarbekir, 1958

İleri Yurd, di 1958'an de li Diyarbekir'ê derket. Li ser rojnamê ev îbare heye: "Yekşem ne tê de her roj derdikeve, rojnameyek siyasi ye." Ev rojname heta dawiya 1959'an derketiye (1).

Xwediye wê: Abdurrahman Efhem Dolak

Mudirê karûbarên nivîsan: Canip Yıldırım bû.

İleri Yurd rojnameyek rojane bû, bi Tirkî derdiket lê cih dida nivîsên bi Kurdî jî. "Di vê rojnamê de nivîsên ku Awûqat Canip Yıldırım û Musa Anter li ser mesela millî ya Kurdan dini nivîsandin, di nav (xwendekarên) unîversîte û li her derê Kurdistanê bala gerek kesî dikişand û eleqe didit." (2)

İleri Yurd di hejmara xwe ya 4'ê Gulana 1959'an de, di nivîsa "Çima Em Derdikevin?" de bi kurtî weha dibêje:

1- Buyerênu ku li Rojhelat'ê (mebest jê Kurdistan e -N.M.) çêdibin, di rojname û kovarêni Îstenbol û Anquerê de cî nagirin.

2- Memûrênu ku li Rojhelat'ê ne, divê ku bêtir kar bikin fidakar bin.

3- Her partiyekê siyasi ya Tirkîyê wek şirketeke 'adî ya ticaretê ye.

4- Rojhelat (Kurdistan -N.M.) muhtacî xwendinê ye. Li Rojhelatê hejmara nexwendeyan tu çiqas bêji ewqas pirr e. Ji xwe İleri Yurd jî bi diyarkirina derd û kulên weha derdikeve.

Di binê vê nivîsê de ìmza [Musal] Anter heye.

Di hejmara 500. ya İleri Yurd'ê (31-8-1959) de jî bi navê Kîmil (Qimil) nivîseke Musa Anter heye. Di vê nivîsê de bi Kurdî jî devê keçek Siwêregî sitrana Qimil hatiye nivîsin.

Ji ber ku di İleri Yurd'ê de nivîsên bi Kurdî derketibûn, piraniya rojnamên Tirkîyê yên wê demê bi awayekî negatif li hember vê yekê disekinîn û digotin ku bi Kurdî nivîsandin "talûkeyek" e (3).

Tenê li Ödemîş'ê(qezayeke İzmir'ê), rojnama **Cephe** (4) (22.9.1959) û nivisa **Turgut Akın** a di kovara **Forum'ê** (9.10.1959) de, li dij vê yekê nebûn. Li gor wan, bi Kurdî nivîsandin tiştekî normal bû.

Ji ber nivîsa Qimil'ê da'we (mehkeme) vebû û Musa Anter hat girtin. Her di wê demê de Dr. **Şivan** jî hatibû girtin. Dr. Şivan der-heqê vê yekê de weha dinivîse:

"*Mensûbên rojnama İleri Yurd a ku li Diyarbekir'ê derdiket, digel hin grûbên din, di Çileya pêşîn a 1959'an de hatin girtin. Pişt re ev rojname jî êdî nema derket.*" (5)

"*Di 17'yê Çileya pêşîn a 1959'an de digel hin xwendekarêñ unîversiteyê, 49 ronakbîrêñ Kurd hatin girtin.*" (6)

Disa li gor ku Dr. Şivan dinivîse, di "hucreyên mirinê" yên Harbiye'yê de, bi mehan işkence li van 49 kesan dikan (7). Di meha çaran de ji vana Emin Batu (8), ji ber sar û sermayê bi se'etan xwîn vedirişe û şehîd dibe (9).

Ronakbîrêñ Kurdan, bi taybetî xwendekarêñ unîversiteyê li dijî girtina Musa Anter derketin (9).

Li vê derê divê em vê yekê bidin zanîn ku li gor rapora "heyeta bilirkişi"yê (10) (11.12.1959), di nivîsa Qimil de delîlê sûcê tunebû. Dadgeha Çapemenî ya Tevayî (Toplu Basın Mahkemesi) ya Diyarbekir'ê jî di 28.1.1960'an de biryara beraata Musa Anter û Awûqat Canip Yıldırım da.

Tarîxa derketina hin hejmarêñ rojnama İleri Yurd'ê ev in:

no	tarîxa derketinê
1	1958
467	10-7-1959
500	10-8-1959
524	18-9-1959
525	19-9-1959
527	22-9-1959

(1) Kara Amid (dergisi), Diyarbakır, no: 6-7 (1970), r: 59

(2) Şivan, Dr. S.A ; r: 106

(3) Çend rojnameyên Tîrkan yên ku di vê bareyê de nivîsine ev in: **Sabah** (4.9.1959), **Akşam** (5.9.1959), **Cumhuriyet** (6.9.1959), **Yeni İstanbul** (12.9.1959), **Ulus** (19.9.1959).

(4) Di hin hejmara din ên vê rojnamê de ji li ser Kurdan hin nivîs hene, wek hejmara 82. (14.10.1969)

(5) Şivan, Dr. S.A. ; r: 123

(6) Şivan, Dr. S.A. ; r: 108-109

(7) **49 KES:** Li Kurdistanâ Bakur (Kurdistanâ Tîrkiyê) ew kesen ku bi navê **Kîrkdokuzlar** (49'an) têñ naskirin.

Ev 49 kes di 17.12.1959'an de hatin girtin. Ji wan 40 kes, nêzî 14 mehan di hepsê de man. Pişti îngilaba 27'ê Gulan a 1960'i hemû mehkûmêni siyasi hatibûn berdan lê ev girtiyêni Kurd nehatibûn berdan. Ew di meha pêşin a 1961'an de li Anqerê bi iddi'a kurdîti û separatistîye (bölükülük) hatin mehkemekirin. Li gor rojnama Milliyet'ê (18.9.1963), mudei'umûm ji vana 'idama Ziya Şerefhanoglu, Medet Serhat, Yaşar Kaya, Abdurrahman Efhem Dolak, Musa Anter, Canip Yıldırım, Sait Kirmizitoprak, Sait Elçi û 17 kesen din dixwaze.

Li gor çavkaniyêni Tîrkan, ev 49 kes ev in:

1- Şevket Turan (1920-1977): Ji Mêrdîn'ê ye. Bînbaşî bû. Şevket Turan 16 meh cezayê hepsê û 5 meh û 10 roj ji cezayê surgunê (nefyê) xwar. Li Is-partâ'yê li surgûnê ma (1967).

2- Ziya Şerefhanoglu: Ji Bedlîs'ê ye. Awûqat bû. Demekê di Demokrat Partisi (Partiya Demokrat) de xebiti. Piş re li ser navê Bedlîs'ê senatorî ji kir. Herçiqas wî di 1963'an de xwestiye kovara **Rêya Rast** derxe ji karbides-tên Tîrkiyê dest nedane ku vê kovarê derxe.

Herweha li gor iddiyanama (17.10.1963) Amîriya 'Edîli ya Fermandariya Leşkerî ya Tîrkiyê (T. C. Genel Kurmay Başkanlığı Adli Amîrliği İddianamesi), Ziya Şerefhanoglu, digel hin hevalên xwe xwestine bi navê **Zafer** rojnameyeke bi Kurdi derxin lê fersenda derxistina vê rojnamê nedîtin (binêre, Bir Kürt Devrimcisi: Edip Karahan'in Anısına, Komal basım-yayım-dagıtım, İstanbul, 1977, r: 132).

Ziya Şerefhanoglu piş re ji Tîrkiyê derket. Ji nameyek Ziya Şerefhanoglu ku ji **Necmeddin 'Ewnî** re şandiye (Necmeddin 'Ewnî birê Muhammed 'Elî 'Ewnîye Siwêregî ye) tê fêm kirin ku ew di 1973'an de li Beyrûd'ê bûye. Wî di vê nama xwe de bersîva hin pirsên şairê Kurd, **Hejar** daye (binêre: Şerefnamey Şerefxanî Bidlisi, wergêrranî: Hejar, Necef, 1972, r: 790-791).

Ziya Şerefhanoglu di 1984 (?) yan de li Kibrîs'ê miriye.

3- Koco Elbistan: Ji Elbistan'ê ye, wê demê xwendekarê Fakulta Tibbiyê bû.

4- **Sıtkı Elbistan:** Xwendekarê Fakulta Huqûqê bû.

5- Şahabettin Septioğlu: Ji Xarpêt'ê, ji malbata Şêx Se'îdê Piranê ye. Muhendisê zîra'ctê ye, wê demê zabit (yedeksubay) bû. Di dû re Şahabettin Septioğlu di Milli Selamet Partisi (Partiya Selamet a Millî) de xebiti.

6- Hasan Akkuş: Ekonomi xwendîye. Wê demê tacir bû. Di dû re di Türkiye İşçi Partisi (Partiya Karkerêni Tîrkiyê) de xebiti.

7- **Naci Kutlay** (tarîxa ji diya xwe bûyîna wî: 1931): Ji Tuzluca'yê (qezayeke Qers'ê) ye. Wê demê doktorê Çamlıdere'yê bû.

Naci Kutlay, sala 1971'ê de ji da'weya DDKO'yê (Komela Kulturiya Roj-helat a Şoreşgêr) ji hat mehkemekirin û ji vê da'wê heft sal û nîv ceza xwar.

8- **Yusuf Kaçar**: Ji Nazimiyê (li Dersim'ê) ye. Teknîkerê inşaatê bû. Mîriye.

9- **Necati Siyahkan**: Ji Siwêreg'ê ye. Xwendekarê Fakulta Huqûqê bû. Di Partiya Karkerên Tirkîyê de xebitî. Helbesta wî ya bi navê Nataşa baş tê nas kirin.

10- **Esat Cemiloğlu**: Ji Diyarbekir'ê, muhendisê zîra'etî ye.

11- **Hüsamettin Koran**: Ji Siwêreg'ê, awûqat e. Di dû re di partiva faşist a Tîrkan, Millîyetçi Hareket Partisi (Partiya Tevgera Nasyona-list) de xebitî.

12- **Yavuz Çamlîbel**: Ji Bayezid'ê ye, ekonomî xwendîye, wê demê zabit bû.

13- **Mehmet Ali Dinler**: Xwendekarê Fakulta Huqûqê bû.

14- **Örfi Akkoyunlu**: Ji Poturgê (qezayeke Meletiyê) ye. Li İstenbol'ê tacir bû. Wî demekê hemalî kiriye û bi iddi'a komunistiyê derheqê wî de mehkeme vebûye, ketiye hepsê. Mîriye.

15- **Sait Elçi**: Ji Bingol'ê ye. Pişt re dibe sekreterê Partiya Demokrata Kurdistanâ Tirkîyê. Di 1971'ê de diçe Kurdistanâ Iraçê û demek şûn de li wêderê tê kuştin.

16- **Selim Kılıçoglu**: Ji Warto'yê ye. Wê demê zabit (üsteğmen) bû.

17- **Ali Karahan**: Ji Siwêreg'ê ye awûqat e. Demekê li Hekari'yê hakimti kiriye. Di 1965'an de ji Yeni Türkiye Partisi (Partiya Tirkîyê ya Nû) bû mebûsê Hekari'yê.

18- **Sait Bingöl**: Ji Bingol'ê ye, xwendekarê iqtisadê bû.

19- **Yaşar Kaya**: Ji Ikdir'ê (qezayeke Qers'ê), ji gundê Zorê ye. Xwendekarê Fakulta İqtisadê bû. Di Partiya Karkerên Tirkîyê de xebitî. Di dû re, di 1963'an de bû berpirsiyarê kovara Deng. Herweha di rojnama Dicle-Fırat'ê de nivîsên wî derketine.

20- **Sait Kırımitoprak [Dr. Şivan]**: Ji Dersim'ê ye, wê demê xwenderê Fakulta Tibbiyê bû. 16 meh cezayê hepsê û 5 meh û 10 roj cezayê surgunê xwar. Di 1967'an de li İsparta'yê (bajareke li Anadolîyê ye) li surgunê ma. Pişt re sekreteriya Partiya Demokrat a Kurdistan-Lî Tirkîyê kir.

Dr. Şivan digel hin hevalên xwe çû Kurdistanâ Iraçê. Demekê li wêderê ma û demek şûn de, di 1971'ê de, ew û du hevalên xwe, Çeko (Hikmet Buluttekin) û Brûsk (Hasan Yıkılmış) li wêderê hatin kuştin.

Ji derveyî gelek meqalên wî yêñ ku di kovaran de çap bûne, Dr. Şivan çend kitêb ji nivîsandiye û wergerandiye. Ji vana yêñ çapkırı ev in:

- Dr. S.A. Şivan, Kürt Millet Hareketleri ve Irak'ta Kürdistan İhtilali

- K. Bedirxan- S. Şivan, Zimanê Kurdi (Kürt Dili), Kava Yayınları, İstanbul

- Joyce Blau, Ferheng (Kurdi û Tirkî), wergêr: Dr. Şivan, Weşanên Şivan, Almanya, 1975

Ji bo meqaleyên Dr. Sait Kirmizitoprak binêre: Yön(di vê kovarê de şes nivîsarên wî derketine), Dicle-Firat (no: 3,4,5,6,7,8), Deng (no: 2), Ceride-i Dersim, rojnama Vatan.

21- **Haydar Aksu:** Xwendekarê Fakulta Huqûqê bû. Miriye.

22- **Faik Savaş:** Ji Bingol'ê ve. Wê demê xwendekarê Fakulta Tibbiyê bû.

Di dû re çû Kurdistan'a Iraç'ê. Demekê ji li Almanya'yê ma.

23- **Fadıl Budak:** Xwendekarê Fakulta Huqûqê bû.

24- **Mustafa Direkçigil:** Doktor bû.

25- **Fevzi Kartal:** Ji Wan'ê ye, awûqat e. Demekê senatorê Adalet Partisi (Partiya 'Edeletê) bû.

26- **Fevzi Avşar:** Ji Qers'ê ye, xwendekarê Fakulta Tibbiyê bû.

27- **Hasan Ulus:** Muteahît bû. Miriye.

28- **Halil Demirel:** Muhendis (orman muhendisi) e. Wê demê zabit (yedek subay) bû.

29- **Hüseyin Oğuz Üçok:** Ji Diyarbekir'ê ye. Di Fakulta Diransaziyê (Disçilik Fakültesi) de xwendekar bû.

30- **Musa Anter** (di 1920'an de ji diya xwe bûye): Ji Nisêbîn'ê ye. Xwediyê rojnama Dicle Kaynağı û Şark Mecmuası bû. Wî di rojname û kovarên wek Barış Dünyası, Dicle-Firat, Deng, Dengê Serek û Doğu'yê de bi Kurdi yan ji li ser Kurdan gelek nivîsiye. Herweha çend kitêb ji nivîsiye. Kitêbên wî yên çapkirî ev in:

- Kîmil, Yeni Matbaa, İstanbul, 1962

- Yarasalar (Bêçemkan)

- Brîna Reş

- Ferhenga Khurdî-Tirkî (Kürçê-Türkçe Sözlük), Yeni Matbaa, Is-tanbul, 1967

31- **Muhsin Şavata:** Ji Meletiyê ye, tuccar e.

32- **Nazmi Balkaş [Soro]:** Xwendekarê Orman Fakültesi (Fakulta Daris-tanê) bû.

33- **Ziya Acar:** Ji Qulp'ê (qezayeke Diyarbekir) ye. Di Fakulta Huqûqê de xwendekar bû.

34- **Ferit Bilen:** Ji Diyarbekir'ê ye. Li İstenbol'ê tacir bû. Miriye

35- **Mehmet Çiğdem:** Dekorator bû, miriye.

36- **Mehmet Aydemir:** Di Fakulta Tibbiyê de xwendekar bû.

37- **Abdurrahman Efhem Dolak:** Ji Diyarbekir'ê ye. Xwediyê rojnama Illeri Yurd'ê bû.

38- **Canip Yıldırım** (di 1925'an de ji diya xwe bûye): Ji Diyarbekir'ê ye, awûqat e. Mudurê karûbarê nivîsên kovara **Yudum** (no:1, 1. 5. 1957) û rojnama **İlleri Yurd'ê** bû (ev kovar û rojname li Diyarbekir'ê derdiketin).

Canip Yıldırım, sala 1971'ê de ji da'weya DDKO'ye (Komela Kulturiya Rojhelat a Şoreşgêr) jî hat mehkemekirin.

39- **Emin Kotan:** Ji Müş'ê ye. Miriye.

40- **Ökkeş Karadağ:** Karker bû. Miriye.

41- **Turgut Akın** (sala 1929'an ji diya xwe buye): Ji Erxenî'ye (qezayeke

Diyarbekir) ye. Wê demê di Fakulta Huqûqê de xwendekar bû. Demekê rojnama Umut derdixist. Herweha di kovarên Yön, Forum û Çıra'yê de bi Tirkî nivis û şî'rên wî derketine.

42- **Mustafa Ramanlı**: Di Fakulta Huqûqê de xwendekar bû.

43- **Feyzullah Demirtaş**: Di Fakulta Huqûqê de xwendekar bû.

44- **Nureddin Yılmaz**: Ji Mêrdin'ê ye. Di Fakulta Huqûqê de xwendekar bû.

Nureddin Yılmaz, di dû re bû mebûsê serbixwe yê Mêrdin'ê. Pişti iqtidara Cûnta Faşîst a 12'yê Îlona 1980'yî hat girtin, gelek işkence û tahde dît. Di 1987'an de ji ANAP'ê (Anavatan Partisi) dîsa bû mebûs.

45- **Mehmet Özer**: Ji Ruha'yê (Urfa) ye. Di Fakulta Tibbiyê de xwendekar bû.

46- **İsmet Balkaş**: Ji Licê (qeza Diyarbekir) ye. Di Fakulta Tibbiyê de xwendekar bû.

47- **Cezmi Balkaş**: Ji Licê ye. Di Fakulta Daristanê (Orman Fakültesi) de xwendekar bû.

48- **Halis Yokuş**: Di Fakulta Muhendisiyê de xwendekar bû.

49- **Medet Yös [Medet Serhat]**: Ji Ixdir'ê (qezyeke Qers'ê) ye. Xwendekârê Fakulta Huqûqê bû. Di dû re bû berpirsiyarê giştî yê kovara Deng. Di hin çavkaniyê Tirkan ên ku qala 49'an dikin de, navê Medet Serhat tune, di ciyê wî de navê Necdet Ozankara heye.

binêre: **Vedat, Şadillili**; Türkiye'de Kürtçülük Hareketleri ve İsyancılar, cilt: 1, Kon Yayınları, Ankara, 1980, r: 229-231

- **Gürsel, Dr. İbrahim Ethem**, Kürtçülük Gerçekî, Ankara, 1977, r: 60-65

(8) **Emin Batu**, ji Mêrdin'ê ye, di Fakulta Huqûqê ya Anqer'ê de xwendekar bû.

(9) **Şivan, Dr. S.A.**, r: 108-109

(10) **Bilirkişi**: kelimeyeke Tirkî ye, me'na wê di warekî de kesê pispor, ekspert e.

Ev "heyeta bilirkişi"yê ya ku derheqê nivîsa Qimil'ê de rapor nivîsibû ji van kesan pêk hatîbû: Ord. Prof. Hüseyin Nail Kubalî, Prof. Nurullah Kunter û Doçent Sahir Erman.

22-SİLVAN SESİ

(Dengê Silîvan)

Silîvan (Farqîn), 1962

Rojnama Silvan Sesi, li Farqîn(Silîvan)'ê derdiket. Xwediyyê wê: Isa Şans (Isa Ruhi Silvanlı) e. Tê de nivîsên bi Kurdî ji hebûn. Em baş nizanin ku vê rojnamê kengê dest bi weşanê kiriye (1) lê derheqê girtina wê de xwediyyê wê Ruhi Silvanlı (Isa Şans), di hejmara 8. a rojnama Dicle-Firat(Dicle-Fırat)'ê de bi kurfî weha dinivîse:

Îsa Şans, di rojnama Silvan Sesi de peyderpey nivîsek der-heqê Kurdan de dînîvîsî lê ev nivîsa wî hîna di destpêkê de bû, hat qedexekirin. "Mensûbên meqamên assîmîliter" di rojnama Diyarbakır Sesi (2) (Dengê Diyarbekir) de, di nivîsa bi navê "Em Muddeî'umûmê Cumhuriyetê Da'wetî Wezîfê Dikin" de bangekê çap dikin. Di wê banga xwe de dibêjin ku rojnama Silvan Sesi ya ku li Farqîn'ê derdikeve, ji serî heta binî bi nivîsên Kurdi tije ye û rojnama Silvan Sesi bi van nivîsên xwe, weşan û dibistanêñ Kurdi pêşniyar dike.

Di rojnama Silvan Sesi'vî de şbarevok weha hebû: "Ger Roihrlat" (mebest jê Kurd in -N.M.) îmkan bibînin bi zimanê xwe bixwînin û binivîsin, wê gavê nezanî jî dê ji ortê rabe." Rojnama Diyarbakır Sesi, li ser vê nivîsê disekine û ji bo Îsa Şans weha dibêje: "A muhîm, divê laşê vî heramzadeyî jî ortê rabe."

Îsa Şans nivîsa xwe weha didomîne: "Di rojnama xwe (Silvan Sesi -N.M) de min dest bi nivîsa 'Di Edebiyata Kurdi de bi Devoka (Şîwa) Silîvani, Sêehmedê Silîvî' kir. Beşê yekemê vê nivîsê, di 21.10.1962'yan de derket. Di 23.10.1962'yan de jî ev nivîsa min derket: Gelo di Îdeolojiya 'Xwedê Tîrkan Biparêze' (3) ya Nijadperêstan de Em -Kurd- jî Hene? ...Di 30'yê Çiriya pêşîn de ez cûm Diyarbekir'ê... Roja din, se'et heşte serê sibê bû, gava ku ez li Dört yol'ê (li Diyarbekir -N.M.) diçûm, ez rastî şefê şûba 1. (4) Alî Beg hatim. Bi awakî nazik got Îsa ji kerema xwe tu dikarî werî heta ber cîp(jeep)ê?' Ez cûm. Got: 'Suwar be!' Suwar bûm... Yellah berê min dan Çarşî Qereqolî. Min avêtin bodruma qereqolê, polîs çûn. Ëdî ez bi tenê me. Haya tu kesî jî ji min tune."

Li gor ku Îsa Şans dînîvîse, pişt re wî dibin Qereqola Farqîn'ê û di 1'ê Çiriya paşîna 1962'an de wî derdixin mehkemê, tewqîfa wî birrîn. Wê demê muddeî'umûmê(sawcî) mehkemê ji Kurdên Semsûr (Adiyaman)'ê A. Rahman Bilgiç bûye û wî ji Îsa Şans re weha gotiye:

"-Tişte wisa şerm e Îsa, binêre ez jî Kurd im, rojnamevan im jî. Li Adiyaman'ê çapxana min jî heye. Lê nivîsandina tiştên weha û gotina 'Ez Kurd im'...Bi rastî şerm e!.."

Îsa weha bersîva wî daye: "Muddeî'umum Beg, tu hem dibêji 'Ez Kurd im' û ser de jî tu dibêji şerm e ku mirov qala kurdîtiyê bike."

Pişt re muddeî'umûm dixwaze Îsa Şans bişîne ba doktorekî da ku rapora dînîtiyê bigre û bi wê raporê muddeî'umûm bikaribe alîkariya wî bike, wî berde. Lê Îsa Şans vê yekê qebûl nake.

Di hejmara 7. a rojnama Dicle-Firat'ê de nivîseke Îsa Şans a bi navê "Selaheddînê Eyubî" heye. Dîsa li gor ku di hejmara 8. a Dicle-Firat'ê de hatiye nivîsîn, Îsa Şans endamekî Komîta Lêk-

olînê Folklorê ya rojnama Dîcle-Firat'ê ye.

Ji xeynî rojnama Silvan Sesi, berê jî li ser navê Silîvan'ê hin rojnamen din hatine derxistin. Ji vana ya pêşin, rojnama **Miya Farkin** (**Miya Farqîn**) e (5). Ev rojname, di 6.8.1955'an de ji alî

A. Avşar (6) hatiye derxistin û her di wê salê de hatiye girtin (7). Ji ber ku wê demê li Farqîn'ê çapxane tunebû, rojnama Miya Farkin li Diyarbekir'ê dihat çapkîrin û li Farqîn'ê dihat belavkirin.



Herçiqas ji alî Kurdan nehatibe derxistin jî kovara **Bâris Dünyası** (Dinya Aştiyê), wê demê pirî caran cih daye nivîsên li ser mesela Kurdan û nivîsên Kurdi. Ji ber vê yekê em pêwîst dibînin li vê derê qala wê jî bikin. Kovara Bâris Dünyası, di Nîsana 1962'yan de dest bi weşanê kir. Di vê kovarê de digel nivîsên Musa Anter ên li ser ziman û edebiyata Kurdi, gelek nivîs û nameyên van nivîskarêne Kurd jî hene: **Doğan Kılıç Şîhhesenanlı**, **Abdurrahman Efhem Dolak**, **Kemal Badıllı**, **Hüseyin Sağrıç**, **Bahri Koçkaya**.

Kovara Bâris Dünyası, demeke dirêj weşana xwe domand.

Di hejmara 7. a Bâris Dünyası'yê de, bi Tirkî ev nameya Dr. Nurî Dersîmî ya ku ji Heleb'ê şandiye heye:

(1) Li gor gotina **Mehmet Gemici**, ev rojname di 1959'an de jî derdiket.

(2) Rojnama **Diyarbakır Sesi** (Dengê Diyarbekir), rojnameyek paşverû bû, di 1968'an de **Hikmet Karşioğlu** û **Rifat Karşioğlu** ji nû ve derxistin.

(3) "Xwedê Tîrkan biparêze" (Tanrı Türkü korusun): sloganike fasistên Tîrkan e.

(4) Şuba 1. (Birinci Şube): Daîra Polisê Siyasi.

(5) **Miya Farqîn** an **Meya Farqîn**, yek ji navêne kevn ên Silîvan'ê ye. Xelk iro ji ji Silîvan'ê re dibêje Farqîn.

(6) **Abdüllâsettar Hayati Avşar** (1918-...): Xwedî yan jî berpirsiyare van rojnaman e ku li Diyarbekir û qezayên wê derdiketin: **Ümmid**, **Nur-i Zülkif** (li Erxenî yê), **Lice**, **Hani**, **Kulp**, **Hazro**, **Bismil**, **Çınar**, **Çüngüş**.

Wi, herweha rojnama **İdil** jî derxistiye (Idil: qezayeke Mêrdînê ye).

Ji derveyî nivîsaran, çend lêkolînê Abdüllâsettar H. Avşar jî hene, weki vana: **Diyarbakır Valileri** (Waliyên Diyarbekir'ê) û **Diyarbekir Musikisi ve Diyarbekir'de Musiki** (Muzîka Diyarbekir'ê û li Diyarbekir'ê Muzik).

Kutubxaneke Abdüllâsettar H. Avşar ya dewlemend heye. Di kutubxana wî de hin destnivîs û nameyên şair û nivîskarêne Diyarbekir'ê hene (binêre: Beyzanoğlu, Şevket; Diyarbakırlı Fikir ve Sanat Adamları, cilt: 3, Ankara, 1978, r: 237).

(7) Kara Amid (dergisi), Diyarbakır, no: 6-7 (1970), r: 33

AMANCA ÎNSANÎ

Nivîskarêñ hêja yêñ Barış Dünyası'ye ku xwedî fîkrêñ bilind in, wek iksîra jiyanê tesîrek li dilê minê birîndar kirin. Divê nivîsên we, wek tava rojê ya ronak bêñ qebûl kirin ku cara yekem di tarîxa Tîrkiya me de dicirise. Ez hêvîdar im ku hun di vê amanca xwe ya însanî û bilind de biserkevin. Bi taybetî ez ji ber hîssêñ we yêñ millî we pîroz dikim ku di riya bexteweriya musteqbel a milletê me de ne.

Dr. Nûrî Dersîmî - Heleb



Kovareke din a Tîrkan ku di 1962'yan de cih dida nivîsên li ser mesela Kurdan, kovara Yön bû. Ev kovar ji alî Doğan Avcıoğlu di-hat derxistin. Çend nivîsên ku li ser mesela Kurdi di kovara Yön'ê de derketine ev in:

- Li Ser Munaqşeyekê, Yön no: 36 (22.8.1962) - Dr. Sait Kîrmîzîtoprak*
- Naqos ji bo Kê Lêdixe, Yön, no: 40 (19.9.1962) - Dr. Sait Kîrmîzîtoprak
- Bi Çavê Sosyologan Pirsa me ya Rojhelatê, Yön, no: 90 (18.12.1964)
- Pirsa Kurdi, Yön, no: 194 (16.12.1966) - Doğan Avcıoğlu.

*Di kovara Yön'ê de şes nivîsarêñ Dr. Sait Kîrmîzîtoprak (Dr. Şivan) derketine.

2,3-DICLÉ-FIRAT

Istanbul, 1962

Bantul no YAZI Iskandar
Tilhan Mero adan
EDIP KARAHAN
Iskandarhan : Yusim , Kotar
Bingkuduah jln. No. 12 , Jember

DICLE-FIRAT

Val 1 — Samm. 1

AYLIK FIKIR GAZETESİ

Düzenleme Kurum Başkanlığı
serbestçe niteliği Tətbiq olunur.
LƏSİN EŞRƏFİYATI ANTO-
LIBE AJ Dərslərə rəsmiyyət
tətbiq olur.
Tətbiq olunmuş tətbiqəsi adı: № 44
Mat 5 — Cəzahəgə

Fiat : 50 Kur

İskenderoğlu Irkçılık Tehlikesini Açıkladı

Niçin Çıkıyoruz?

Turancıların Doğu Milletvekili Hakkındaki İstiraheleri Geniş
Tekiler Uyandırdı.

bu bir münasebitiyle halleden hali-
na gelmişimdir. Bu liberal, Cumaku-
teri deerde de dersanı stüdyo
Hariç partisi manşetlerde okur-
sun gizli gümüş hattını politika-
salar. Dolayısıyla bu syahzadeler
anlaştırmak işte Dögür'ü, an-
laşmamıştı. Dögür'ün oğlu, Türk
devletinin ilk başbakanı olan
hazet ve mecenatçı olduğunu her
bir şepte gözlemezdirdi. Fasıl'dan
dönük atılanın oğlu oğlu ve
şeyhlik mülkelerini satan yar-
ınlık doğusunda, hanı pıymalı
dere üstündünde ve hocaüstüne
tepeyi bir şenlik yaptı. Dögür'ün
hazetindeki atılanın oğlu hoca
hazetin kumandasını yine hoca
gelişen şenliklerinde hâlini.
Tütür; ekonomi ve bütçe mer-
kezi olan İstiklalbankı, belli tarihi
tarafıyla fastidiliği alıp yurttaşları
ve aydınları hedef almıştı. Dögür'ün
hazetindeki atılanın oğlu, Dögür'den
birinci kez hocaüstüne hakaç etti
masası mı? Aşağıda galib'e bir
ilet. Adanalı Hami Ömer
Ağa, Dögür'ün Mithat'ı ugurları
ve şeyhlik hattının sonu alılabi-
rıldı. Milli mücadelede serayen
şehitler, hocaüstüne hakaç etti
geleneksel bir hâlin. Hocaüstüne
gibi hoca hâlinde oğlu yeterle
şenlikte hoca'dan hakaç etti
bulundur. Tek derselik meşin ve
demokratik dersemestir, preştejdi

**İşçi ve İşverenin konularına
hizmet sunan işkolcular A.P.A. adası. Bu
ülke genelgesi işverenin işsizlik
reformunu ve işsizlikle mücadeledeki
rolünü de onaylıyor. Bu genelgeyi
yazılım işçilerinin yarısı buluyor.
Düşük maaşlı işçilerin yüzde 70-
rasta, işçi maaşları üzerindeki MEB'in
başkanlığından 1992 yılından beri
yapılan işsizlik rakamları işçilerin
yüzde 40'sını gösteriyor.**

**İşçi ve İşverenin konularına
hizmet sunan işkolcular A.P.A. adası. Bu
ülke genelgesi işverenin işsizlik
reformunu ve işsizlikle mücadeledeki
rolünü de onaylıyor. Bu genelgeyi
yazılım işçilerinin yarısı buluyor.
Düşük maaşlı işçilerin yüzde 70-
rasta, işçi maaşları üzerindeki MEB'in
başkanlığından 1992 yılından beri
yapılan işsizlik rakamları işçilerin
yüzde 40'sını gösteriyor.**

**İşçi ve İşverenin konularına
hizmet sunan işkolcular A.P.A. adası. Bu
ülke genelgesi işverenin işsizlik
reformunu ve işsizlikle mücadeledeki
rolünü de onaylıyor. Bu genelgeyi
yazılım işçilerinin yarısı buluyor.
Düşük maaşlı işçilerin yüzde 70-
rasta, işçi maaşları üzerindeki MEB'in
başkanlığından 1992 yılından beri
yapılan işsizlik rakamları işçilerin
yüzde 40'sını gösteriyor.**

**İşçi ve İşverenin konularına
hizmet sunan işkolcular A.P.A. adası. Bu
ülke genelgesi işverenin işsizlik
reformunu ve işsizlikle mücadeledeki
rolünü de onaylıyor. Bu genelgeyi
yazılım işçilerinin yarısı buluyor.
Düşük maaşlı işçilerin yüzde 70-
rasta, işçi maaşları üzerindeki MEB'in
başkanlığından 1992 yılından beri
yapılan işsizlik rakamları işçilerin
yüzde 40'sını gösteriyor.**

**İşçi ve İşverenin konularına
hizmet sunan işkolcular A.P.A. adası. Bu
ülke genelgesi işverenin işsizlik
reformunu ve işsizlikle mücadeledeki
rolünü de onaylıyor. Bu genelgeyi
yazılım işçilerinin yarısı buluyor.
Düşük maaşlı işçilerin yüzde 70-
rasta, işçi maaşları üzerindeki MEB'in
başkanlığından 1992 yılından beri
yapılan işsizlik rakamları işçilerin
yüzde 40'sını gösteriyor.**

**İşçi ve İşverenin konularına
hizmet sunan işkolcular A.P.A. adası. Bu
ülke genelgesi işverenin işsizlik
reformunu ve işsizlikle mücadeledeki
rolünü de onaylıyor. Bu genelgeyi
yazılım işçilerinin yarısı buluyor.
Düşük maaşlı işçilerin yüzde 70-
rasta, işçi maaşları üzerindeki MEB'in
başkanlığından 1992 yılından beri
yapılan işsizlik rakamları işçilerin
yüzde 40'sını gösteriyor.**



ODAULU BİN GENÇ KADIN

Min hêvî heye Dicle-Firat barê me rake
Di warê ziman li rojhelat xelkê me şake
Zimanê me yê paşde mayî çîçkî bide pêş,
Va ye ji bo wî sipasên xwe ez dikim pêşkêş.

Osman Sebrî

Dicle-Firat (Dicle-Fırat), bi Tirkî û Kurdî li Îstenbolê derdiket. Di bin navê vê rojnamê de hatiye nivîsin ku "rojnameyeke fikrî ya mehane ye".

Kwediyyê wê û yê ku karûbarê nivîsan îdare dike: **Edip Karahan** e (1).

Dicle-Firat tenê heşt hejmar derketiye. Li gor ku di hejmara 6. û 8. a Dicle-Firat'ê de hatiye nivîsin, ev rojname bi taybetî li Kurdistan'ê (mesela li Bingol û Cizîr'ê) û li Îstenbol'ê ji alî karbidestên dewletê hatiye berhevkirin. Dîsa li gor ku di hejmara 8. de hatiye nivîsin derheqê Edip Karahan de da'we hatiye vekirin.

Tê gotin ku hejmara 9. ji hatiye hazirkirin û ji bo çapê birine capxanê. "L ê piştî ku di 6.6.1963'an de Edip Karahan tê girtin, ev rojname êdî nema derdikeve." (2) Wê demê -Edip Karahan ji di nav de 23 ronakbîrên Kurd (3) tên girtin.

Edip Karahan (bi imza Edip Osmanoğlu) di hejmara pêşin de, di nivîsa "Çima Em Derdikevin?" de weha dibêje:

"Karê pêşin ku rojnamê daye ser milê xwe, xebata pêşdexistina ekonomik û kultûri ya Rojhelatê (Kurdistanê -N.M) ye. Herweha (dixwaze) hemû dijayediyêن bîrûbawerî hel bike û yekitiya wan pêk bîne."

"Rojnama me, ji kîjan tebeqe ya civakî (esnaf, tuccar, axa, pale, karker) dibe bila bibe ji her kesê Rojhelatî (Kurdistanî N.M) re û ji ciwanan (xortan) re vekirî ye. Bi şertê ku ew kes bi dil û can terefdarê pêşdeçûyina Rojhelatê be."

"Ev rojname dê siyaseta partîyan nemeşîne û dê li hember hemû partîyan objektîf û bêteref be. Lê divê ev yeka ji bête zanîn ku bêterefî û objektîfî ne ew e ku mirov li hember tevger û ditinêñ partiyêñ pêşverû û paşverû pasif bimîne."

"Rojnama me, dê piştgiriya têkoşîna rakirina van qanûnan bike ku li gor baweriya me sebebê pêşdeneçûyina Rojhelatê ne."

Hin nivîskarêñ ku di Dicle-Firat'ê de nivîsine ev in:

1- **Edip Karahan:** Wî di vê rojnamê de li derveyî navê xwe yê rastîn bi naznavê Edip Osmanoğlu, Hamit Mazıdağlı û Mahmut Bayraktar ji nivîs nivîsandiye. Di hejmara 6. de nivîsa wî ya bi navê "Turkeş û Sosyalizm", di hejmara 7. de "Ka Wa'z Wê bi Kurdi Bihatana Dayin?" û nivîsa bi navê "Cepha Demokratik" heye.

2- **Dr. Sait Kirmızıtoprak (Dr. Şivan):** Di hejmara 3., 4., û 5. a vê rojnamê de nivîsa wî ya bi navê "Dijminê Sereke yê Rojhelat'ê: Faşizm" heye. Di hejmara 6., 7. û 8. de ji nivîsên wî hene.

Di hejmara 3. de rojnamê cih daye vê "Tebrîk" (pîrozbayî) ê:

"Ji destâ nivîskarêñ me Sait Kirmızıtoprak û İsmet Kirmızıtoprak re kurekî çêbuye. Navê wî Dara danîne. Em ji Dara re jiyaneye dirêj hêvî dikin û dê û bavê wî pîroz dikin." (Dicle-Firat)

3- Musa Anter: Wî di vê rojnamê de bi navên M. Anter û Anter çend nivîs nivîsiye (Di rojnama Dicle Kaynağı û Şark Mecmuası'yê de ji navê wî Şeyhmust Elmas e).

4- Halit Nazmi Balkaş

5- Ahmet Botanlı

6- Yaşar Kaya

7- İsa Şans

Hin nivîs ji bi îmza "Kızıltepe Orta Mahallesinden Reşo" (Ji Mella Navîn a Qiziltepê Reşo), Fego Teyrî û Rahşan hatine nivîsin (di rojnama Dicle Kaynağı'yê de ji nivîsên Rahşan hene).

Hema hema di her hejmara Dîcle-Firat'ê de bi Tirkî, çirokeke Reşo heye: Xaltika Talê (no: 2), Xaltika Seyro (no: 3), Xaltika Ferse (no: 4), Dînê û Dîno (no: 5).

Ev sê çirokên Reşo ji bi Kurdî û Tirkî ne: Xecê û Siyamend (no: 6), Swaro (no:7), Heydo û Ferho (no: 8).

Nivîsên Rahşan ji ev in: Melle Ehmedê Cizîri (no:1), Şêx Ehmedê Xanê (no: 2), Haci Kadir Koî (Hacî Qadîri Koyî -N.M).

Ji xeynî vana, nivîs, şî'r û nameyên van kesan ji di Dîcle-Firat'ê de hene: Necmettin Denkdemir, Mehmet Emin Ceviz, Ahmet Aras, Mehmet Şanlıer, Hüseyin Sağnîç (Tatwan), Nuri Nursöz (Cihanbeyli-Konya), Hikmet Şengür, Turanlı, F. Celadet, ji Tatwan'ê Melleyê Camiya Reşadiye: İsmet Kılıç (di hejmara 6. an de bi navê Welat şî'reke wî ya bi Kurdî heye), Selahattin Gümgüm (Varto), Seyid Muhammed Yüce (Muş), ji Licê Bahri Koçkaya (di hejmara 7. de bi navê Girîna Pîrê şî'reke wî ya bi Kurdî heye), Hasan Şeyhanlioğlu (ji Hilwan'ê cotkarek), Ekrem Yusufoğlu, Fevzi Yıldırım, İhsan (di hejmara 8. de bi navê 'Ezapkêşî şî'reke wî ya bi Kurdî heye), Hüseyin Aruk, Dîlbîrin, ji Bozova'yê Müslüm Açıkgöz, Bextreş.

Dîcle-Firat ji bo lêkolînên folklorê, komîteyek pêk anîbû. Endamên vê komîteyê ev bûn: Hüseyin Sağnîç (Tatwan), İsa Şans (Silivan), Bahri Koçkaya (Licê), Ali Özdemir (Bavqan), Zülküf Karahan (Siwêreg), Hüsamettin Aygören (Piran), Fevzi Yıldırım, Mikayil Turan.

Ebada Dîcle-Firat'ê : 41 X 28,5 cm. ye.

no	tarîxa derketinê
1.....	1. 10. 1962 4 rûpel e.
2.....	1. 11. 1962..... 4 "
3.....	1. 12. 1962..... 4 "
4.....	6. 1. 1963..... 8 "
5.....	1. 2. 1963..... 8 "
6.....	6. 3. 1963..... 8 "
7.....	4. 4. 1963..... 8 "
8.....	14. 5. 1963..... 8 "

(1) Derheqê Edip Karahan de ji bo me'lûmatên zêdetir binêre: **Bir Kurt Devrimcisi: Edip Karahan'ın Anısına**, Komal basım-yayım-dağıtım, İstanbul, 1977

(2) Bir Kurt Devrimcisi: Edip Karahan'in Anısına, r: 15-16

(3) 23 KES: Li Kurdistana Bakur (Kurdistana Tirkîyê) ev kesen ku bi navê Yirmiüçler (23'yan) tên naskirin. Derheqê van kesan de bi iddi'a súcê ava-kirina **Türkiye Kurt Talebe Cemiyeti** (Komela Xwendekarên Kurd li Tirkîyê) mehkeme vebûbû (ev komele, sala 1959'an hatibû avakirin). Li gor rojnama Her Gün (28.6.1963), ev 23 kes di 4.6.1963'an de hatine girtin.

23 kes ev in:

1- **Abdulsettar Hemawendi**: Ji Kurdistana Iraq'ê ye.

2- **İbrahim Mamxidir** (ji Kurdistana Iraq'ê, ji Koysencaq'ê ye): Sala 1933'yan ji diya xwe bûye. Xwendekarê sinifa 5. a Fakulta Tibbiyê bû. Nuka li Swêd'ê dimîne.

3- **Xazî Dizeyî** (ji Kurdistana Iraq'ê, ji Hewlîr'ê ye): Sala 1940'ı ji diya xwe bûye. Xwendekarê ekonomiyê bû.

4- **Nejad Remzî** (ji Kurdistana Iraq'ê, ji Kerkük'ê ye): Sala 1935'an ji diya xwe bûye. Xwendekarê Fakulta Tibbiyê bû. Mirîye.

Şâîrê Kurd, Herdî (Ehmedî Hesen Beg), sebebê nivisîna şî'reke xwe -ya ku di 6.3.1969'an de nivîsiye- bi Kurdiya Başûr weha dide diyar kirin: "Bo Nejadî Remzî Efendî wutrawe ke qutabîfî kolêcfî pizîşkî buwe le Estemûl û le herretî lawî da mirdûwe" (binêre: Ehmed Herdî, Razî Tenyayı, çapî du-wem, Stockholm, 1986, r: 91).

5- **Fuad Derwîş** (ji Kurdistana Iraq'ê, ji Bexdad'ê ye): Sala 1939'an ji diya xwe bûye. Xwendekarê Fakulta Tibbiyê bû.

6- **Tal'at Şerîf Muxtar** (ji Kurdistana Iraq'ê, ji Hewler'ê ye): Sala 1934'an ji diya xwe bûye. Xwendekarê Fakulta Diransazîyê (Dişçilik Fakültesi) bû.

7- **Se'îd 'Ebdurrehman** (ji Kurdistana Iraq'ê, ji Kerkük'ê ye): Sala 1939'an ji diya xwe bûye. Xwendekarê Üniversîta Teknîkê bû.

8- **Cemal Alemdar** (ji Kurdistana Iraq'ê, ji Hewler'ê ye): Sala 1940'ı ji diya xwe bûye. Xwendekarê Fakulta Muhendisî ya Mîmariyê bû. Nuka li Ewropa'yê dimîne.

9- Fîrûz Felahat (ji Kurdistana Îranê, ji Ûrmiyê ye): Sala 1939'an ji diya xwe bûye. Xwendekarê Üniversita Teknikê bû.

Ji 23'an ev 14 kesên jérîn ji ji Kurdistana Bakur (Kurdistana Tirkîyê) bûn:

10- Hasan Buluş: Berpirsiyarê giştî yê rojnama **Roja Newe** bû.

11- Enver Aytekin: Berpirsiyarê kovara Sosyal Adalet, xwediye Weşanxana Sosyal û endamê Türkiye İşçi Partisi (Partiya Karkerên Tirkîyê) bû.

12- Edip Karahan (1930-1976): Ji Dêrik'ê (qezayeke Mêrdin'ê) ye. Xwediye rojnama **Dicle-Firat**'ê bû(ji bo me'lûmaten zêdetir binêre: Bir Kürt Devrimcisi: Edip Karahan'in Anısına).

13- Ergün Koyuncu: Ji Diyarbekir'ê ye. Xwediye kovara **Deng** bû. Demekê muddeî umûmîti ji kiriye.

14- Ali Anagür: Ji Dêrsim'ê ye. Ekonomî xwendiye. Serokê Komela Kulturnî ya Dêrsim'ê (Tunceli) bû.

15- Kemal Bingöllü: Awûqat e.

16- Mehmet Bilgin: Ji Bingöl'ê ye. Bînbaşî bû.

17- Fethullah Kakkıoğlu: Ji Bedîs'ê ye. Ekonomî xwendiye.

18- Doğan Kılıç Şîhhesenanlı: Ji Dêrsim'ê ye. Xwediye rojnama **Roja Newe** bû. Wî, li Tirkîyê çend kitêb ji nivîsi û çapkir, weki vana:

-**Barzani ve Kurdistan Cumhuriyeti Kuruluşu**, Yörük Matbaası, İstanbul, 1968

-Mc. Carus-Minorsky-Doğan Kılıç Şîhhesenanlı; **Kürtlerin Menşei ve Kürt Dili İncelemeleri**, Dersim Yayınevi, İstanbul, 1963

Doğan Kılıç, piştî iqtîdara Cunta Faşist a 12'yê Îlona 1980'yî gava ku ji Norweç'ê vegeriya Tirkîyê, ji nû ve hat girtin û işkence lê hat kirin. Nûka li Norweç'ê dimîne.

19- Musa Anter

20- Ziya Şerefhanoglu

21- Sait Elçi

22- Yaşar Kaya

23- Medet Serhat

Musa Anter, Ziya Şerefhanoglu, Sait Elçi, Yaşar Kaya û Medet Ser-hat di da'weya 49'an (**Kırkdokuzlar**) de ji hene.

Disa Musa Anter û Edip Karahan di 1971'ê de ji da'weya Partiya Demokrat a Kurdistana Tirkîyê (Türkiye Kürtistan Demokrat Partisi) û DDKO'yê (Komela Kulturiya Rojhelat a Şoressgêr) hatin mehkemekirin.

Ji bo xebera girtin û fotografên van kesan, li van rojnamen Tirkîyê binêre: Hürriyet (29.6.1963) û Cumhuriyet (29.6.1963).

Herweha li van kitêban binêre:

- **Gürsel, Dr. İbrahim Ethem;** r: 66-73

- **Vedat, Şadillili;** Türkiye'de Kürtçülük Hareketleri ve İsyancılar, cilt: 1, Kon Yayınları, Ankara, 1980, r: 170-228

- Bir Kürt Devrimcisi: Edip Karahan'in Anısına, r: 89-136

24-KEKO

Ankara, 1963

Ev kovar di 6.4.1963'yan de li Anqerê ji alî Komela Xwendekarên Siwêregî yên Unîversîtê ve hatiye derxistin*.

25-DENG

İstanbul, 1963



Ev kovar bi Kurdî û Tirkî derdiket. Li qapaxa wêya dawiyê, bi Kurdî hatiye nivisîn ku "mehê carekê der tê, kovareke siyâsi, komelâi û zanendî ye." Bi qasî ku em dizanin tenê du hejmarêne wê derketine.

Li ser qapaxa pêşî, li hêla rast a navê kovarê, bi Kurdî ibareya "hevîya rojhilat" heye. Li ser qapaxa hejmara 2. jî bi Kurdî ibareya "şewqa rojhilat" heye. Disa li ser qapaxa dawî ya hejmara pêşîn, bi Kurdî weha hatiye nivisîn:

Xwedî: Ergun Koyuncu

Midîrê jê pirs: Yaşar Kaya (di hejmara 2. de Midîrê jê pirs: Celal Ergün e).

Midîrê çapkirina tevaî: Medet Serhat

* binêre: Abbas Izol, "Maksatlı İthamlar", Körmüşkan (gençlik sayısı), Ankara, 1965

Amanca kovara Deng, di hejmara pêşîn de hatiye diyarkirin (li fotokopiya jêrîn binêre)

Nivîsên hejmara pêşîn ev in:

- 1- Bi derketinê re - Deng
- 2- Tirk û Kurd - Ziya Gökalp (ev nivîs ji kovara Îctimaiyat hatiye girtin.)
- 3- Silo - Aslanoğlu
- 4- Xerabo (sitraneke bi Kurdi)
- 5- Keleş Xemê (sitraneke bi Kurdi)

6- Ma'mûr - Ahmet Kemal

- 7- Portre (derheqê Kemal Badillî de nivîseke bi Tirkî)
- 8- Li Nav Kurdan Dîn (Ol) - Musa Anter (di binê vê nivîsê de navê Ahmet Kemal hatiye nivîsin).

9- Henek: Tarixa Varta - Rahşan

Ev nivîsa Rahşan, li ser polemîka Dr. Sait Kîrmîzîtoprak û Atil-la Fîrat (1) hatiye nivîsin.

10- Ayşo (şî'reke bi Tirkî) -Turgut Boran

11- Meha Çuyî li Ser Rojhelatê çi Hat Gotin?

12- Plana Pênc Salî ji bo Pêşdeçuyinê.

Di rûpela 7. a hejmara pêşîn de îlana kitêba Musa Anter, Kimil (Qimil) heye. Di rûpela 6. a vê hejmare de ji ev agahdarî heye:

"Wezîrê Tenduristî û Civakî berêz Yusuf Azizoğlu, li Anqerê besdari şevê folklorî yên Rojhelatê bû û di van şevan de pe-yivî.

"Berrêz Azizoğlu van axaftinêñ xwe ji bo hemşehrî û xorôtê Roj-helatê kiribû. Di hejmara dahatû (hejmara ku bê) de, hun dê li ser van axaftinan nivîsa yek ji nivîskarêñ kovara me Dr. Sait Kîrmîzîtoprak bixwînin..."

Di hejmara 2. de nivîseke Mehmet Tirîm (Eruh) û şî'reke Kur-mancî bi navê "Konê Reş" heye, Her weha ji hêla Gêxî (Kiğı) sitra-na "Baxçê Kemal Paşa" û ji hêla Hezro ji sitraneke bi navê "Eman Eman" heye.

Tîştekî din ê ku bala meriv dikşîne ew e ku di rûpela 17'an de bi Kurdi û Tirkî reklama "Sümerbank" û "Ziraat Bankası" heye.

Di hejmara 2. de bi Tirkî nivîs û şî'rên van kesan hene: Niyazi Okaygün, İsa Şans (Silivan), M[ehmet] Tirîm (Eruh), Yaşar Kaya, Ahmet Kemal, İ[sмет] Nizami, Turgut Boran, Halim Yağcioğlu, Kemal Badillî, Rahşan, M. U., Musa Anter.

Dîsa di vê hejmare de nameyêñ van xwendevanan hene: Bahri Koçkaya, İsmet Nizami, Saffet Aykut, Seyfeddin Kuri M. Zade, Salih Akgül, Hacı Ali Bucak, Halim Yağcioğlu.

Piştî derketina hejmara pêşin, derheqê kovara Deng de da'we (mehkeme) vebû. Yaşar Kaya û xwendekarê Fakulta Huqûqê Medet Serhat ji ber berpirsivariva kovara Deng'ê hatin girtin. Bi îthama propaganda Kurdîtiyê, tewqîfa berpirsiyarê kovara Deng, Yaşar Kaya hat birin û ew demekê di Hepisxana Sultanahmet'ê de ma. Medet Serhat jî ji alî mehkemê (1. Sulh Ceza Mahkemesi) bi "kefaleta neqdi" ya 2000 lire hat berdan (2).

Di rapora pisporan (bilirkişi raporu) a derheqê hejmara peşin a kovara Deng'ê de hatiye nivîsin ku di vê hejmarê de tiştekî ku bibe delîlê sucê tuneye. Biryara vê raporê bi ittifaqa hemû endaman, di 1.6.1965'an de hatiye dayîn û di binê wê de imza van kesan heye : Prof. Sabri Esat Siyavuşgil, Prof. Cemal Tükîn, Doçent Ayhan Önder.

Li gor ku Dr. Şivan dînivîse, piştî derxistina kovara Deng, karbi-destên Tirkîyê ji nû ve welatparêzên Kurdan digrin û "wan dişînin Hepisxana Leşkerî ya Balmumcu'yê, li wir bi mehan işkencê li wan dikin û di dû re wan dişînin Mehkema İdara 'Urfî ya Leşkerî..." (3)

Ebada kovara Deng: 27,8 X 19,3 cm. ye.

no tarîxa derketinê

1.....	15.4.1963.....	16 rûpel
2.....	15.5.1963.....	18 "

(1) Atilla Fırat kurê M.Şerif Fırat e (M.Şerif Fırat nivîskarê kitêba Doğu Illeri ve Varto Tarihi ye).

(2) binêre: rojnama Milliyet (1.5.1963 û 11.7.1963) û rojnama Her Gün (28.6.1963)

(3) Şivan, Dr. S. A. ; r: 60

‘ELİK Ü FATİK

Arêkerdox: Mihê 'Elişanî

’Elik û Fatiki way û biray ben. Pî yîn est, may yîn çinka. Pî yîn binêk’ xort beno, wazeno bizeweco.

’Elik û Fatik şenik î. Pî yîn rind nêşken miqatey yîn bibû. Pî duşunmiş benû, behdi z’ qerar xo dono ki bizewecyêw, cenîkêk bîyar, hem miqatey ’Elik û Fatik bibû, hemiz’ yî r’ xizmet bikû.

Pî yîn yînê r’ gorey çend roco non virazeno, tedarek yîn vînen û yîn rind şîret ken, von:

-Ez çend roc şima teyna verdeno, şino xo rê geyreno cenî. Şima wurdî z’ ver kîyî ra dûrî nékon heta pî şima şima rê mayki bîyarû, hem miqatey şima bû hemiz’ xizmet pî şima bikû.

’Elik û Fatiki rind şîret ken û warzen cilon xoy rindo don xo ra, poxnoton, poliko û zero û keno wurd kiştön heqbey xo, astorey xo sey veyvek xemelnen, heqbey xo erzen ser astora kihêl; lewo non alışkon ’Elik û Fatik ra, xatir wazen û ling erzen ser paştey astora kihêl, xo tiro şidnen, kon rayero.

Şino, şino, şino, epey şino, behd yen ver kîyon dewêki d’ astora kihêl zept ken, tira yen war, heqbey xo erzen mil xo ser. Dewîc yen ver a, astor tira gîn, ben xon dew, teslîm xoncî ken û kon mîyon dew. Pî

dew yen ver a gîn ben kîye. Dewîc dewi z' kon yîn dim a, pêr shin kê axay dew. Axa meymonon xo bi qedir-qîmet qebul ken. Ber yî timo meymono r' akerdew', odehy meymono rakerdew'. Pêr shin kê axayid' roşen. Axa xizmetkaron xo ra çay û qehwe wazen. Binêk monen, çay û qehwe yen, behdî qalî, meseley aben. Millet sûr bona meselo di. Dewr yena meymonî, şom, yena millet şona wena. Behdî şomî reyna qalî, meseley dewom ken. Dewrey meymon ya, binêk duşunmîş ben û dest bi mesela ken. Binêk' hewa ra, çep û rast ra qal ken, behd yen ser mesela omeyîş xo, raştey yî cem'etî r' qal ken. Pîl dew axa von:

-Omeyîş to kê mi, ser serî, ser çim. Madem ki to ser doşek mi d' mesela xo 'eskera kerd, Hûmay (Homay) biqedîno se ezik' bi emir Hûmay û rizay Pêxemberî biqedîno.

Axa keyney xo don yî û yî r' mare keno. Qelin ya z' bol gîn, yî z' qebul ken, dewi d' hîrê roc hîrê şew veyve ronen. Bi dawul û zirna këf û şewq ra qednen. Behd qednayîş veiyî, pî 'Elik û Fatik, axay û dewico ra xatir wazen, veyvek erzen peyney astor, yî z' weyşen û kon rayer. Epey rayer shin, yen dewey xo, kê xo ver di yen war. Veyveki z' astor ra peye ken, shin kîcy xo, mîyon 'eylo. Kîye d' pî 'Elik û Fatik, mîriya (damarîva) yîn don yîn şinasnayış û yîn temî ken, von:

-Ya vac se, şima gerek sey ya bik'. Şima ya biteqnî se bênamey ma z' **xerepîn**.

'Elik û Fatiki z' qebul ken. Çend aşm vêren, mîriyey 'Elik û Fatik yîn ra hesûdîna. Pî yîn arey xo ken, shin hêga cit, şon di yen. Betelyaye şomey xo wen, kon bin **cay**, rakon.

'Elik û Fatik roc roc ze'if benî, xo ekisnenî. Mîri yîn ra ona hesûdîna ki bê xeberey pî, fenêk duşunmîş bona ow qerar xo z' dona.

Pî ser sibay rew warzen, shin cit, şon d' yen, cenî ra von:

-Citey ma tey menda biqediyew. Behdi z' ezik' **berze** (bezre) berzo.

Cenî tira vona:

-Citi k' qedyay xeber bid' mi.

Pî 'Elik û Fatiki z' ceney xo ra von:

-Siba heta têştare k' cit qedîna û wextik' siba 'Elik û Fatik mi r' sêpare ard se wa berzey toximiz' xo d' bîyar'.

Cenî vona:

-Wa b'.

Ser sibay rew mîrdey cenî warzen, gayo gîn shin. Cenî warzena, xeley berzî vecena, pêri tewa d' qilênenâ, kena heqbo, uca ronena; sêpare z' virazena, nizdî têştarî heqbo erzena ser paştey herî, 'Elik û Fatiki z' wenena bênamey heqbo, sêpare z' nona ver, yîn erşawena hêga.

Kîye d' fenon û oyunbazey xo duşunmîş bena.

'Elik û Fatik şin hêga, pî xo het a. Pî yîn yen yîn ver a, ser paştey her ra sêpare gên, 'eri ronen, behdi z' yîn ser paştey her ra ronen, berze z' ronen. Pî, 'Elik û Fatik roşen, sêpare bênamey xo d' ronen wenî. **Behd** sêparî, pî warzen heqbon berzî erzen xo mil, kon mîyon hêgay berze erzen. Ser hêgay ra heta bin hêgay berzey xo erzen, pêri qednen, 'Elik û Fatik wenen herî, gayon xo don xo vera yen kîye.

Wextîkew derg ser ra vîren, mîrik herg roc şin ewnîn xele, xele **nêzergûnyen**. Xeley dewico pêrin zergûnyen ê yî nêzergûnyen. En durim ra şaş monen, cenî ra person, von:

-En xeley ma d' halîk esto, ma se bikî ki en xeley ma zergûn bibû?

Cenî tira vona:

-Halkî esto, en gurey Hûmay cîw, Hûma yew sebeb ra ona ard ma sere.

Mêrde cenî ra von:

-Lazim ma sebeb en gurî bizonî, **nêney** ma pêr ve, çaney ra bimîrî. Cenî, ti vona hal-gurey ena mësela çina w? Mir' ona yenû ti sankî bizona.

Cenî vona:

-EZ nêzona, feqet yew zîyar nîzdî dewey ma d' esta, ez ona pey hesyayo ki kê şin dert xo tira von, zîyar sebeb en gurî ke ra vona. Gerek ay çîyo k' zîyar ke ra vona, ke bîyar ca, nêney felaketon felaketo yen ke sere.

Mêrde cenî ra von:

-Ti cay aya zîyar mi r' tehrîf biki, ez siba şero.

Cenî mîrdî r' tehrîf kena, aya şew ser vîrena, ser sibay şefeq ra cenî warzena ver mîrdî no (nan) kena **boxça**, kîye ra z' vona:

-EZ şino birro ko ra ono.

Ow kona rayer, bi vazdayîş ver mîrdî **şina** kona qot dar. Binêk monena, vîmena mîrde hêdî hêdî nîzdî qot dar benû.

Mêrde duşunmîş ben, cayî k' cenîk yî r' tehrîf kerd omew ver. Astor xo ra peye ben, ver qoti d' çok don 'erd, binêk du'eyo ken, **be'di** z' sebeb omeyîş xo von. Binêk vinden, ewnîn zîyar ra vengîk vecya. Xowf mîrdî gên, tersen û heme cay yî recefîn, zaf araq erzen. 'Emir xo d' ona çîk nêdib'. Wurd goşon xo don ser' qot, "zîyar" tira vona:

-EZ zono ti semed çinay omeyîta. Çîkewik' to ra vaca, ti gerek bîyar ca. Ti near ca se belawo k' inka omew to sere qe, hima pîley pîlo Hûmay on to sere. Ay çax serey to z' tira şin. Hûma şima ra 'aciz bîw. Semedik' bib' weşi zi çîkewik' ti tira zaf hes ken ti gerek ay çî bik' qirbo. Heskerdiş to z' Hûmay ra 'eyon û, 'Elik û Fatik ey. Hûmay semed

qirbonî z' von "gerek qul mi nêdecî", gonik' dono gêno z', gerek **hezni** z' nêroneyew. Semed qirbon 'Elik û Fatik, Hûma ona emir ken: Hêgao k' berze zîl nêestû, 'Elik ser ay hêgayi d', Fatik bin ay hêgayi d' qirbon ki. Gerek gûney yîn bires yemno. Ver qirbokerdiş yîni zî gerek cil yîn neweyî b', serey yîn site b', wêr yîni z' weşi b'. Heta en waşte nêr ca, gerek cayki d' qal nêb'!

Vatey zîyar qedîn, mérde şaş monen, zon yî nêgêren, leşey yî ser yî d' nêvindena. Warzen pay, lingey xo erzen ser paştey astor kihêl, ver yî don dew. Binêk dûr kon, cenî mîyon qot ra vecêna, bi vazdayış ver xo dona dew. **Rayer** xo ser binêki z' birro arêdona, heta şina dew mérde verney ya şiw kîye. Ya k' yena, mérde tira çik nêpersen. Cenî hema lez lez şom virazena, **meşref** rakena, no ser ronena, 'Elik û Fatik ser noni d' ronişnena, yîni r' şom dekena, ven dena mérdey xo, yî von:

-Zerey mi nêşina çîk.

Cenî ewnêna fek xo d' bilbilo ken, cenî tira persena, vona:

-Ti eyr şî zîyar, en bela k' omew serey ma sebeb yî çina w? Nika zîyar to ra vat. Heta inka kom şîw ser aya zîyar, se vat se, sey ya vecyaw.

Mérde, zîyar ra ci eşnawit se cenî ra von û cenî ra persen, von:

-Cenî ma se k'?

Cenî tira vona:

-Mérde, eger ti sey zîyar nêk' se ez ita nêvindeno û to r' kîye nêkeno.

Ezik şiro kê pî xo, şima ki z' veşoney ver bimîr!

Mérde ewnênen cenî ra, zerey yî bena siyay. Se kû, dest yî ra çîk nîn'. Çikew bîniz' nêzon se bikû. Cenî ra von:

-Ti hema se kena bik'.

Mérde heme ci cenî rî ver den, tira von:

-Ona biki ki wa 'Elik û Fatik bin d' pey nêhesey.

Cenî mérdey xo ra vona:

-Ti mi r' verd', ez heme ci hal keno.

Hema ona serey 'Elik û Fatik şona (şuwena), cilon newe dona **ti-ra**, çîw' weş virazena, dona yîn; berzon kuyo, dendikon vomo, niho ona **tewa** d' qilênenâ, kena wurd cêbon 'Elik û Fatik, yîn ra vona:

Şêrîn ser bon ma, xo r' kay **kîn**, kê (key) k' mi ven da şima, ay çax **bêrîn** war.

Yîn rind şîret kena, vona:

-Ser bon ma ra **meşîn** cayk.

Mêrî, 'Elik û Fatik kenâ ser bon, **sili mi** z' hewa nona. 'Elik û Fa-

tik bon ser monen. Fatik bineyna pîl a sey 'Elik, kerdey mîrî r' şaş monena.

Berzon xo wen, ewnêñ ki yew milçik xo ser **sifirnî** d' rona. Bena çivcîvey ya. Fatik goş xo rind dona ser, ewnêna milçik ra ki veng vece-na. 'Elik û Fatik goş xo rind don ser, ewnêna milçik vona:

-Çîv çîvi, kardo seqênenî, 'Elik û Fatik sere birnenî! Çîv çîv çîvi, kardo seqênenî, 'Elik û Fatik sere birnenî!

Çend ray ra milçik pêser pêser vona, wurdî z' rind **fêm ken**. 'Elik, Fatik ra von:

-Ma se k' **wakey**?

Fatik 'Elik ra vona:

-Bira, ma birem!

'Elik von:

-Wa b' wakey.

Fatik dest 'Elik gêna, xo pey bon ra erzen war, bi vazdayış remen. Uca ra dûr kon, ver xo don ko. Şinî, şinî, kîye ra zaf dûrî kon. Rayer dewaro ser şin. 'Elik rayer a zaf teyso ben, way xo ra von:

-Ez zaf teyso bîyo.

Fatik tira vona:

-**Biraym** binêkna sebir bik', ma xo biresin ênî ser.

Binêk şin, Fatik ewnêna 'Elik çewt **bîw**, ha herindey pay xizalek ra awey **varita** k' arêbiya **quriç** ken. Fatik heta agêrena 'Elik ser, he-ma nêresaya **de**, ewnêna 'Elik ben xizalek. **Qudim** çokon Fatik şikên, roşena bermenâ, bermenâ, hesir çimon ya d' nêmonen. Vona:

-Ez **inka** bê biray xo 'Elik se biko?

Zerrey xo d' Hûmay ra wazena bib' yew golali k' ser **qorçon** xiza-lek ti b', hem rayero binaw biray xo hemiz' yî ra bin d' nêabiryew. Teref Hûmay ra **waştey** ya yen ca. Fatiki z' bera yew golal, firena, xo ser serey xizalek ra ronena.

Xizalek koyo ra hem çerena hêrniz' geyrena. Golal firena, hewa ra heme ci vînena. Tehlukeyik bibû, yena xizalek ra vona, şin xo nim-nen. Wextîkew derg û dûr ona romen. Roco ra rocîk zaf **tîpî** bera, xi-zalek quley mixara ra vecîn teber, golali z' tira vecîna teber ki teber a tofonîkew zaf xidar **est**. Golal daymiş nêbena, xizalek ra vona:

-Ez nêşkeno deha teber a vindiro, ez ageyreno mixara, ti z', zaf dûr mek', bineyk bigeyr, ageyr bê.

Xizalek von:

-Wa b' wakey.

Golal firena yena mixara. Binêk ser ra vîren, ewnêna xizalek bi

çargûm ageyra. Golal firena, yena kuley mixara, vînena seydono (seydvono, seydonçîyo, seydwanan) rêçey xizalek **re** nizdî mixara bî. Hîn ne cay remayîş, nê z' cay xo nimitîş monen. Seydon yen ver qul, nîşoni r' xo hazır kenû k' bin (bino) xezalek ra. Teref Hûmay ra uca zo (zon, ziwan) kon fek golal, vona:

-Vindêrîn!

Seydon şaş monen, behdi z' vînen xizalek bi yew xort. 'Elik û Fatik ben sey xoy verî. Seydon yîn ra persen, von:

-Şima çikes î, şima koca ra omey îta? Xo **bidin** ma şinasnayış.

Wextikew derg ser ra viyerto, şar 'Elik û Fatik xo vîr a kerdi. Kalon û pîro vişêr yew vîr nêmend. Seydon ra von:

-Ma 'Elik û Fatik ey.

Dewey xo **von**, çîkewik **ay** wext omew yîn sere von û von:

-May way û biray.

'Elik û Fatik seydon het ra **agêren** dew, çîk sey ver nêvînen, ew-nênen heme çî bedelyaw. Merdumik' ko ra dîw, yîn ben kê xo, kê yî di monen*.

* Ez hema şenik bîyo (texmînê mi ra 1967 di) may mi ena **fistanik** mi rê vatbî. 1986 di Stockholm di seki mi vîr di mendibî mi nuştı.

Beyannamey

Şêx Seîdî Pîran

Ev belavoka jêrîn a ku tê gotin ji alî Şêx Seîdî Pîran ve li Kurdistana Tirkîyê hatîye belavkirin me ji kovara Rojî Nwê girt. Berpirsiyârên kovarê jî metna vê belavokê ji Îsmaîl Heqî Şaweys gitine. Lê, berpirsiyârên kovarê an ji Îsmaîl Heqî Şaweys bi xwe belavok wergerandine zaravê Soranî û çapkirine. Û ji belavoka 'eslî jî tu tiştek wek belge yan fotokopîya 'eslî çap nekirine, tenê nivîsîne ku ev belavok di meha Adara 1924'an de bi Kurmancî û Tirkî ji teref Şêx Seîdî Pîran ve hatîye belav kirin.

Wekî tê zanîn li gelek ciyan hatîye nivîsîn û tê gotin ku di dema Serhildana Şêx Seîd de gelek belavok hatine belav kirin, lê bi qasî ku em pê dizanin heta nuka di tu kitêb an kovarekê de belavokeke wê demê nehatîye çapkirin. Mumkun e ku di arşîvên hin kes û dewletan de hebin, ew jî êdî dimîne ji bo rojêñ pêş.

Lê dîsa jî wek nimûne em vê belavokê her bi zaravayê Soranî ku Îsmaîl Heqî Şaweys nivîsiye an tercume kirîye werdigerînin ser herfîn latînî û çap dikin. Û hêvidar in di rojêñ nêzîk de 'eslyîn van belavokan bi xwe dê derkevin ronahîyê. (M.Lewendî)

"Em beyannameye le layen qaremanî gewrey netewey Kurdewe; Şêx Seîdî Pîran le mangî Martî salî 1924'î Zayînî da bilawkirawetewe. Beyannameke be Kurdiyê Kurmancî w be zimanî Turkî nûsrabû w le nawçey Erzerûm, Wan, Bitlis, Diyarbekir, Xerpût û Melatiye bilaw kirayewe."

Turkan, 'Usmaniyan daxekem be nawî dîn û xelafetî İslâmîtewe eme 400 sal e êmeyan bere bere dîl û jérdest kirdiwe w ber ew tarîkî w nezanîyan birdûyin, we rîy nehatîyan hênavete berman. Xoyan mirduyî beşî zindû w xur in we legel xoyan êmeş kêş eken. Îtit milkeçî bo zordaran tarîkî paristan.

Em Turkane her le mîjewe be koçerî hatûnete nawman we be fir û fêl xoyan damezrandiwe, welaî êmeyan dagîr û wêran kirdiwe. Kurdistan hergîz wek emro kawil nebûwe we awa hêlaney bayeqûşan û şwêni gurgan û bozqurdanî Tûranîyan nebûwe. We-latman wa bêbeş û hejar nebûwe, belam halî emroman serger-



ŞÊX SAİD PİRAN
1925

mejî

dani w malwêranî ye, we hîç Kurdêk , hîç dîndarêk qibûl û pê-sindî naka.

Pêwîst e le ser hemûman lem jîyane tal û bêbextîye xoman rizgar keyn, le ber ewe pêwîst e le rîgay rast û heqperistî la nedeyn, le mirdin netirsîn, le rîy heq sendina nebezîn. Bo hestî nawbangî bapîran û gel û wilatman, xoman giyanmanî bo fîda bikeyn.

Beramber be serbazanî Turk be taybetî, beramber be efseran û serok û qûmandanekanî Turk ke derbarey jin û kiç û minalanman zor bêbezeyîyane ebzûnewe we be pêçewaney dîn kuştar eken biwestin we toley em beseziman û bê deselat û bê çekane bisênen û xwêniyan wun nekeyn. Belam beramber be dîl û zamdaran nerm û nîyan bîn.

Beramber bew serbaze Turkaneş ke şer naken û xoyan be dest êmewe eden (teslîm ebin) pêwîst e nerm û nîyan bîn û wek biray xoman reftarîyan legel bikeyn.

Le şerra desttan nelerzê, le mirdin netirsin, çunke jîyanêkî hîç û pûç û dûr le cîhan, jîyanî bêbeşî w bê destelañ jîyanî pir xem û siza w nasor û xefet û kesasî bo hemûman şermezari ye. Mirdinêkî azayane gelêk lew jînedîliye xoştir e.

Aşkira ye ke Turk bê peyman in, we beramber be Kurd zor zordane w namerdane ecûlênewe. Emey Kurdîş ebê dersêkî ewto be Turkan bideyn ke hergîz le bîrîyan neçêtewê we rûreşî w refîtarî gurganey Turkan bo hemû cîhan derxeyn ke çon bê kelk û wêraneperist û gurg û dirinde w xwênxor in. Le batî le naw em zordarane da bê kelk bijîn, be komel mirdin le rîgey heq û rizgarî da şehîdbûn gelêk şîrîn û xoştir e.

Ta mirdin êmemanan bo ew bira Kurdane, bo ew mindale nazzdarane ke le diway ême ejîn ebê meşq û dersêk le giyanbazî ême wergirin we bo diwaroji jîyanîyan gewherêkîyan pê bibexşîn, ta le rîy heqperistî w rizgarî la neden we berew rûnakîj jîyan bîron, biyancûlinîn.

Hewl den ba be rûyêkî sûrewe bijîn, ba hemûman le rîy azadî w serfirazî da be komel bimrîn we nawníşanêkî berz bo netewekeman peyda bikeyn, be yekêti w birayeti, be komel koşış kîrdin û raperîn zor berzî ye, we ebê be cîhanî rabigeynin ke ême beramber zordarî w narewayîy û nadadî raperîwîn û be rengarî bûynetewê, ebê hewl bideyn le herdu dunya da birayetîman râgirîn û heqperistîman perwerde keyn, ta beramber Xwa w heq û ademîzad şermezar nebîn û le herdû dunya bêbeş nebîn.

Ey gelî Kurd, çake w xirape be dest xoman e.

Be bîr û kirdewey xoman nebê her gîz rizgarman nabê we le

tarîkîyewe nageyne rûnakî. Ebê koşış bikeyn, inca herdû dunya-man dest ekewê. Le jêr zordarîy Turkana zor mayinewe eger her çaweniwarrî ewan bîn, bê dest, bê gîyan bogen ekeyn û errizêyn.

Eme çwar çerx e heta emro Turkan meşkî kîne w dujminayetî w temelî w bêkarî w yektir kuştin û talankirdin û mal wêran kir-dinman da eden. Her gîz nezaket û nerm û nîyanî w yektrî xoşwîstin û lêburdin û zanist û hunerîyan fêr nekirdûyin, hemîşe rê w şwêni koçerîtîyan nîşan dawîn.

Ta key wa sist û bê kelk dujmin be yek bîn, îtir le ser meşq û rîgey Turkan roştin bes bê... Hawkarî legel "Kemalîyekan" bo Kurdan, ci bo dunya w ci bo axîret nehatî ebexşî. Îtir berew rûnakî w azadî, berew birayetî w ademzad perwerî.

Kurdan her le çerxî "**Mem û Zîn**" ewe ta emro jîyanman saz ne-kird, awatî **Ehmedî Xanî** man nehênaye dî, bo ye perîşan û ser-gerdan ejîn û dujminanman be xo şad kird.

Îtir gîyanî Ehmedî Xanî, dengî şîrînî azadî Mem û Zîn bilind bikenewe, awatî baw û bapîranman bijîninewe, amancîyan bênine dî.

Ey gelî Kurd!

Zor baş ezanîn ke le rojî reş û nehatî da Turk hawarî bo Kurd hêna-wê, belam le rojî xoşî da netewey Kurd nenasîwe, we le destkewtekanman Kurdi bê bes kirdiwe, we nek her awa bê pey-manî niwandibê w peymanî şikandibê, belkû ke boşî helkewtibê nêze w sungîyekeşî derhêna-wê w berew singî Kurdi araste kir-duwe. Bem rengenamerdane be xîyanet padaştî Kurdi dawe-tewe...

Fe'teberrû ya ûle l' ebsar.

Mart, 1924'î Zayînî

Şêx Se'îdî Neqşî-Pîran

Em beyannameyeman le mamosta İsmail Heqî Şaweys'ewe bo hatuve. Zor çapas ekeyn, we eme beşêke le perrawekey ke hîwaman wa ye le diwarojêkî nizîk da bixrête jêr çapewe.

Ev nivîsa jorîn ji "Rojî Nwê; Govarêkî edebî, sîyasi, komelayetî ye, jimare:7, salî yek, Teşrinî Yekem, 1960, Çapxaney Kameran-Silêmanî, rûpel:36-39" hatîye girtin.

transkirîpsiyona ji herfîn 'erebî: Mahmûd LEWENDÎ

Gergerînok an Siwarê bi tenê

IV

BAVÊ NAZÊ

Siwaro bi rûnişvanêñ bajêr yêñ kişişokî, xwe kişişsand heya gihiş koşka melik. Meşa mîna maran, rûniştina li ser kabok û qeleviska û tevlihevbûna xelkê, roja "heşrê" berçavan dikir. Mîna vê rojê kesî guh nedida kesên din û her kes bi halê xwe daketibû. Her yek bi riya xilasê ji cezê melik mijûl dibû. Diyar bû, ku rûnişvanêñ bajêr berê di rojêñ wihan de derbasbûne. Wan dizanî ewê gunehkarbin, heger "kitêba" wan di destê rastê de be yan jî di yê çepê de be. Wilo jî wan xweş dinasî, ku seata hesabê gunehkariyê nemal fêde dike, wiha jî nezarok.

...Di vê rojê de, xweristê jî mîna ku bixwaze alîkariyê bi stemkar bi-ke, hemû xezeba xwe jî devê xwe avêt û ezyeta xwe îhand wan. Xwesi-kekê jî bi herhawayî xwe xemilandibû û li teniştâ melikê -Dêw qerfê xwe bi hustexwaran dikir.

Her dem bi wir de diçû, xezeba xweristê xurtir dibû; bahozê dar ji rehêن wan radikirin û davêtin ber nigêن xwe, sermê jî rûyên qemiran-dî diterikan û xwîn bi wan dixist. ev roj rojek durî aqila bû û siwaro tiştên wiha nedîtibû. Ji siwaro xwuyanî dibû, ku rok jî li nîvê asîmana rawistiyaye û tîrêjên wê bê tênin. Paşî li vê topiraxê taritiyê asîman girt, tenê carna- carna birûskêن rûhniyê xaçîrêk ji xwe re vedikirin.

Erê siwaro xwe li ser zikê xwe dikişkişand, lê her çavêن xwe li melikê-Dêw digerand... Pir çû, hindik çû dawiya dawî melikê-Dêw bi taca serê xwe belû bû. Ew wilô bi payetî rûniştibû, te digo qey ew li şû-na xwedê li ser "ers" rûniştiye. Wilo jî wî bi çavêن biçûk li xelkê temâşe dikir, mîna ku ew kelmêşan li ber xwe bibînin. Xelkê jî ev meznayî têde didît û bi dîlî, kolayetî li ber rawistiyan û koşka wî tewaf dikirin, mîna ku herin tewafa "kevirê res".

Siwaro ev tiştên han naskir û xwest hîn bêtir tiştên nebihîstî û nedîtî, bibîne û bibîhîze. Lê gava xwest hîn bi pêş de here, pêlên kişişikan rê li ber girtin û wî nema karîbû bêtir nêzî keleha melikê-Dêw bibe. Ew li ciyê xwe ma rawistiyayî û nabera demekê û demekê awirêن xwe li Dew digerand. Hîn Siwaro wiha bû ji nişkave fîz-fîza bahozê xurtir bû û hustexwaran bêtir xwe xistin qaqilêن xwe. Lê belê vê rewşa ha dom nekir, lewra dengê mîkewî yê xweş bahoz haj kir û bêpêjnyê xwe berda ser xweristê. Ji bo yê yekê Siwaro bi hisanî gotinêن xedya deng bihîst û wê jî her bang dikir û digot:

-Hê gelî hustexwaran, bela dengê min jî bighê we!!.. Ne tenê Dêwê-melik xêr û bêra bela dike, ez jî dilovanî û kîna xwe belav dikim... Ji mîj ve tuxmê we gotiye: "Her tişt di wextê de başe". Ez jî di demê de ezê gotina xwe bêjim...

Siwaro, dîsa bîmîyîtiya xwedya deng û şêrînbûna wê hisiya. Wî di xwedya deng de yarka sipehî naskir. Ji bo wilô bi dil û can gotinêن wê bihîstin. Wilo jî wî xwest bi çavêن xwe Dêw bibîne û wî bide ber sipehîbûna Xweşikê, de bizanibe mikufêن wan gora hevin, an na. Bi dîti-na Dêw Siwaro ma matmayî, çimkî wî qezmekî megrûdî dît. Ew netenê kin bû, lê zik tilêr bû û xwediyê biçmekî mekroh û telomelo bû. Bê hemdî Siwaro bişrandina qerfayetî bi ser lêvan ket. Diyar bû ev bişrandina henekpêkirinê bi wî û qewmê wî bû. Di vir de wênek û berge-hek ên ne li gora mikusêن hev li ber çavêن Siwaro mîna rew-rewka çûn û hatin. Wî Dêw bi pîra ku tentena li ber devê şikeftan dihune, şibi-hand. Paşî gotin ji devê filitî: "Xweli li serê me hemiya be!!."

...Melikê-qezim an Dêwê-qezim li ser erşekî mezin bi frehbûna fe-rekî destarêن dengê bû. Erşê Dêwê-qezim li ser keleheke kevnare bû. Xwest dihate xuyakirin, ku dîwarê kelehê ji aliyê bakur de tê hilwişan-

din. loma jî dilê Dêwê-qezim li wî alî nerûdinişt û navbera demekê dergevanên wê diguhertin. Di ciyek wiha û rewşek wiha de, Dêwê-qezim bi pozbilindî û ehmeqî li xelkê temaşê dikir. Li aliyêñ herdu mîlén wî bi şelaffî wezîrên çepê û yê rastê rûniştibûn. Peyayêñ wî jî dîlî û koletî li ber destêñ wî diçûn û dihatin...

-Ti wî dibînî? -Gotina merovekî bi yekî din re, li ber guhê Siwaro ket- qenc xiyala xwe bidê, tu dibê qey bûmek di nav çûkan de ye. Çilo bûn ji qertelan ditirse, wiha jî ew ji ronahiyê...

Siwaro ji van gotinê hustexwarekî ma matmayî.

-Hus... Ez her tişfî dibînim. Divê tu jibîr nekî, ku dîwar bi guhin.

-Merovê dudyâ li hevalê xwe wegerand.

Dîsa bêdengiyê xwe berda kesên civînê, Lewra vê carê Dêwê-qezim di guhê wezîrê milê rastê de kire piste-pist, paşî bi wezîrê milê çepê jî zîvirî û tiştek ji wî re jî got. Di vê rewşê de çavêñ bi awirêñ melûl û şelaffî, mîna ku li ber xêrekê bin, li ber destê Dêwê-qezim man çavpan û rawistiyayî. Di vê pêlê de wezîrê yekemîn da xwe û rabû ser xwe. Bi hawayê ku mehkêmê yan civînê veke, peyivî:

-Gelî xelkê! Bê guman hun ji tecrîba xwe dizanîn, çîma hun fro hâtine vira. Melikê me hun dawetî şîvdanîna xwe ya sersalê kiriye.

Wezîr gîhişt negîhişt gotina "melik" bêjê heyâ destik li hev ketin û bi yek dengî hustexwaran gotin: "Bijî melikê me, em fîdekarî wî ne!" vê rewşê pir dom nekir lewra wezîr axeftina xwe domand:

-Melik (çepiklêdan) ji we razîye, lewra hun xweş bi rola xwe rabûn û radibin. Melik (çepiklêdan) niha wê xebatêñ xwe yêñ salê li we belav bike. Wilo jî ewê we ceze bike.

Bi ışareta destê xwe, çend peya merovekî hustexwar anîn ber destê Dêwê-qezim, hemiya lê nerîn û xwestin serî û dawiya wî jî hev nasbîkin, lê nikarîbûn. Melik jî mîna ku hestiya bavêje ber kuçik, wilo wî jî xelata xwe avêt ser wîna.

Dîsa çepiklêdanê destpêkir. Di vê holê de wezîrê dudya rabû ser xwe û got:

-Niha jî wê melik (çepiklêdan) cezê xwe bide wî merovê ku riya melik (çepiklêdan) derketiye.

"Ecîb û xerîb, ma kes li vir heye ku ji riya melik derkeve?!" -Siwaro di nava xwe de got.

Kesê celad merovekî îşkencê ji rengê insana derketibû, bi dehf û pênan da ber xwe û li ber nigêñ Dêwê-qezim, li ser kabokan xiya kir. Destê wî kelemcekirîbû û bi zincîrê bi hustê wî hatîbû girêdan. Wî bi

her hawayî dixwest serê xwe rake, lê belê ji zîncîra nikarîbû serê xwe rake. Loma wî tenê çavêن xwe vekirin û li jor li ser xwe re li Dêw temâşekir. Heya jê hat xwîzka xwe da hev û bi hemû qeweta xwe tifî ser çavê Dêw kir û pire-pire çend gotinê xwe jî gotin.

Vî karî ruhnî di çavêن melik de nema û bi hêrs got:

-Çima we berî niha ev kesê ha bê serî nekir? -bi gotina xwe Dêw xwe cîndikî li erdê xist û emrê xwe da: Niha jî wî bê serî bikin.

Celad emrê melik bi kar anî û serê merovê "mutehim" hate jêkirin.

Wezîr dîsa peyivî:

-Melik (çepiklêdan) dibêje evê ceza ci kesê, ku ber xwe bide û bixwaze serê xwe rake.

Paşî mehkema hinek kesên din jî hate kirin. Siwaro her dixwest rabe û di ruyê melikê Dêw bipijiqe, li Xweşikê rê nedidayê. Wî bixwe nizanîbû çilo Xweşikê li tenişte rûnişt.

Paşî dora wezîrê aborî hat, wî jî ev axaftina ha bi qewm re kir:

-Gelî qewm! Melik (çepiklêdan) jî bo alfakriyê spasî we dike. Niha jî mîna her cav divê hun kommerdiya xwe pêş me bikin. roja îro melik (çepiklêdan) tenê zêr û peran dixwaze... helbet zêr ji hemû tiştî çêtire. Bi vî hawayî emê karibin rê li ber dijmin û emê karibin serê hinek çetan bipelçiqînin.

Vî wezîrî peyvîn xwe pir dirêj kir heyâ gaşa vê gotinê:

-Kî dixwaze navê wî yê pêşî be û bêşa xwe bide?

-Ez -Di ciyê cîde yekî ji dolemendan got û sed hezar danî ber melik.

Wezîr bi dengekî bilind ban kir:

-Sed hezar...

-Du sed hezar -dolemendekî din bi xwe bi dengekî bilind mîna ku li mazatê be got.

Dolemendê sisiya li pey hevalê xwe got:

-Sê sed hezar.

-Penc sed hezar û kîlok zêr -dolemendekî din bi poz bilindî li hevalen xwe zêdekir.

Hespê bi bask û kihêl bi simêن xwe ax kola û kire hîre-hîr. Bi vî hawayî doza şer ji Siwarê xwe kir.

Siwaro jî xwe negirt, heyâ jê hat tiferdê kir û bi dengekî bilind bang .

kir:

-Hun ci bê rûmetin û namus di serê we de tuneye -bi gotina xwe Si-waro mîna çikçikanekî xwe avêt ser hespê û wek tîrekî di nav xelkê û peyayên melik re rê ji xwe re vekir û berê xwe da çiya. Bi çûna xwe bang kir: Bidin pey min... Herin serê çiyan... -hêdî hêdî ew bi dur ket û li ber çavan windabû.

”Şer dest pê dike, paşî berdana gula dudyan.” -Behlûl hikmeta xwe got.

-Siwaro bigrin... Ser jêkin... bi darvekin -Dêwê-qezim emir da.

-Kesê wî sax an mirî bigre, wê xelatekê ji destê melik bigre -serokê polîs got.

-Ehmeqekî din xwe li çiya girt -malmezinê hustexwaran got.

-Dibe, ku çavên wî sor bibûn -axakî got.

-Ew nizane, ku mesela Kawa çîroke -yekî din got.

”Bizrê ji derve, wek zîwanê ye her ziyanê dighîne şînkaya dora xwe”. -Behlûl hikmetek din got.

-Min mebesta Behlûl fam nekir -yekî ji hustexwaran got.

-Siwaro ne ji me bû, -yekî bersîva hevalê xwe da.

-Her ez fam nakim.


Yê dudya bersîv nema da û ma bê deng.

Di vê tevlihevbûnê, Xweşikê li ser erşê melik sekinî û got:

-Min jê dixwest, ku darê xwe li ber xwe berde, lê her ber xwe dida û rûçikê xwe diparast. Diyar bû ew çibûye ji bo firê û tucarî nayê bas-kokirin... Eve kesê ku sed salan ez lê digeriyan. Erê ewe. Gelî qewmê min mizgîna min li we, min ew dît... Heger hat û bi serkeve û her û her wê bi serkeve, vêga ezê diya wî bim... Ezê dergistya wî bim... Ezê yarka wî bim û ezê bi giyan û canê xwe jire bim, lewra ez ji bo wî hatime ser ruyê dinê û ji niha û pêve wê bizrê xerîb nema karibe rehêن xwe di axa me de berde jê...

Paşî van gotinan Xweşikê bi dil û can keniya û henekê xwe bi Dêwê-qezim kir û bi hewa ket.





HUNERMENDEKİ KURD

Lala Abdah Ameen

Hunermendê Kurdê hêja û bî nav û deng Lala Abdah Ameen di 1947 da lî bajarê Silêmaniyê hatiye dinê. Di 1970 'î de Enstituya Hunerî ya Bexdadê temam kiriye. Di 1978 'an de jî diploma Akademiya Huneri ya Floransa - Italya girtiye. Her weha ew endamê Melbenda Hunermendê Fransa (Maison Des Artistes De France) û yê Akademiya Kurdî ya ji bo Zanist û Huner e.

Jî sala 1970 yi ta 1989 'an wî dî gelek pêşengeyan de tablo yên xwe raxistiye. Her wekî:

Pêşengeyên wî yên şexsi:


- 1970 - Bexdad, Galeriya Enstituya Huneri
- 1973 - Silêmanî,
- 1976 - Silêmanî,
- 1979 - Floransa, Galeriya " Arte Contemporanca " (la perla),
- 1980 - Carmignano, Palazzo Communale,
- 1981 - Fiesole-Floransa, Melbenda Kulturî,
- 1988 - Strasbourg(Fransa), Galeriya " Petit Pont ",
- 1988 - Strasbourg, Galeriya " A.G.F ",





Pêşangeyên wî yên kollektiv:

- 1970 - Bexdad, Galeriya Komela Hunermendêن Iraqê.
- 1972 - Silêmanî, Komela Hunerî ya Kurd,
- 1973 - Festivala Berlinê Rojava,
- 1974 - Bexdad, Festivala Hunera Kurdfî-Xelata Netewî,
- 1978 - Floransa,Melbenda Kulturi,
- 1978 - " Today's Figurative Art ",
- 1979 - Floransa,Galeriya Bruno Guigni-Festivala Newrozê,
- 1979 - " Campione Di Italia ", - Xelata zêrîn a Akademiya Italiya yê.
- 1982 - Dortmund-(Almanya), - Enstituya Kurdfî ya Parisê,
- 1987 - London,University Gallery, Kurdish Art,
- 1988 - Paris, Enstituya Kurdfî ya Parisê,
- 1989 - Strasbourg, Generale Assurance de la France.



Em nûsîney xiwarewe birîtiye le kurteyekî ew witare benirxey Dr.Jemal Nebez, ke le salî 1974 da ‘korî zaniyari Kurd’’ le-gel dû witarî dîda le şêwey kitêbêk da le jér nêwi ‘berkurtêki xermanî kurdnasî le Ewropa’’ bilawî kirdotewe.

Çarçira be pêwîstî zanî ke ew witare be çend beşêk bilaw bikatewe. Le jimare (3) sêyi Çarçira da beşî yekem ke pêwendî be ‘sedey nozdeyem’’ewe bû bilaw kirayewe. Lem jimareyeş da beşekanî dî ke taybetin be ‘‘sedey bîstem’’ be hevra pêşkêşî xiwêneranî kurdî dekeyin.

”Kurte mêtuyekî Kurdnasî le Elmaniya da”

beşî dûwem

Le salanî diway sedey raburdûwewe (mebest sedey nozdeyeme - K.A.), heta egate Cengî cîhanî yekem, çend zaneyekî nawdarî Elman wek: profîsor Oskerman û profîsor Fon Likok û profîsor Edward se-xaw û profîsor Awgust Pêterman û profîsor Martîn Hartman rûyan kirde Kurdistan. Emane paş gerane weyan, nek her tenya basî zor zanistane w be kelkiyan le ser ziman û edebiyatî kurdî bilaw kirdewe, belkû jimareyek destnûsî kurdî w ser be kurdîşyan le Kurdistan û roj-helaîî nawerast da kokirdewe w hênyewe bo Elmaniya. Hendê lew destnûsane êsta le Kurdistan nemawin, keçî le namexanekanî ”Berlin, Tubingen, Marburg” da çîng ekewin. Lem rûwewe emane xizmetêkî basî kultûrî gelî kurdiyan kirdûwe. Êsta lem namexananedâ (89) destnûsî kurdî hen, ke beşî zoryan honrawey dildarî w palewanêti w ayînîn. Têkstî em nûsrawane be şêwey Goranî w Kirmancî w Sulêmanîn û tenya (5) daneyan nebê ke têkisteke hemûy ya beşêkî be xetî aşûrî nûsrawnetewe”&1*. Ca bo ewey ser lê xiwênerewe têk neçê, emewê bilêm zorbey zorî em nûsrawana yekî le çend lapereyek têper nabê. Hendêkîşyan tenya yek laperen.

Edward Sexawîş yekêk bûwe lew zanayaney basî zor giringî lesér hendê nawçey Kurdistan nûsî wetewe, be taybetî le barey nawçekanî Dicle w Furat ewe&2*. Herweha lêdwânekî le barey geşî Borxart na-wêkewe bo Kurdistan bilaw kirdotewe&3*

Oskar man ke le salanî 1901-1903 w le 1906-1907 da bo lêkolînewey zimanewanî çuve bo Kurdistan û wilatî Fars û hendê şiwêni tir, paş geranewey zincîreyek nûsrawî be nawî lêkolînewey Kurdî-Farsiye we derkirdûwe&4*. Lem zincîreye da ewendey pêwendî be kurdnasiyewe hebê -hewlî dawe ke be pêy zanistî zimanewanî le şêwey Mukrî w Zaza w Lorî w Kırmaşanî w Kelhurî w Kirmancî rojhelat bikolêtewe. Bo em mebeste gelêk çîrok û dastañî wek Mem û Zîn û Nasir û malmañ û Zembîl Froş û beytî Erehman Paşay bebe w ...HTD. Kokirdotewe w em têxistaney be pîstî Erebî Latînî w wergêranî Elmaniye- we bilaw kirdotewe. Bêguman em kare bo katî xoy, wata hefta salêk lemewber -karêkî yekcar benir û berz bûwe-. Tenahet bo emroş kelkêkî yekcar gewrey heye, eger çî hendê lew karane pêdaçûnewe w rast kirdneweyan pêwişte. Oskar man hendê nûsrawî lepaşbecê mawe ke hêsta çap nekrawin. Emane wan le namexaney zanistgay Hombolt da le Berlinî rojhelat.

Elbêrt Fonlkokîş her le salî 1901 da legel líjneyekî lêkolînewe le şî-wêneware konekan "Archiologie" çûwe bo navçey Zencîrlî çend çîro-kekî kurdî legel jimareyek pendî pêşînan û qisey nesteqî nawçey Kirmancî û Zaza w baban w herweha nobarî Ehmadî Xanî w mewlid al-nebewî (ke be lay ewewe hî melay Batîye) kokirdotewe w le Dimeşîq em têkîstaney be hoy çend kurdî zanêkewe şîkirdotewe. Paş geranemey emaney be sê berg û be pîti erabî w latînî w tercemey Elmaniye-we bilaw kirdotewe. Tehanet têkste zaza - kanîşî be şêwey kirmancî wergêrawe. Becke leweş ferhengêkî biçûkî bo ew wişê kurdiyane drûst kirdûwe kele têkstekanda nawîyan hatûwe&5*.

Martin Hartman (1851-1918) iş basêkî mêtûyî topografi zor giringî lesér "Botan" nûsîwe&6* w herweha dîwanî melay Cezîrî bo yekemîn car be şêweyekî zor ciwan û nayab çap û bilaw kirdotewe&7*. Becge lemes basêkî lesér edebiyatî kurdî le salî 1898&8* da w her lesér heman bas le 1905 w 1906 w 1907&9* da nûsîwe le naw ew raporaneda ke Hartman lesér rojhelatî muslûmanî nûsîwe basêkî zorî kurdî kirdûwe&10*

Belam Martin Hartman her be tanya xerîkî bilaw kirdnewey kultûrî kurd nebûwe, belkû dostêkî dilsozî gelî kurdîş bûwe. Be corê le gelê Şîwêna da xoşewîstî xoy beramber em gele pîşan dawe. Tenanet le yekê le nûsrawekanî da ke be taybetkarîş le ser kur nûsrawe elê: "eger

min kurd wek neteweyek bîdeme qelem ke be aşanî kultûrî Ewrupayî wer egrê, diyare lam rûne ke ew h'ele em bîrûraye tûşî hendê berhelist ebê. Belam leber roşnayî ew deng û basaney ewane eygérnewe ke bem wilate da gerawin, piyaw etwanê bilê, le jêr pêstî xawî em gele da pir le bîrî qûl û hestî nasik şarawetewe. Gelêk belge heye ke (em kurdane) zirekiyekî xiwakirdî têkel be zû le shit geyiştin û bestraw be xû w rewiş-têkî repûrastî merdaneyan heye&11*.

(Hogomekes) Hugo Makas dû berhemî zor nayabî pêşkeş be xiwê-nerewekanî zimanî Elmanî kirdûwe. Yekêkiyan lêkolîneweyekî zanis-tanceye le barey zimanî kurdfiyewe leber roşnayî şêwey kurdî Diyarba-kir û şêwey yezdîyekan. Em berheme le 1900 da le şarî Haydilberg çapkirawe&12*. Ewî tirîsiyan çend têkstêkî kurdîye ke brîfîye le çîrok û dastan û pendî pêşinanî nawçey Mardin be şêwey kirmancî. Eme-yan le Lênîngrad le 1926 da çapkirawe&13*.

Maweyekî kem pêş cengî cîhanî yekem çend Elmanêk witariyan le-ser Kurdistan le barî Serncî supayî w stratîciyewe nûsîwe. Le mane Graf Vêstarip&14*, ke rîgakanî Kurdistan û Ermanistanî bas kirdû-we. Herweha Vîlhilm Baxman raportêkî lesor ew rîgayane nûsîwe ke ekewne nêwan Musl û Wan ewe, emeş leber roşnayî nexseyek ke be taybatî bo ew nawçeye kêşrawe&15*. Em base bo şerî cîhanî yekem kelkêkî supayî zorî bûwe.

Her lem maweye da çend basêkî stratêcî le barey hendê nawçey Kurdistanî êraqewe le layen Êvald Bahz ewe derçûwe&16*

Her em nûserê le barey xetî şemendeferî Baxdadewe namîlkeyekî derhînawê&17*, w le barî cugrafiyayî w stratîci supayıyewe basêkî Kurdistanî kirdûwe w basî hendê le hoze kurdekanî be xoyan û cil û berg û rewiş û xuyanewe kirdûwe. Eweşî lebîr neçûwe basî hendê le bizûtnewe rizgarî xiwazêkanî kurd bihênen. Em namîlkeye siyasetî ew-say dewletî Osmanî beramber be kurd û gele jêrdestekanî tirî turk exate berçaw.

Zanay zimanewanî benawbangî nemsâ w endamî korî zanistî şaha-ne le Viyena, profîsor Maksîmîyan Bîtner le salî 1913 da herdû kitêbe pîrozekey yezidîyekanî be kurdî w erebî w wergêranî Elmanîyewe bi-lawkirdotewe w lêkolîneweyekî zimanewaniyaney yekcar qûlî lesor

nûsîwin. Em tekstane giwaye katî xoy kurdêkî zîrek û wirya ke be dro xoy kirdûwe be yezîdî, le yeziyekanî dzîwe w froştûnî be zimanewanî ereb "Eb Enstans Marî El-kermelî". Kermelî em têkstaney bo ye-kem car le govarî "Anthropos"&18* da bilawkirdbowe w be lêdwanê-kewe be zimanî Ferensî. Betnerîş le govarî "Anthropos" ewe tekstekanî wergirtûwew gorîwnî be Elmanî w carêkî tir be lêkolîneweyekî zimanewanîyewe bilawî kirdûnetewe&19*. Bilawkirdnewey kitêbe pî-rozkanî yezîdîyekan şest salêk lemewber be zimanêkî kurdî rewanî ciwan, xizmetêkî gewreye bo kultûrî netewey kurd&20*

Ew berhemaney lepêşewe nêwan birdin rêgayan xoşkird bo hendê zanay tirî Elman, ke paş cengî cîhanî yekem, berhemî tir le pêşangay kurdewanîda bixene rû&21*. Yekek lewane ke zor şayîstey naw birdine Karl Hedank e. Hedank kelkêkî zorî lew kelepûre wergirtûwe ke Oskenman be céey hêştûwe. Becge lewes dostêkî nizîkî mêtjûnûs û kol-neder û têkoşerî xiwa lêxoşbûy kurd, damaw hûznî mukriyanîbûwe herweha hawrêy Dr. Kameran Badirxan bûwe w le karekanî da kelkî le herdûkiyan wergirtûwe. Le berhemekanî Hedank: pêdaçûneweyekî ew basaneye ke Oskerman leser şêwey zaza nûsîwnî&22*. Herweha basêkî zanistaney zorwird leser şêwey Botan û yezîdîyekan&23*. Emey diwayî leber roşnayî çend têkstêk kirdûwe ke be yarmatî Bedir-xan nûsîwnêtêwe. Hedank basêkî tirîşî leser şêwey goran bilawkirdotewe&24*.

Lêkolînewey zanakanî Elman her le barey zimanewanîyewe hebû-we, belku gelê layenî tirîşî girtoteweb Bo wêne:-

Dû Elman ke nawîyan Berliner û Burxard bûwe çûnête Kurdistan û gelêk kewçik û çego û qelembir û xişlî jinan û şî tirî le zîw drûstkra-wyan kokirdotewe w leser em pişesaziyey Kurdistan kitêbêkyan derkirdûwe&25*. Tilke nawêk be boney lêdwan le barey cil û bergî rojhelatîyewe basêkî cil û bergî kurdîşî kirdûwe&26*

zanayekî Elman ke nawî Koehler bûwe hewlî dawe leber roşnayî ew geştnameyey ke geştwerî turkî Osmanî Ewliya Çelebî le sedey (17)y ferhengî da kirdûyetî, basêkî şarî Bitlisî kurd bika&27*. &Koehler em berhemey xoy le şêwey doktornamekey da dawe be za-nistgay morix.

Zîk nawêk le salî 1929 da basêkî be boney bizûtnewey kurdewe le

Kurdistanî turkiya da be Elmanî nûşîwew daxiwaziyekanî kurdî xis-tote rû&28*.

kabrayek ke nawî "Artasches Abeghian" bûe w renge ermenî bûbê, le salî 1930 da witarêkî le barey jiyanî fîkrî kurdewe be Elmanî nûşîwe w le Govarî "Rojhelat: Der Orient" da bilawkirdotewe&29*.

Le katî şerî cîhanî dûwem da (1943), namîlkeyekî (96) lapereyî le şarî Potisdam be nawî " le kurdistan ewe berew malewe"(30). Le layen Otovîrner û Fon Hêntîg ewe derçû.

Ewey şayanî base maweyekî kem pêş şerî cîhanî dûwem û le mawey şerda, Elmaniya çawî brîbûwe newtekey kurdistan. Bo eme kewte pîlan danan û lêkolînewe le barey kurd û wilatekeyanewe, bo ewey kurdekan boxoy rakêşê w biyanka be gij Înglîzakan da ke dagîrkerî newtekey kurdistan bûn. Be cêhênanî em kare w pêwendî bestin be kurde-we spêrdrabû be efserêkî Elman ke nawî Gotfrîd Johanês Müller bû. Em Müllere le salî (1937) da namîlkeyekî be elmanî be nawî "Xo kutane naw kurdistanî daxiraw"ewe derkird (31). Le salî (1959) îşda, kitêbêkî be nawî " Le rojhelatî gir têberbû " da bilaw kirdewe(32). Müller lem nûsrâwey dûwemî da be dûr û dirêjî basî ewe egêrêtewe ke çon çend efserêkî elman legel kurdêkî hewlêrî ke nawî "Remzî" bûwe, be serokayetî ew, be frokeyekî supay elman çûnete kurdistan û xerîk bûn be diziyewe hoze kurdekan rêk bixin û haniyan biden dijî Înglîzakan, eweş bas ekat ke çon hemûyan le kurdistanî Êraq gîrawin û firê diraw-netewe. Em kabraye le kitêbî dûwemî da bem corey xiwarewe basî kurd ekat:

"Her kesê legel kurdêk, belam kurdêkî resen, helsûkewt bika, ew kese kurdî xoş ewê w wilatekeyanî xoş ewê. Wata kurdistanî xoş ewê, kurd hemû mirovî çaw geş û tûryan û hêz û wizeyekî şarawey bekar nehê-rawîyan heye"(33).

Ştik Fîkander ke profîsorêkî Swêdî ye basêkî be zimanî elmanî le barey cejnêkewe nûşîwe ke le kurdistan ekrê w le avêstay Zerdeşt da bas kirawe(34). Rojname nûsêkî Îslendeyî ke nawî Erlender Herdilsen e w le 1963 w 1965 da çûwe bo kurdistan û be zimanî îslendî kitêbêkî le barey kurdistanewe der kirdûwe, her em kitêbe be zimanî elmanî le Hamburg le salî 1966 da çap kira w bilaw kirayewe, belam emcare be nawî "Kurdistan ... wilatêk le şorşî da"(35).

Paş ewe Dr. Jemal Nebez, basî jimareyek lew rojnamenûsane dekat ke be wîjdanane le ser kurd û bizûtnewe azadîxwazekey le rojname coraw corekanî elmaniya da witariyan bilawkirdotewe w le televîzyon

û gelek sînemada filmyan leser kurdistan pîşan dawe. Diwa be diway ew Dr. Nebez pencey bo ew rojnamenûsaneş dirêj kirdûwe ke be xirape basî kurdiyan kirdûwe. Bo wêne DR. Nebez debêjê:

Çend profîsor û rojnamenûs û karbedestêkî elman hen ke wîjdaniyan mirdûwe w leber çend hoyekî zor dûr le zanistewe bûxtan û dro û delesey nahemwar le barey kurdewe bilaw ekenewe. Bo wêne profîsorêkî Entropologî ke nawî (Von Bickstedt) e, kitêbêkî be nawî “Turk û Kurd û Êranî le konewe ta êsta” le 1961 da derkirdûwe (36). Em kabraye le her layekewe w be her boneyekewe nawî kurdî hê nabê nûsîwyêti “Kurde cerdekn ”!!!.

Kabrayekî tir, Vogel nawêk ke le kin doktorî Fîzîke, legel çend kesêkî tir çûwe bo kurdistanî turkiya. Her çende mîwandarî kurdîş egêrêtewe, belam dîsanewe le witarekey da ke le barey ew geştewe nûsîwêti kurd be cerde edate qelem (37), ke sikirtêrî giştî “Yekêtî neteweyî xi-wêndkaranî kurd le Ewrûpa” namey bo nûsî w lêey pirsî, aya be rîşî ew rewaye ew droyane bo kurd helbestê? Le weramda witî: bibûrin min le Turkiya emar neyan bo gêramewe, egîna xo min kurdî nazan nim. Karbedestanî hikumet em qisaneyan bo kirdûm. Raste em kabraye kurdî nazanê, belam aya doktorêkî Fîzîk ebê ewende gewc bê biçê be qisey em û ew leber bore bikewête heleke sema?(38).

Kabrayekî tir ke nawî Hans Thema ye le witarêk da nûsîwe: “Çûme naw kurdekanewe, kurdekan cerde w rîgirin û herçî kilêsey ew nawe heye rûxanduyane w malî gawrekaniyan kawil kirdûwe”. Belam piyaw le witarekey nabêtewe ke hoy em boxtane tê egat. Çûnke Thema her lew witareda methêkî zorî “mîwandarî w nanbideyi” jandermey turk egêrêtewe le kurdistan da. Ewey şayanî base lêreda eweye ke dûj-minanî kurd zor westan le propagende kardin da dijî gelî kurd. Bo wêne le cêyekî wek ewrûpa da ke wilatî diyane, we dîayea deken ke giwaye kurd musûlmanî tengetîlken û ewe bo maweyekî zor kudiyan be “ermenî kûj” edaye qelem (40). Eme bo ewey bîrûray giştî ewrûpa le dijî kurd han biden. Çunke her ewane w hawtay ewanen ke le naw musûlmanekan da core dîayeyekî tir le dijî kurd eken, eweş eweye giwaye kurd zerdeşti w mecûsi w dûjminî ayînî İslamin. Le hemûy segir tir eweye nûser û bilawkerewey em beyt û balûrane (41) ewende nezan û nefamin, ayînî zerdeşti be ayînêkî agir perist edene qelem w şorşgêranî kele pîyawî kurdî wek ebû muslîmî Xorasanî w babekî xuremî(42), be agir perist û Fars edene qelem.

Emca em propalantane we nebê her le barey ayînewe bê, belku le meydanî siyasetî da herwaye. Bo wêne : le cêgeyekî wek elmaniyay rojawada, hewl edrê ke bizûtnewey kurdayetî be diro w buxtan be bizût-

neweyekî komonîstane bidrête qelem. Her lem bareyewe le dewaranî Qasim xoy Şorşî kurdî be desîsey elmaniyay rojawa w Emrika w Înglîz edaye qelem (43), rojnamey: “Wehr-Politische information” elmaniyay rojawa ke le şarî koeln der eçê le 26/1/1962 da nûsîbûy :“Yekêtî Sovêt piştgîrî pêşmergey kurd eka w be şew firokey Sovêtî çek û tîfaqî cengî eben bo nawçey kurdistanî êraq”. Ke çî her lew kate da rojnamey : Neues Deutschland zimanî halî “hîzbî Sosiyalistî yekgirtûy elmaniyay rojhelat” le 7/6/1962 da nûsî ke giwaye “likumetî elmaniyay rojawa meşîq bew kurde helatwane eka ke rayan kirdûwe bo elmaniya, bo ewey hikumetî Qasim biruxênin”.

Paş bestinî peymanî “Martî/1970 rojnamenûsêkî elmaniyay rojawa ke nawî Rolf W.Schloss ew le Îsrail ejî w le wêwe peyamnîrî radioy Barvarî yaye, zor besermane le witarêk da nûsîbûy ke giwaye “kurdekan komonîstin û bizûtnewekeyan be pencey Sovêt eçê berêwe w Barzanîş nokerêkî Sovêt e”(44). W gelêk buxtan û namaqûlî w dro w delesey tir ke be tûnd û tijî le katî xoy da weramim dawnetewe (45).

Legel emeşa etwanîn be hemû dilêkewe bilên ke dûjminanî gelî kurd le naw gelî elman da jimareyekî zor kemin û zorbey zorî ew elmanney kurd enasin û hewal û basî kurdîyan bîstûwe, niyazyan baş û pake beramber kurd û kurdistan. Êmes ebê ew heste başe roj be roj behêz tir bikayn.

Cige le Elmanekan Dr. Jemal Nebez kurtebasêkîşî derbarey xebatî kurdekan kirduve le Elmanîya le biwarî zanist û kurdayedî da. Lîre da nuser basî çend rûnakbîrêkî kurdî kirduve ke witariyan le govare Elmanî w Nemsawiyekanda le ser meseley kurd û kurdistan bilaw kirdotewe. Herweha pencey bo xebatî roşinbîrî “Komeley Xwêndkaranî Kurd”le Ewrupa dirêj kirduve w le govare kurdîyanî diwawe. Paş ewe ser kurtebasêkî komeley xwêndkaranî neteweyî kurd û debêje: “ Le 21 marî 1965 da Yekêtî neteweyî xwendkaramî kurd le Ewrupa” le layen nûserî witarekew e (mebest lêreda Dr. Jemal Nebez xoyefî - K.A.) be piştgîrî w hawkarî pêşmergey ciwanemerg û şehîdî kurdistan Letîf Alî w endaziyarî xawen Diplom B.Îbrahîm le şarî Monîx damezra” (46).

Yekêtî ke le Ewrupa nawî be “NUKS e” derkirduve, her le seretawe pêrewêkî karkirdinî bo xoy destnîşan kird bo ewey le ber roşnayî ewe amancî kurdnasînî xoy le barey ziman û edebiyat û siyasetewe bênette dî.

Paşan nûser çend berhemêkî le xebatî NUKSE xistote pêş çaw. Eme cige le komelêk karî zanistaney be nirxî xoy.

PERAWÊZEKAN:

1- Dr. kemal Fuad katî xoy em nûsrawaney girte lay xoy û kewte pişknîyan û le encam da basêkî be zimanî elmanî lesor nûsin be nawî "destnûsi kurdfî: Kurdische Hand Schriften" yewe, ke le salî 1970 da le şewey duktornamekey da pêşkeş be zanistgay Hombolî Berlînî rojhelaû kird. Em nûsrawey Dr. Kemal Fuad britîye le basêkî kûrtî (92) destnûsi kurdfî w seretayekî kûrt le barey ziman û edebiyatî kurdiyewe. Herweha kûrte mêtûyekî jîyanî zorbey nûser û honere nasrawekanî kurd le konewe ta êsta w le hemû nawçekanî Kurdistan da. Em kitêbe le layen "Franz Steiner Verlag" ewe le şarî "Wiesbaden" le 1970 da le çap dirawê.

Em berhemey kak Kemal Kelkêkî başî heye bo ew bêgananey eyanewê aşnayefî legel ziman û edebiyatî kurdfî da peyda biken. Belam yekêk lew rexnaney ke lem berheme bigirî, be lay minewe eweye ke nûserekey "Lor"î be kurd nedawete qelem. Diyare em bîrûraye le seretawê le Oskerman ewe dakewtûwe w her le wîşcwe gelêk le zimanewan û mêtûnûsekanî Ewrûpa w tenanet rojhelaûş, bê lêkolînewe w zehmet dane berxo, hatûnate ser ew bawere ke "Lor" kurd nebin. Be lay minewe lorekan kurdin û şewey lorî rasteqnîne şeweyekî kurdfî ye. Tenya ewe heye tasîrî zimanî Pehlewî (wata Farsî nawaerast) lesor zarewekanî şewey Lorî zortire wek le şewekanî tîrî kurdfî, ke emeş çend hoyekî mêtûyîn w siyasi heye w cêey baskirdînî êre niye. Bêcge leweş jimareyekî gelêk ziyatir le waney ke Lorî rasteqnîne be hele be Lor dedrêne qelem. Wata hendê hozî Fars zimanîş her be Lor da denrên. Emeye way le Oskerman kirdûwe, ke şarezâyîyekî tewawî nebûwe le şewekanî kurdfî da, serî lê bişewê w le encam da ser le xelkî tîrîş têk bidat. Katî xoy le Berlin em bâsem be kûrtî legel hawrêy xoşewistim kak Kemal Fuad xoy da kird. Hîwaşim waye le paşeroj dager destim perja bitwanim em base baştir şî bikemewe, çunke maweyek be wîrdî xerîkî lêkolînewey şewey Lorî bûm û şewey Lorim legel çend têkstîkî partî w pehlewî da barawird kirdûwe -J. Nebez.

- 2- Man, Oskar: Kurdish -persische for- schungen, Berlin, 1901-1907
- 3- Sachau, Eduard: Über die Reise Von Herrn burchardt nach Kurdistan, Berlin, 1896
- 4- Man, Oskar: Kurdish -persische for- shungen, Berlin, 1901-1907
- 5- Vonle Coeq, Albert: Kurdische texte, Berlin, 1903
- 6- Hartman, Martin: Bohtan, eine topografisch -historische studie in mitteilungen der vorderasiatischen Gesellschaft. Berlin, 1986, II, Heft 2, 1897, Heft I.
- 7- Hartman, Martin: Der kurdische divan 'des scheich Ahmed von geziret ibin Omar, genannt mela-i giziri, Berlin, 1904.
- 8- Hartman, Martin: Zur kurdischen literatur, in Wiener Zeitschrift Fuer die kunde des morgenlandes, Wien, 1898 Jahrg. 8, s. 102-112
- 9- Hartman, Martin: Zur Kurdischen Literatur, in Wiener Zietschrift Fuer die kunde des morgenlandes, Wien, 1905 Jahrg. 15, s. 322-330, auch 1906, Jahrg. 16, s. 35-46. auch 1907, Jahrg. 17, s. 76-80.
- 10- Hartman, Martin: Der islamische Orient, Berichte und forschungen, 3 Baende, Berlin, 1899-1910.

- 11- Hartman, Martin: Fuenf Vortrage ueber den islam, Leipzig, 1912.
- 12- Makas, Hugo: Kurdische studien Heidelberg, 1900.
- 13- Makas, Hugo: kurdsche texte im kurmandji dialekt aus der çegend von Mardin, Leningrad, 1926.
- 14- Von Westarp, Graf E.J.: Routenaufnahmen in Armenien und Kurdistan, in petermanns mitteilungen, 1913, Band LIX, s.297-300
- 15- Bachmann, Wilhelm: Bericht Zur Routenkarte Von Mosul nach wau petermanns mitteilungen, 1914
- 16- Banse, Ewald: Durch norden Mesopotamiens, petermanns mitteilungen, LVII, I, s. 119 und 172, Gotha, 1911.
- 17- Banse, Ewald: Auf den spuren den Bagh dadbahn, weimar, 1913.
- 18- Anthropos: govarêkî cîhanîye bo gelan nasî w zimannasî. Witarekey Kermeliş bem coreye:-
- Anastase Marie, O. Carm: La de couverte recente des deux Lives sacras des yezidis, Anthropos, t. vi, nr.1, januer -fevruer 1911, p.1. **.
- 19- Bittner Maximilian: die heiligen Buecher der yeziden oder Teufelsaufbeter (Kurdisch und arabisch) Wien, 1913.
- 20- Hîwam waye le helêkî tir da tewawî têkstî herdû kitêbe pîrozeke bilaw bikemewe be lêkolînewewe. J. Nebez-
- 21- Ke elêm zanay tirî Elman, mebestim lewe niye bilêm zanakanî Ewrûpa w şîwênanî tirî cîhan kelkiyan leberhemî Elmanekan wernegirtûwe. Emem wit, çûnke baseke man be taybetî lesor nawçey Elmanekane. tenanet zanay zimanewanî benawbangî rûsî Mar kelkî le zanistî Elmanekan wergirtûwe w xoşî be zimanî Elmanî witarî lesor bineçew reçelekî gelanî qefqas nûsiwe bo wêne: (Marr, N. J: Des Japhetische kaukasus, Leipzig, 1923). Ewey şayanî base eweye zimanewanî rûsî Mar lew bawereda bûwe ke kurdekan bineretekî jafetiyan heye. Tamaşay eme bike:-
- Nikitine Basil: Les kurdes Etude Sociologique et historique, Paris, 1956, pp. 12-16.
- 22- Hadank, Karl: Mundarten Der zaza, Berlin, 1932
- 23- Hadank, Karl: boti und Ezadi, berlin, 1938.
- 24- Hadank, Karl: Mundarten der Guzgû, Berlin, 1930
- 25- Berlin, R. und Borchardt, P.: Silber- schmiedearbeiten aus Kurdistan, Berlin, 1922.
- 26- Tilke, M.: Orientalische kostueme in schnitt und farbe. Berlin, 1923.
- 27- Koehler, W.: Die kurden stad Bitlis, nach dem tuerkischen reiswerk des Ewliya Tschelebi, Munchen, 1926.
- 28- Sick, J.H.: Karen Jeffe: im kampf um ein volk in vot, Stuttgart, 1929.
- 29- Abeghian, Artasches: Aus dem Geistesleben der Kurden, in der Orien
- 30- Von Hentig, wernerotto: Heimritt, durch kurdistan, potsdam, 1943.
- 31- Mueller, Gottfried Johannes: Einbruch ins vorschlossene kurdistan, Reutlingen, 1937.
- 32- Mueller, Gottfried Johannes: im bremenden Orient, Stuttgart, 1959.

- 33- Ibid, S.109.
- 34- Wikander, Stig: Ein Fest bei den kurden und in Avesta, in orientalia suecana, vol. ix (1960), Uppsala, 1961, S.7-10.
- 35- Haradsson, Erlundur: Land im Aufstand... kurdistan, Hamburg, 1966.
- 36- Von Bickstedt, Egon, Freiherr: Turken,Kurden und Iranier Seit dem Altertum, probleme eine Anthropologischen reise, Stuttgart, 1961.
- 37- Vogel: Sueddeutsche Zeitung.
- 38- Wêney ew namane wan le arşîvî “ Yekêtî neteweyî xiwêndkaranî kurd le ewrupa ” da.
- 39- Thema Hans : Wie Wild ist kurdistan, in publik, Nr.5, Frankfurt, 30-1 -1970,S.27
- 40- KURD û Ermenî ke dû gelî drawsêy yekin, be drêjayî mêjû, birayane le tenîş ye-kewe w le naw yektir da jîyawin. Tenanet bawkî edebiyatî ermanî nêwî “Aboviyan” elê : “Kurd siwarçakî rojhelatin be hemû manay wiş”. Belam siyasetî dagîrkerekane w împiryalistaney dewletî Osmanî w dewletî Rûsiyay qeyserî karêkî way kird ke em dû gele biraye pêş cengî cîhanî yekem, naxoşî bikewête beynîyanewe w biçin be gjî yektir da. Belam em nexoşîye zor drêjey nekêşa, herçende be ziyanêkî zorî herdûla te-waw bû, ewe bû paş cengî cîhanî yekem kurd û ermenî dîsanewe destiyan kirdewe mi-lî yek û dûjminanî rasteqîney xoyan nasîyewe w, lem maweye da gelêk le nûseranî ermenî wek Arşak Safrestiyan û bêcge le ermenî wek Lazerêvî rûs, le nûsînekaniyan da ew rastîyeyan xiste pêş çaw ke kurd le kûştarî ermeniyekan da gunahî nîye w obalî ew xwênrêjîye be gerdinî Turke Osmaniyekane.
- Le hawînî salî 1971 da nûserî em witare le layen yaney ermeniyekanewe le Berlin bang kira bo ewey witarêk lesor kurdistan bixwênenetew. Jimareyekî zor le bira ermeniyekanman û le naw ewaneda hendêkî xelkî ermanistani Sovêtiş amade bûn, bêcge le elman û xelkî tir. Witareke le layen: “ Yekêtî neteweyî xwêndkaranî kurdewe le ewrûpa ” w “ Yaney ermeniyewe bîra be rîwe. Le encamda bû be xopêşandanêkî gew-re bo birayetî kurd û ermen.
- Hemû kurdperwerêk pêwîste le serî, roj le diway roj birayetî w hewkarî kurd û ermenî w aşûrî be hêz tir bikat. Çunke em hawkarî w birayetî ye bo çakey her sê laye. (J.Nebez).
- 41- Bo wêne temasay namîlkey “ Maza Fî Şîmal al-Îraq ” û mehîn al-hécîlî w namîlkey “al-Şîhûbiye hîdu al-ereb al-ewel”, Bexda, 1972 bike.
- 42- Le derfetêk da witarêkî gewre lesor şoreşgêrî sosialistî netewe perwerî kurd “Babekî Xuremî” ensûsim.-J.Nebez.
- 43- Temasay rojnamey “al-ahid al-cedîd”, jimare, 464, salî-3, Bexda, 2/7/1962 bike. Herweha rojnamey jimare, 510, Bexda, 2718/1962. Herweha rojnamey “al-sewre”, jimare, 919, Bexda, 14/2/1962. Her heman rojname, jimare, 1014, Bexda, 7/10/1962.
- 44-Schloss, Rolf W.Ein Neuer Traum Vom kurdenstaat in puplik, Nr.12. Frankfurt,
- 45- Temasay kitêbî “kurdistan û şoreşkey” bike. Lapere, 15-16, ke be elmanî le layen Jemal Nebez ewe nûsrawetewe w le 1972 le Çap dirawé.
- 46- Nawî yekêtî be îngîzî :- (National - Union of the kurdish students in Europa).

له ناو له پیا پرواند :

(مهشی ثُمَّ يَهْ كَانَهْ نَهْ گَرِيْسَهْ سَمْوِيْشْ بَكْلَيْتْ ؟) ٠

له گهـل وـهـزـاقـى يـهـكـانـهـكـهـداـ چـاوـىـ ٿـمـيـشـ سـوـورـپـاـ ،ـ هـهـسـتـاـيـهـ
سـهـرـيـيـ ،ـ چـاوـىـ لـهـ دـيـمـهـ نـهـ كـهـ نـهـ تـرـوـ كـانـدـ ،ـ لـهـ گـهـلـ بـزـاـوـيـيـكـىـ يـهـكـانـهـداـ
لـهـشـ وـهـرـوـونـيـ ٿـمـيـشـ هـهـلـدـهـ چـوـوـ ،ـ بـهـلـامـ مـرـقـيـنـكـىـ بـيـ چـهـكـ بـهـرـاـنـهـرـ
پـهـوهـ بـهـرـاـزـيـكـ ٿـهـبـيـتـ چـيـبـكـاتـ ؟) ٠

سـمـوـ بـوـوـهـ دـيـوـارـيـيـكـىـ خـوـگـرـوـ نـهـيـ وـيـسـتـ بـلـهـرـزـيـتـ ،ـ بـهـرـاـنـهـرـ
يهـكـانـهـكـهـ وـهـسـتـاـ ،ـ ٿـهـيـ زـانـيـ لـهـ پـوـوـيـ مـرـدـيـيـكـىـ پـاـسـتـهـقـيـهـداـ وـهـسـتـاـوـهـ ،ـ
بـهـلـامـ زـوـرـ جـارـيـشـ مـهـرـگـ لـهـوـانـهـ دـهـتـرـسـيـتـ كـهـ دـهـستـ لـهـ گـهـرـدـنـيـانـ
دهـثـالـيـيـتـ ٠

سـمـوـ بـهـسـهـرـ شـفـرـهـيـ يـهـكـانـهـكـهـوـهـ هـهـلـسـوـورـپـاـ ،ـ بـوـوـهـ دـهـفـيـ دـهـستـ
دـهـرـوـيـشـ ،ـ پـاشـانـ يـهـرـهـوـدـواـ هـلـيـداـوـ هـاـتـهـوـهـ سـهـرـىـ ،ـ لـمـؤـزـىـ لـيـداـ ،ـ
كـهـ لـهـ مـرـدـنـيـ دـلـيـناـ بـوـوـ پـاـشـهـوـپـاـشـ گـهـرـايـهـوـهـ ،ـ هـاـتـهـوـهـ نـاـوـرـهـوـهـ كـهـ ،ـ
پـوـوـهـپـوـوـيـ گـوـنـدـهـ كـهـ پـيـزـيـانـ بـهـسـتـ ،ـ وـهـكـ چـاوـىـ چـاوـىـ پـهـلـامـرـيـيـكـىـ قـرـ
بنـ ٠

پـيـرـوـتـ پـيـنـگـايـ نـاـمـالـانـيـ لـهـبـهـرـگـرـتـهـوـهـ ،ـ هـمـوـالـيـ سـمـوـوـ تـرسـىـ
هـيـرـشـىـ گـيـانـدـ ،ـ بـهـيـتـهـ كـانـيـ هـمـمـوـ لـهـيـادـ بـوـوـ ،ـ لـهـ بـهـرـ هـهـرـ مـاـلـيـكـاـ دـهـمـسـتـاـ
بـهـ ٹـاوـازـهـ بـهـسـوـزـهـ كـهـيـ سـمـوـوـهـ ٿـهـيـ وـوـتـنـهـوـهـ ،ـ تـاـ بـهـيـتـهـ كـانـ بـوـونـهـ
پـيـشـوـلـهـيـ بـهـدوـاـيـ ڦـهـشـاـيـداـ وـيـلـ وـ بـهـ گـوـيـسـوـانـهـ درـهـخـتـىـ مـاـلـهـ كـانـهـوـهـ
نيـشـتـهـوـهـ ،ـ نـاـوـچـهـ كـهـ پـرـبـوـ لـهـ بـهـيـتـيـ سـمـوـ لـهـ هـمـمـوـ چـهـمـبـهـرـيـكـداـ
بـهـسـهـرـ زـمانـهـوـهـ بـوـونـ ٠

تـيـسـتـاـ ٿـهـوـ بـهـيـتـهـ بـوـونـهـهـ دـرـهـخـتـىـ بـهـرـدارـوـ لـهـ گـشتـ مـاـلـيـكـداـ
پـوـاـونـ ٠



وەک لاشەی مردوو بەسەر زەویە کەدا پا خست ، سەرچاوه کانی وا
 تىكدا لىوی خنکاويان بىچ تەپ نەدە کرا ، هەر گىاندارىنى دەھاتەپى ،
 پەمى شفرەی لە سك و پشتى دەچەقاندو ھەرسەت مەرگى بىچ دىنا .
 دەنگى سمو ھىتايە وە سەرخۆي .

ئورى برااله . -

دەردىك لە ھۆزى مە کەتىيە
 نە كەس بىستىيە نە كەس دىتىيە
 شۆپە سواران دەبەنە بەر جەلابىن
 دلى كىزان دەكەن كەبابىن
 زنان كە وتۈونە تە چەمبىرە
 كەلەمېتىردىان لە داوهەتنى مەرگى دانو
 ئەوه يش ماوه لەسەر سەفەرە .

پىرۇت بە خۆي ووت :

(كات بۆتە چەققۇيە كى تىز و گۆشتى لەشم دادەھىتىت ،
 گەرداويىكىم تەنيا تەننۇرە بۆ خۆم دەكەم ، پۇوبارىكىم كەنارى خۆم
 ئەدەمە بەر و تام لە شەپۇلە شىتە كام و مەرە گرم . چاوه پروانى كۆتىكى
 گەلىك قورسەو لەئەستۆم كراوه ، ئەيتىت گەرروويەك ئەم بىچ دەنگىيە
 سەر بېرىت) .

سەرى گرتە ناودەستى و بەرەو پىچەشىتە كە پرووى وەرگىرماه
 چاوه کانى بۇونە تىرىنە كى تىز و بەدىيمەتىكدا چەقىن . پەوه بەرازىتىك
 وەك لەشكىزىنى كى پىنك خراو ، بەپاڭ يە كداو بەرەولاي سمو مەليان دەنە ،
 بىچەنگى دېنە يە كى سامانلاك بۇو ، گىشت ناوجە كەي داگرتبىسو ،
 يە كانە يەك لەپىشىانەوە ملى خووس كردو بۇوە فيشە كىكى تازە
 دەرچوو . سەرى پىرۇت دارستىنى رق و گپ بۇو ، تا دەھات زىيارى
 دەسۋوتا ، چاوه كانى كرانەوە ، كاس بۇو ، ئەت ووت چياكەت
 بەسەريدا داباراندۇوە ، پەنچە كانى لە زەویە كە گىر كردو خۆلە كەي

(له وينه يشدا ٿه توانيت ياري به لهنئي مرُوف بکهيت ، دهستي
لئي بکهيت هوه ، چاوي هـ ڪوٽـ ٽـ ٽـ ، بـ زـ مـارـ بهـ تـهـ وـ ٽـ ٽـ ٽـ بـ ڪـوـ تـيـتـ . بهـ لـامـ
ناـوانـيـتـ مـيـشـكـيـ لـاـبـدـرـيـتـ) .

— ئهـ رـىـ بـ رـالـهـ . . .

ئهـ وـ هـ سـاـقـيـ دـهـ بـهـ رـاـزـيـكـيـ لـهـ ئـيـمـهـ بـوـتـهـ مـيـوـانـهـ
لـيـمـانـ دـهـ دـهـ شـفـرـهـ ، دـهـ دـخـونـ چـيـ خـلـهـ وـ خـهـ رـهـ مـانـهـ
دهـ بـراـيـنـهـ يـيـنهـ وـهـ هـنـزـ قـيـ ڦـيـ
باـ پـيـتكـهـ وـهـ بـيـكـهـ يـيـنهـ رـايـهـ لـهـ گـهـ ڦـلـ تـهـ گـيـرـانـهـ .

X X X

ئـهـ وـ شـوـقـ هـهـ ٽـيـدـهـ كـرـدـهـ دـيـزـنـهـ بـارـانـيـ
تـيـكـ وـهـ دـهـ بـوـونـ بـاـرـيـزـهـ لـهـ گـهـ ڦـلـ زـرـيـانـيـ
دهـ يـانـدـاـ لـهـ چـاـوـيـ نـيـچـيـرـيـ لـهـ گـهـ پـوـوـيـ شـوـانـيـ
رـاـوـچـيـ بـهـ ڪـاـوـخـوـ دـهـستـيـ تـهـنـگـيـ وـمـدـيـنـاـ
مـوـلـهـيـ دـهـ دـاـ لـهـ سـيـنـگـيـ نـيـچـيـرـيـ
خـوـيـنـ دـهـ ڦـايـهـ سـهـرـ بـهـ فـرـيـ كـوـيـسـتـانـيـ .

پـيـلوـهـ خـوـلـاـوـيـهـ كـانـيـ پـيـرـوـتـ ، گـلـاـيـ دـرـهـ خـتـيـ بـهـ هـارـ بـوـونـ وـ
چـهـ تـرـيـانـ بـهـ سـهـرـ لـهـ شـهـ لـالـهـ كـهـيـ سـمـؤـداـ كـرـدـبـوـ ، بـهـ يـيـنهـ كـانـ وـهـ كـهـ
ئـهـ سـيـتـكـيـ سـهـرـهـ لـلـگـرـتـوـ ٿـهـمـيـانـ بـهـنـاوـ شـهـمـلـ وـ تـوـونـاـوـتـوـونـهـ كـانـدـاـ
پـادـهـ پـيـچـاـ . بـيـرـيـ بـوـوـ گـهـرـدـاـوـيـكـيـ مـهـزـنـ ، چـيلـكـهـ كـهـيـ دـهـستـيـ
خـستـهـوـ گـهـپـ . وـيـسـهـيـ يـهـ كـانـهـ يـهـ كـيـشـاـ . چـوارـپـهـلـيـ پـيـتوـوـ ،
شـفـرـهـ يـهـ كـيـ تـيـزوـ تـوـكـمـهـ . چـاـوـيـ پـيـرـوـتـ بـوـوـ ٿـاـوـيـنـهـ تـهـمـلـيـ نـيـشـتـوـوـ ،
لـهـ گـهـ ڦـلـ هـمـوـ جـوـوـلـهـ يـهـ كـيـ چـيلـكـهـ كـهـداـ وـيـنـهـ كـهـيـشـ دـهـبـزـوـوتـ ، تـاـ
لـهـشـهـ كـهـ تـهـواـوـبـوـوـ ، ٿـهـوـسـاـكـهـوـتـهـ خـوـيـ ، كـلـكـهـ كـورـتـهـ كـهـيـ بـهـ
نـاـولـنـگـيـهـوـ قـرـسانـدـ ، وـهـ كـهـ هـارـ كـهـوـتـهـ كـيـلـانـيـ ٿـهـنـاوـهـ ، كـهـ شـفـرـهـيـ لـهـ
زـهـوـيـهـ كـهـ گـيـرـ دـهـ كـرـدـ بـهـنـدـازـهـيـ گـاسـنـ كـيـلـيـگـيـ لـئـيـ هـهـلـداـشتـاـ ،
هـيـرـشـيـ بـرـدـ ، بـزـوـيـتـيـ كـرـدـ ، وـيـرـانـهـ ، دـرـهـ خـتـهـ تـهـپـ گـلـاـوـ ٿـهـسـتـوـوـرـهـ كـانـيـ

دەلم پاناوەستى لە بەرئەوئى غەمەن لە بەر ئەھى ئازىنى *
 ئەھى چەند سالە تارىكەشەوە لە منى خانە و ئىرانى .
 هەمۆودەمەن ، ھەواڭى بۇ منى مەل بە كۈيىن دېنن لە بارەگاي
 پەشى سوتانى
 دەلىن بەرىتىوھ يە ۰۰۰ قرانى

سەق جىڭەرەيە كى دا گىرسانىد ، بەدمەم ھەلمىزىنى دوو كەنە
 خەستە كەۋە ، دوور بەدوور چاوى زىيات لە پىرۇت بېرىمەوە ، دەريا
 مەزىنە كەمى سەردى پىرۇت لە بەردەميا كەوتە شەپۇلدان ، فراواتىر
 بۇو ، دەمى ويست ھەمۆ جەھىان باته بەرۋە شوينەوارى تىا نەھىلىت ،
 واى ھەستە كەردى خۇيىشى بەشىنگە لەو دەريايە ، كە شەپۇلە كان
 ھۇر دەبنەوە ئەميش كېپ دەبىت *

پىرۇت پەنجە ھەلىنگەرە كانى لە ئەذنۇي كردىوە ، چوارمشىنى
 دانىشت ، بە خۇى ووت :

(لە جىھانىتكى وا ئابورە ئاڭلۇزدا ، تەنبا چەند كەسىت دەبنە
 ھاودەمى يەكترى ، ئەمى بۇ باران دادە كانە سەر كىلگەمى ووشكۇ ،
 بۇ كليل گۈز بە سنگى قىلمەوە دەنتىت ؟ تەنبا پازو نيازە بتوانىت
 مەرۆف يېڭەوە جوش بىدات ، يىستاوا لمىشۇنەدا ھەمۆ دىنە لە سەمۇدا
 دەبىن) *

پىرۇت چىلگەيە كى لەناو پەنجە كانى گىرت و ، لەسەر خۇلە كەنى
 يېشى چەند ھېلىنگى كىشا ، ھېلىنە كان بۇونە وىنەى مەرقۇنىكى تېڭىشىكاو ،
 تا چاوى بۇ دە كەردى شوينەوارى لووتى نەئەما ، كە دەمى ويست پەنجەي
 بۇ جىبا كانەوە ، دەستە كانى كۆل دەردەچۈون ، تەنبا سەردى وىنە كەنى
 بە ساغى بەدەستەوە هات :

* ئەھى تاكە دېنرە لە كېتىبىي - تحفە مظفرىيە - وەرگىرەوە

کانی چاوه کانی بته قینیت ، تارمایه ک هستی پاگرت ، لهناو گابه ردو
دره خته قهد ٹمستوره کانه وه بدره و خوار ٹههات ، تمزووی شادی
هموو لهشی داگرت ، به خوی ووت :

(جاران ۰۰۰ لهرزینی چایه ک سه ری پی هله ده بیریم ، که
بی دهسته لاتی بسوو کوت و که و ته گرد نم ، له پوونا کی
گوئه سیتره یه کدا گرنگی خور ده بینم)

تارمایه که ناشک اتر بسو ، تا له بناره وه نزیک ده که و تمهو ، دلی
تم زیاتر ده لهرزی . هستی شادیه که مه زن تر ده بسو ، به
پویشته خیرا که يدا زوو ناسیه وه ، ٹمه وی هاته پیش چاو چون یستا
سه ختی و دووری پینگا ، ٹاره قمه خستو ته سه ری پیسته پرهش
دا گهراوه که وی و به ناو شانیدا هاتو ته خواری ، په نگه سه رسه خنانه
هاتنی شهو و پوژی ، پیستی پیچی لهناو ییلاوه کانیدا دایلخاندیت ،
به لام هه رچوئیک بیت ، تا به ره و پیشتر دههات ٹهم زیاتر خوشی له
پرووی ده پژا .

(کنی وک من به سمو ٹاشنایه ! تمبا باران به خمه می گه لای
گرد گر توو ده زانیت ، بؤیه به خوپ داده کاته سه ری)

که له دووره وه سمو ٹمه می بینی و مسنا ، پاشان په پیه سه ری
ناشه بردیک و بسوو که له کیویه کی ماندوو ، بسده وری خویدا
هه لیپوانی ، هه ناسیه یه کی قوولی هه لکیشاو دانیشت . ٹهی زانی
پیروت چاوه پروانیه تی ، ٹهی ویت هه والیکی نویی بیچ بگه یه قیت ،
ویستی هدر لم دووره وه بیتنه شه مالی کویستان و لهشی گه رمی
میشکی جه نجالی بمحسینیت وه . پرووی له پیروت کرد ، بسوو کمومی
جوونه کوزراو ، دنیای کپ و ده روونی ٹالوزی ٹهوى هه زانده وه :

بهیلی سمو

ر. بیگمر

چاوه گیزه کانی به پرووی دیمه نیکووه نهنه گیرسانه ووه ، هردوو
دهستی بهم لاو نهولای پشتینه شل و شاوه که یهوه گیر کر دبوو سه رپو
ملی دهنا ، چالو چوئی رینگا خولاویه که ثامیزیان بو هنگاوه
سسته کانی نه گر تدووه ، نهیان دایه دهست له ترو نووج دان ، سه روی
شارینکی گدوره بwoo ، به سه ر له شه شه که ته که یهوه تا نه هات قورستر
نه ببوو ، لیکدانه ووه کانی وه ک پوره دی هنگ یتکدا ده هان و ده چوون
له بدر چاویا پیواره کان گه لای ددم په شه با یه کی سه خت بونو و به
هموو لا یه کدا گیزیان ده خوارد .

که گه یشته نه دیوی گونده که ، به میزاریه و خوی به
زه ویه که دا کیشا خوله سو و که له که بوده تهپ و نمی پایزو به بالایسا
هه لزنا ، برقو پیلوی دا گرت ، به دهسته سپه که که ماره قهی نساو
سنگ و سه رو ملی سپری ، نه زنؤی هه لاؤ دهستی به دهورا هه لینکا .
چاوه بپریه چیا کهی بدرابه ری ، وه ک پاوجیده بدوای نیچیری
بریندارا ویل بیت ، په وه زو ته لانه کانی پشکنی ، که زیان ر لی یان
پاما ، کاروانی خه میکی خست له ههواری ده رونیا لا یدا ، ویستی

جوره ئيد ياله ده کات . ئەممەش تا راده يەك دەگونجى لە گەل پللىەتى
 ژيانى كۆمەلگاي كوردهوارى لە قۇناغى گویزىانمۇ لە دەرەبەگايەتى بىو
 سەرمایەدارى . ئەم دياردەيەش دياردەيەكى مەوزۇمى يە ، لە بارودو خى
 مىزۇوي خویدا ، كە كۆمەلگاي مروقايەتى بە گشتى و كۆمەلگاي
 كوردهوارى كە لە قۇناغىكى نزم بۇ قۇناغىكى بەرز تر ھەنگاۋ دەنى جا
 ج لە شىوهى ژيانى ئابوورى و ج لە بىرى كۆمەلايمىدا .
 بى گومان گەھەرى ناكۆكى لە داھينانى ھونەريدا ، ئاوىنەتى ئەمۇ
 بارو دوخىيە كە ژيان سپاندو يەتى بە سەر كۆمەل دا . لىيىن لەمۇ
 و تارەتى لە سەرتولىستۇرى كە لە ژىر ناوى " تولىستۇرى ئاوىنەتى شۇرسى
 رووسى " دا نۇوسىيە : ئەمۇ ناكۆكىيە لە رايەكانى تولىستۇرى بەر چاوا
 دەكمۇي ، ناكىرى بمو پىوانە (مقياس) ھەل بىسەنگىرېت ، كە ئىستىا
 بىزۇتنەمەرى كەركاران و سۈسىيالىزىم تىيىدايە ، / ھەر چەندە ئەمۇ جىرە
 ھەل سەزگاندە پىوپىستە / ، بە لام كافى نىيە ، بەلگو پىوپىستە لەمۇ
 روانگەيەوە تەماشا بىكىرىت كە دەرىپىنى بىزارىيە بەرامبەر بە پەلامارو
 هېرىشى سەرمایەدارى " ٤
 بى گومان " نازدار " ئاوىنەتى ژيانى ساكارى گوندو چيا كانى
 كوردىستانە . بە گوپىرەتى كاتى مىزۇوي خوى و ئەددەبى كوردى نۇوسىيەنەكى
 گران بە ھايە .

سەرچاوهكان

گۇفارى " روناكى " ھەمولىر ۱۹۳۶

۱- روناكى ز ۰ ۲ ، ۱۹۳۶

۲- ھەمان سەرچاوه

۳- ھەمان سەرچاوه

۴- حسین عارف - چىروكى ھونەرى لە ئەددەبى كوردى ، بەغدا

۱۹۷۷ ، ۵ ۰ ۴۷

۵- چوارچرا ، ژ ۰ ۲ ، ۱۹۸۶ ، ل - ۲۱

۶- ۋ . ئ . لىيىن - دەرىبارەتى ئەددەب - مۆسکو ۱۹۷۰ ، ل ۰ ۱۰۵

کاره ساتانه دوو باره نهبنمه - به لام لمبهر ئوموهی " رومانه " که تمواو
نهبووه ئيمه نازانين نووسمر چونىكتايي پى هيئاوه .

نووسمر هەمو روودناوه کاره ساتەكەي بە سوزىكى رومانسييەوە نووسسييەوە -
تەمەوە جار جارەش دىيمەنلىقى وائى تى ھەلکىشاوه كە پىكەننەن بە مروف دەينى .

لەم " رومانه " دا ميرزەينەدەن نەمەنەي تراديسونى باوكايهتى و
دىسۈزى نېيشان دەدات ، كە چۈن ھەر دەم لە خەمى خىلەكەي دا دەزى
يا خۇد دېنۇ و نازدار كە سەركەرەي گەنچەكانى گوندن تاج رادەيەك
بىر لە ئاسايىشى گۈندەكەيان دەكەنەوە ۰۰۰ نازدار و نازەننەن دايىكى
وەك نەمەنەي ئافرەتى لى ھاتووى كورد نېيشان دراوه ، كە نەك تەننیا ژنى
مالەون ، بەلکو بەشدارى لە ژياني كۆمەلايەتى و بەرگرىشدا دەكەن .
نووسمر شارەزايى خۆى سەلماندوھ لە زانىنى بىنچىنەي كۆمەلايەتى
كۆمەلگای كوردەوارى ۰۰ چۈن كور لە باوك فېرى سەنەتكار و كارگىرى
و لاۋ چاكى دەبى و كچىش لە دايىكى ، ئەزمۇون و تراديسونى پېشىنان
راچاۋ دەكىرى لە لايەنەممۇوانەوە ، بە تايىبەتى لە رۆزى تەنگاواھدا .

نووسمر لە " نازدار " دا تراديسونى چاكى گۈندى پەروەردە دەكا بە
لە ناو چونى ئەپەنەنديھ لە شارەكاندا / لە نىيۇ روناكبيران / چونكە
بە بىرۇ راي نووسمر پېۋەندى خزمائىيەتى و خىزانى لە نىيۇ شار پىچراوه .
بويش بانگماوازى خويىنەر دەكەت بگەرىتەمە سەر ئۇسولى باو باپىران .
بى گومان محمدە عەلى كوردى دەرى دەخا كە لە سروشتى ئەپەنەن
نەگەيىشتوھ كە لە شار زووتى روودەدات ، ئەمۇش بەندە و بەستراوه بە
پېشكەمەتنى ئاماراى بەرھەم هيئان و پېشگەنەتنى لە گەل ئەپەنەنديھ
نۇي يەي سەرى ھەلداوه . لە شاردا پېۋەندى قۇناغى باوكايهتى زووتىر
لە ناو دەچى و پەرسىيىسى لە دايىك بۇونى پېۋەندى سەرمایەدارى شوينى
دەگەرىتەمە . بى گومان لە گەل لە دايىك بۇونى چىنييکى نۇي لە
كۆمەلگا تى گەيىشتنى (مفہومى) نۇي پەيدا دەبى كە خۆى دەسپىرىتە
سەر كۆمەل، بە لام ئەپەرسىيە كاتىكى زورتر دەخايىمنى لە نىيۇ گوند دا
ئەوهش وائى لە نووسمر كردووه واتى بگا كە تەننیا لە " گۈند " دا پېۋەندى مەرفەيەتلى
راست پاريزراوه و دەپاريززىت . " رومانه " كەش پەرسىيە ئەپەنەن

دهگهینیتە گوندو هموالى هىرىشى " سوارەكانى خىلى ناودەشت " دەگەينى و دەلى :

" لە واندەيە ئەمۇرۇ بۇيان نەكىرى لە چۆم بېپەر نۇوه ۰۰۰ بەلام سوبەى بۇ ئىۋارە بىگەنلىقى ۰۰ " .

لېرەدا نۇوسمىر ئۇمۇمان پېشان دەدات كە مىر زەينەدىن و دارو دەستەكەى چۈن خۇ ئامادە دەكەن بۇ بەرگرى كردن و لە مال و عيال و گۈنەكەميان . مىر زەينەدىن فەرمان دەدا : " ژىن و مندال و پىر و كاڭ لە ژىر سەركەرەتىنى خىزانى ، رەوانە بىرىنە شوينىك دوور بن لە گۆرەپانى شەر ، ئەوانى دەستشىyan چەڭ بىرىنە مەيدان تا رىيگا لە دوزمن بىگىرى ، بەرلەھەي پېشىيانلى بىستىقىن . بەلام ھىزى دوزمن بەرلىدۇ كاتەتى چاوهروان دەكرا لە چۆم پەرى بۇونمۇھە ، جا بىم ناچارى لە دەشتىكى يان و بەرىن دا لىيک دەئالىن . بى گومان لە شەرى وادا ، بەگشتى سەركەمۇنەن ھى ئەملايەنە كە لە پېرىكا هىرىش بەرى و گورزى خۇي بۇەشەنلى - لە گەرمەتى شەردا ، نازەنин چەند مىرد مندالىك سوار دەكا و خواردەمەنلى رەوانە دەكەت بۇ جەنگاوهرا ان بى ئەمەسى ئاگادارى ھەبى . لەمە كە شەر دەستى پېكىرەمە . لەمە كاتىمى سوار تۈز دەكەن بۇ لائى مىر زەينەدىن . ھىزى ناودەشتىكەن واي بۇ دەچىن كە كۆمەك بە مىر گەيىشت ، جا جىلمۇ ئەسپەكانىيان وەردىكىرىنەمە و رادەكەن . ئا بەم جۇرە شەرى ئەم روژە بە سەركەوتى مىر زەينەدىن تەمواو دەبى . خەلکى بەرمە گوند دەگەرەيىمە و كۆزراوهكان دەنلىزىن . دووبارە ھىمنايى دەگەرىتىمۇھە گوند .

پېيىستە پەنچە بۇ ئەم راستى يە رابكىشىن ، كە دوزمن (دوزمنانى - كورد) زور جار هان دەرى ئەم جۇرە دوزمنايمەتىيەن و ئاگىرى خوش دەكەنە وە بە مەبەستى ، بى ھىز كەرنى كورد و ئازاوه نامە و خۇ فەرز كردن بە سەر كوردىستانا .

محمدى عەلى كوردى دەيمۇ ئەمە بىسەلمىنى كە شەر نىيۇ خىلەكان بارىكى سروشتى يە لە چىاكانى كوردىستان ، بەلام لە ھەمان كاتدا ، وا لە مىر زەينەدىن دەكەت بىرى چارە سەرىك بکات ، بۇ ئەمە ئەمە

(عهشیره‌تگری و برا کوژی و ناکوکی نیو خیلەکان) گوناھبار دەکا واي دەداتە قەلەم - كە چیای و بەردیش دەھینیتە ژان و لەرزین .

لە " زورەبانی " دا ئومەمان بۇ دەرەخا كە لە كۆمەلگەسای عەشاپەرى دا ، كە لە سەر بناخە باوكاپەتى دامزراوه ، ئەم جۆرە جىياوازىيە تىيە لە نیوان نىئر و مى دا . كورو كچ نەك تەننیا پېڭمۇھ كار دەكەن ، بەلكو جۆرە رېڭخراوېكى نیو خوشىان ھەمە . بۇ وىنە : گەنچەکان لە نیو خويان سەرۋۆك ھەل دەبىزىرن لە سەر بىنچىزە ئازايىتى و هېزى توانا . " نازدار " ئى مير زەينەدەن بە سەرۋۆك ھەل دەبىزىرى نەك لە بەر ئومەھى كچى مىرە ، يان شۇخ وز شەنگۈ جوانە ، بەلكو بە دەستى خوشى ئازارلى ھاتوھ لە زورانە بازى دا ، لە بەر چاۋى ھەممۇ گەنچەکانى گۇندى پاشتى " دىنۇ " لە ئەرز دەدات بەممەش مافە سەرۋۆكايىتى پىن دەبەخشىرى ۰۰۰ پېپۆستە لىرە دا پەنچە بۇ ئەممۇ رابكىشىن كە جوانى لای نووسەر نەك لە روخسار دايىھ ، بەلكو لە كار و هېزى توانا دايىھ . بىن گومان دىيەمنى " زورەبانى " گرنگى تايىمەتى ھەمە لە " رومنەكە " و ئەم راستىيەش دەرەخا كە ئافرمەت لە كۆمەلگای كوردىوارى دا ، پايىمو شوېنى رىزگرتىنەمە ، بە پېچمۇانسى زوربەى كۆمەلگای روزھە لاتى . ئەم راستىيەش نەك تەننیا نووسەرېكى كورد تومارى كردوھ ، بەلكو زوربەى گەريبدەكانى ئەمۇرۇپاپى كە ھاتونەتە كوردىستان پەنچەيان بۇ راكىشاوه بۇ نۇمنە پىترو دىلاڭالى (۱۵۸۶ - ۱۶۵۲) - دەننوسى : " ئافرمەت لە كۆمەللى كوردىوارى دا سەر بەستە ، بىن چارشمۇ دەگرى ، لە گفتۇرگولە گەل بىگانەدا سەربەستە ، بىن پېچمۇانى ئافرمەتلى رۆز ھە لاتى نیوھ راست " (۵) .

لە تابلۇي " رۆزىكى بەھار " دا نووسەر وپنھىيەكى رازاۋى بەھارى كوردىستانمان بۇ دەكىشى ، كە دول و شىيۇ بە گول رازاۋەتمەوھ ، كەز خوشە ، لاؤەكان روبيان كردوته سەيران و كەنگەر ، ھىمەنایي بالى خۆي كېشىشاوه تە سەر ناوجەكە و خەلگى بەختمەرن لە ژيانى خويان ، بە لام لە ھەمان كاتىشدا لە كارە سات و پە لامارى نەيارانىش دەترسىن . لە ناڭاو يەكىك لە شوانەكانى مير زەينەدەن بەراڭىدن و ھەناسەبرى كە خۇرى

پی دراوه : منظره‌ی (دیمه‌نی) لادی ، شهو رابوردن " شهو چهره " ، زوره‌بانی ، له روزیکی بهار ، شمرو تالان . . .

له "منظرهی لادی" دا نووسه و هک هدلگری کامیرای سینه‌مايی
دیمهنهنی گوندہ کهمان بو دهکیشی و له سمر خوچی ده بینی پومنانی
تومار دهکاو دهگیریتومه : "له دوروهوه ، له پهنا دارهکان دا چاوم
لی یه خاوهنه مdro ملاات چون پهزه کانی دلمهورینی ۰۰۰" گوندہ
که شابالی ئاشتی به سهور راکشاوه ۰

نووسمر تابلۇرى زيانى گوندىكى كوردەواريمان بۇ دەكىشى لە كاتى بههاردا و ھەمۇل دەدات زور بەمۇردى ھەممۇ لايىنهكى زيانى لادىمان پېشاندا ۰۰ بىرى و پەز دوشىن ، بەرخ و كار تى بەردان ، جل و بەركى ئافرمەت ، جورى بىر كەرنىمۇ گوندىكەن ۰۰ ئەمەم دىيەنە وەك شەرىيەتكى سىنەما لە بەر چاو خۇينەر تىدە بېھرى ۰۰۰۰

محمد عەلی کوردى لە سوچموه قارەمانىيەتى - گەلى كوردا
نېشان دەدات و كاكلى ژيان و بەسەرھاتى كۆمەلگاى كوردەوارى سەردە -
مۇ خوييمان بۇ تومار دەكا • بىن پىچ و پەنا، بەراست گوپى ئەمو
واقيعە تالەمان بىشان دەدات •

نووسمر هر چمنده به سوزو دلسوزیمه ده روانیته ژیانی گوندی و به نمودنیه دهزانی ، به لام له ههمان کاتیشدا ، ئەم ده ده کوشندەیه

٥٠ سال به سر رومانی

نازدار پان
نرنی لادے

جه شیر حمیری

له ژماره‌ی (۲) ای چوارچرا داله سمر چیروگی "دوای سمر خوشی شیتی یه " ی محمد علی کوردی - مان نووسی و بملینمان بمه خوینهواران دا ، که له بمشی دووه‌می وتاره‌کمدا له سمر رومانی نازدار یان ژن له لادی " بدوبین .

محمد علی کوردی له پیشنه‌کی "رومانه " که دا ده نووسی : " مده‌ستم له نووسینی ئرم رومانه ئده‌میه : له ژیانی قومی کوردی لاپره‌یه ک نیشان بددهم که به چاو بی ئه همیت و فدقیره ، به لام له نهفس الامردا زور به قیمت و گهوره‌یه ۰۰۰ " (۱) ههر له هه‌مان کاتدا نهوهش ده نووسی " نازدار رومانیکی خهیالی یه ، به لام له راستی و هرم گرتوه که خوم دیتومه " (۲) وا دیاره نووسه‌ر مده‌ستی لمه ووه‌هی " خهیالی " نهوهیه که خوی به گهوره‌یه بو چونی خوی داریشته و به زاخاوی میشکی ئاواه داوه ، ههر چمنده رووداوه‌که وه ک نووسه‌ر ده نووسی : " خوم دیتومه " ، واته خوی شایهدی رووداوه‌که‌یه ۰۰ لمه

ماری تەنگەی لە زىخ مارى
 تاۋىتى بىرىدە لە دەست مارى
 كى منى كوشتىيە كىزى خارى
 حاللار و حەمى ئەللار ۰۰۰
 مارى تەنگەی لە قەد گىردى
 چەپەي پېرىد دانيا عمردى
 دەستى راستەي لە ملى گىردى
 بە تۈبىزى ماچى كىرىدى
 الحالو حەمى ئەللار ۰۰۰

تىبىينى : شىوهى ساوار كوتانەوه و تىكىستە كەيم لە دەمى باپىي—رم
 وەرگرتۇھ لە زستانى ۱۹۷۷ لە شارى ھەولىر، ئۇ كاتەش تەممۇنى لە
 (۱۰۰) سال تى پەربىبو، ھەر ھەمان سال، لە ھاوينى كۆچى دوايسى
 كىردوھ و تەممۇنى درىزى بۇ ئىيەي بەرىز جى هىشت ۰۰۰ ناوهەشمى
 سالح عەباس-، خەلکى گوندى گىردى ھەشەي گەورە بۇو لە بىن
 ھەولىرى .

گۆرانى ساوار كوتانىمۇ

بەزىت بىيى سەر قۇتەرى
چاوت شىينە باران پەھرى
تو مامزى لە ناو غەھرى
لەبەر ناسكە سواران ھەھرى

حالا و حەمى ئەللا ۰۰۰

بەزىت بىيى خانە قايى
دۇوشت خوشە لە دونىيائى
دىن و ئىمان چاولەپلەيى
حالا و حەمى ئەللا ۰۰۰

لە نەعېھىنى ھەمولىر و پىرد
يەك لە غەمېبى گازى دەكىرد
خورت وەسەر لەپەلىيان بىرد

حالا و حەمى ئەللا ۰۰۰

ئامان تەنكە چەند بە فيرى
قاوکار مامزى لە دواي خىرى
بە خوت دەرۋى بە جىم دىلى

حالا و حەمى ئەللا ۰۰۰

به هیوای ئومه کارهکم لاپهراهیه کی سپی له ده فتهری فولکلوری
کوردی رهش بکاتمه و خزمه تیک به کەلمپوری نەتمواهی تیمان بگەیەنی ،
و ئەو تیکسته فولکلوریانه چەند سالیگە به کۆکردنەمەیان خەریکم و
کەموا بىلۇم نەکردوونەتموھ نیازم وايە ووردە ووردە بلۇیان بکەمەمە و ھەم
بۇ ئەمە چاپیان به دونیای رونوکى روشن بىت و لە شەمەزەنگى بىزز
بۇون رزگاریان بى و ھیقیدارم له کەن خوینەرانى ھیئزای کور دىيش
ھېگاى رە ئامەندى بىت . ۰۰۰

باسی ههموو جوره کانی بکری ، بهلکو تمنیا باسی یه ک جوری ده که بین ،
ئه پیش گورانی ساوار کوتانه وهیه ۰

له کونمهه تا ئه موروش گیانی هاریکاری و همراهه زی له گوندە کانی
کوردمواری دا باوه ، ئه موش ده گدیتەمۆه سەر چونیهتى گوزه ران و سادە بىي
ژيانى گوندى و بەریوھ چۈونى كاروباري رۆزانه ۰ بو نموونه لەم جوره
كارانەدا ، ئەمۇ هاریکارىيە خۆي دەنويىنى : دورىنە (دورنە) ، قوركاري ،
جۈوت ، بىزار و ساوار کوتانمۆه ۰۰۰

لىرەدا باسی چونیهتى ساوار کوتانمۆه تان بو دەكەين له کوردموارى
دا لە ناوچەي دەشتى ھەولىر بەم جورەي خوارمۇدەيە ، بەلام لەمانەبى لە
شويىنى ترى كوردستان بە جورىيکى تر بىت ۰

له سەرەتاي كەزى پايىز ، كە گوندې يەكان دانمۇيلەي زستان ئامادە
دەكەن ، ساوار يىش گىزىكتىرين خواردەمەنلى گوندې يەكانى كوردستانە ۰ جا
ئمۇ مالەي ساوار کوتانمۆه ھەبى ، رۆزىيکى بو دىيار دەكا و خەلکى
ئاگادار دەكا بەم ئىيوارەيە ، يان ئەمۇ شەمە ۰ بە تراديسييۇن گوندە يەكان
لە كارى وادا هارىكاري يەكتەر دەكەن ، بەمەش دەگۇترى زېبارە ۰
بەر لە ساوار کوتانمۆه خاونە مالەكە ئەمە پېپەيىست بىت ئامادە -

دەكات :

۱- قورت (چال) ليدان و سواغ كردنى - بە گلې سور مالنج دەكىرى

يا خود سەبەتكى لە حەسپىر دروست كراو ئامادە دەكەت ۰

۲- چەند كوتەك (كوتەك اى باش ۰

۳- ساواره ووشك و نەكوتراوه كە ۰

وەكۆ باوه ، ساوار کوتانمۆه پاش نويىزى شىوان دەست پىدە كرېت ۰
ئمۇ ئىيوارەيە وەك جەزىن وايە بو گەللى گوندى ، بويش كىزۇ كار خۇ
دەرازىننەوە بو بەشدارى ، چونكە دەرفەتىكە بو تىكە لاؤى و وىك -
گەيشتن و ژوان نانمۆه ۰ جىگە لمۇدەي ھەر يەك پالماون بازى و لى ھاتتوسى
خۆي و كاراماي نىشان دەمدەت لە كوتەك وشاندە و وەستايى دا لە بەر
چاوى دلخوازەكەي و كىزى گوندى ، ماندوو بۇونى خۆي پېشان نادات تا
زېپەر سەرنجى دولبەرەكان بە لائى خويانمۆه رابكىشىن ۰

فولکلور

گورانی ساوچر لوناوه

فه خره دين گه ردي

له سمر ههدانی میژوومهه تا ئەمۇرو گورانی يەكىك بۇوه لە شىۋازا -
نەي كە كۆمەلگاي مەرقاپاھتى كەردىھتى بە ئامرازى دەربرىنى ئېش و
ئازارو بىرۇ باوەر ، بويىش دەتوانىن بلىيىن كە كۇنتىرىن شىۋەھە كە مەرقۇ
بەكارى هيňاوه له دەربرىنى ھەست و نەستى خۇي و كۆمەلگا دا .
ئەگەر سەيرى دەفتەرى فولكلۇرى گە لان بکەين دەبىنин كە پەرە
لە جۇرە دەقە فولكلۇريانە لە شىۋەھە گورانى دا ، باسى رووداوى میژوو
و رامىارى و كۆمەلايەتىمان بۇ دەگىرەنمە ، لە قۇناغە جۇر بە جۇرەكانى
مېزروودا .

نەتمووهى كوردى زېر دەستىش سەرەرای كۆپەرەرەي و پارچە پارچە
بۇون و دواڭھوتىن و چەمسانەمەنەي نەتموايەتى و چىنایەتى لە مېز زەمانەمە
گەنجىنەكى دەولەممەندى فولكلۇرى لەبنن نەھاتۇرى ھەيە .
گورانى فولكلۇرى كوردى گەملەك جۇرە ، لېرە دا لە توانادا نىيە

- (۱۶) م . لازه‌ریف . ههر شهودی . ل ۲۷۶
- (۱۷) ههر شهودی . ل ۲۳۰
- (۱۸) ن . ئا . خالفین: " خمبات له رئی کورستاندا " ، مؤسکو ، ۱۹۶۳ ، ل ۱۴۹
- (۱۹) عزیز بدرخو: " ئاشوری یەکان " ، ستوکهولم ، ۱۹۸۵ ، ل ۱۸۴ (به عاره‌بی)
- (۲۰) ل . لک . ماشقینیف: " میژووی ئاشوری یەکان " ، بەرگى یەکەم ، ۱۹۷۰ ، ل ۲۵ (به عاره‌بی)
- (۲۱) ههر شهودی . ل ۴۵
- (۲۲) د . کەمال مهزهر : " کورستان له سالەکانی شەرى جىھانى یەكەمدا " ، بەغدا ، ۱۹۷۵
- (۲۳) د . جەللىي جەللىل: " چەند لاپەرييک لە میژووی زیانى كۆمەلايەتى و سپاسى كورد له كۇتاپى سەددەم نۆزدەيم و سەناتى سەددەم بىستەمدا " . سويدئۇپسالا ، ۱۹۸۵
- (۲۴) پ . ئى . تىرەمین: " رايورتىك بەو گەشتەی سەنجاقى ھەكارى و وولايتى وان لە سالى ۱۹۰۶ دا " . تىفلیس ، ۱۹۱۰ ، ل ۲۰۳ - ۲۰۲
- (۲۵) ل . لک . ماشقینیف . ل ۲۴
- (۲۶) پ . ئى . تىرەمین . ل ۲۰۸
- (۲۷) د . کەمال مهزهر . ل ۲۵
- (۲۸) پ . ئى . تىرەمین . ل ۲۰۷
- (۲۹) د . کەمال مهزهر . ل ۲۷
- (۳۰) م . س . لازه‌ریف . ل ۲۳۷
- (۳۱) د . جەمال نەبىز: " کورستان و شۇرۇشكەھى " ، كوردو لە شەلمانى يەوه كردويىي بە كوردى . بىنكەھى چاپەمنى ئازاد - ستوکهولم ، ۱۹۸۵ ، ل ۹۲
- (۳۲) ف . گەردەلەنگى : " كارەھەلبىزارەكانى " ، بەرگى ۳ ، مؤسکو ، ۱۹۶۲ ، ل ۱۲۶
- (۳۳) م . س . لازه‌ریف . ل ۲۷۷



کورده موسوٰلماهه‌کان و شەرمەنە گاواره‌کاندا هیچ کاتیک دەوری نەبینیوو " (۲۲)
 شایانی باسە کە تا شەری جیهانی یەکەم سەرکردە‌کانی کورد نەباتوانی هیچ سەر-
 کەوتیکی دیاربکراو لە دۆستایەتی و ھاوچی یەنتى روسیا دا مسوّگەر بکەن . لە ھەموو
 جموجۇل و ھەلۋىستىكى روسە‌کاندا ئەو راستى يە دەبىنرا كە مافى ئۇتۇنۇمى و چارە-
 نووسى کوردىان هیچ کاتیک لە خەویشى نەددەدی . سەرەپاي ھەموو شەوانەش وەك لازە -
 دېڭ دەبىزى " روسیا ئەو رېگىدەشى لە کورد گرتىبوو كە جموجۇلۇكى سیاسى دەست و
 برداشە لە کوردستانى تۈركىيا و ئېران دا بىنۇن " (۲۳) .

ۋىدمەكىان :

- *) روسیا شۇشى مەشرۇتى یەتى ئېرانى (۱۹۰۵ - ۱۹۱۱) بە دەرفەت زانى كە زمارەي
 لەشكەرەكەي لە نىيۆچە‌کانى ئازىزباچان و سەررووی رۆزئاواي کوردستان فە پى بىدا و
 تەنانەت ئەو نىيۆچانە ببۇنە مەلەندىكى تەواوى دەسە لاتى روسیا .
- (۱) م . س . لازەریف : " مەسىلەي کورد " . مۆسکو ، ۱۹۷۲ ، ل ۱۲۹
- (۲) ھەر ئەھىپ . ل ۱۶۷
- (۳) ھەر ئەھىپ . ل ۲۲۴ - ۲۲۳
- (۴) ھەر ئەھىپ . ل ۲۷۶
- (۵) ھەر ئەھىپ . ل ۱۶۷
- *) راستى يەكەم ئەو ھەلۋىستەي ف - مىنۇرسكى هیچ کاتیک لەكەملەو بىرورا درووستا
 نەتىرىدا يەكىدى ناگىنەوە كە لە سەر مىزۇوی کورد و بىنەچەو رەچەلەكى نوسييون .
 جىڭ لە ھەم مەنە مىنۇرسكى يەكىكە لەو كوردىناس و دۆستە كە ھەم مىشە نەتەوەي کورد رىزو
 حورمەتلىيەتكەری و هیچ كات بىرى ناكات . مىنۇرسكى كە لە سالى ۱۹۱۵ دا يەكەم
 كىتىپى لە سەر کورد نووسى (کورد - چەند سەرنج و تىپوانىنىك) ، لە لادەپەرى ۵۷ دا
 سەبارەت بە شىخ عوبىدو لائى نايىرى دەبىزى " سەرکردەي بزووتنەوەي ۱۸۸۰ كە شىخ
 عوبىدو لائى بۇو، جى و شۇينىكى ئەددەبى باشى لە کوردستاندا ھەمبۇوه " . دووبارە لە لادە
 رپى ۵۹ دا دەبىزى " لە نەمەدە‌کانى سەددەي رابوردوودا تۈركە‌کان ھەولىيان داوه کوردە‌کان
 بەكاربىن بۇ ئەھىپى غەدر لە ئەرمەتىيە دراوشىكانيان بکەن، بە لام ئەو ھەلۋىستە جوانەمە
 كە عوبىدو لائى وەستا لادەپەرى مەتكى رووناکە لە مىزۇودا " (بىروانە : ف . مىنۇرسكى .
 " کورد " ھەولىير ، ۱۹۸۴ ، بە کوردى) .

چوْلَهی رووسیا به چهشنبیکی دی له کوردستان رهنگی نایمهوه، که بهر له همه مووشتیک کورد ههستی بدهوه کردبوو هیچ بایه خیکی له لایهن رووسیاوه بی نادریت، جگه لهوهش ژون تورکه کان شدو بارودو خهیان به دهرفته زانی که هشندهی دی دلی کورد و رووس و گله ناموسولمانه کان له یه کدی بر منجیتن (تورکه کان تا سمر هیچ یه کیکله له پیلاناهیان بو نه چووه سمر ا، له لابه کی دیکم ش رووسه کاتیان له دهست تیوهه ریان بو نیو کاروباری نا موسولمانه کانی و لاتنه که کیان تا ونبار ده کرد و له همان کاتیشا ده ماری ئینگلیزه کاتیان بهو هله لویسته رووسیا ده بروند .

بهم چه شنه ده بینین به دریزایی هدموو شه و قوتابه و تا شهری جیهانی یه که میش روو سیا سیاستیکی دوو روویی بدرام بصر به کورد و گله ناموسولمانه کان هدموو، که سما رهت به کورد و هک ده که مال مهزه هر ده بیزی "جاریکه نه بورو له مسمله بکی گرنگدا پشتیان بگری (بشتی کورد بگرن . ک دع ا و که جی له همان کاتشا بی و چان بیش تی ثاؤ روی و به تایبه هنی شه رمه کانی ده گرت و له کاتشی پیوستیشنا چه کی ده دانی) (۱۲) . نه ک هفر شهوه بدلکو رووسیا بدرده وام تیکه کوش با بو تیکدانی پیومندی کورد و شهوه که لانه که به بیرون رای رووسه کان خوشیان " دوستیه تی نیوان کورد و ئاسوری یه کان گهی شتوتنه پلهی بدره بیکی پنهوی هاوده سтанه) (۱۳) .

کار به چه کدار کردی شه ناموسولمانه شهوه نهوه ستابوو، بدلکو رووسیا له نیوچه کانی تورکیای زیر ده سه لانی له شکری خویان، دهرفته تیان به شه رمه که که کداره کان دابوو که کوش تاریکی زور له دانی شتوانی کورد بکهن) (۱۴) .

قیرسیچمه بی ئاینرا گهری رووسیا بدرام بصر به ئاسوری و ئه رمه کانی تورکیا و کور دستان به چهشنبیک دیار بسو که له دیاره وه کور دیان هر بیه مرؤف نه ده زانی . لهم رووه شهوه گله لیک بدلکه هن که شه و راستی یه ده سلمین . بو و پنه: خانی ماکو له مارتی ۱۹۱۴ نا گرنگی مسمله کور دی سمر لمنوی بمه بیر رووسیا هینساوه و وزیری همند رهان و سمر کرده هی قه فقا سی بدم جو ره ئا کانار کردبوو "ئورۇ كورد و ئەرەمن و هک بدلک دزی تورکن . هەر دو لا ده بانه وی که له زیر پاریزگاری و بال بە سەرگەر تىنی ئیوه دا بن و تەننی ئا ور بانه وو يه کی رووسیا بە سه بو شهوه را پەرنیک دزی شه و تورکه بی ده سه لانه له کور دستان و ئەرمىنیادا بە رپا یت و کاریکی وا به تورک بکریت که هەر چی پیلانی دووز منکارانه یان بدرام بصر به رووسیا همیه بیو چەل بکرینه وه) (۲۰) . بە لام رووس شەممەشی هەر بە میشکان نەچوو، کەچی پیومندی يه کی نەپینی یان له گەل له گەل ئەر مەنە کاندا بەست بسو، گفتی دەولەتتىکی سەرەخوان پەستان) (۲۱) .

لە گەل شهو سیاسته سەبارانه تىکدە رانی رووسیا و و لاتانی رۆژئاشدا بدرام بصر بە کورد و گله ناموسولمانه کان، کەچی له هدموو سەر دەمە کانی مېزۇو دا کورد و شه و گە لانه هە ولی بىته و کردنی دوستیه تی نیوان خویانیان دەدا، بە تایبەتی شه و گله ناموسو لەمانانه له کور دستاندا ئازادانه کول توور و نەریت و ئائینی خویان دەپاراست . گەر دەلی ئەھکیش لهو باره و دەستی بو شه و راستی یه دریز کر دووه که " جیاوازی ئائین له نیوان

په‌ویتی شو هەلوبیسته نهیارانهیهش بتر له سەرددەمی دامەزراندى کۆمەلەی کورد تعاون ترقى جمعیتى (کۆمەلەی ھاواکارى و پېشکەوتى کورد - ۱۹۰۸) دا خۇيا دەبوو، کاتىك كورد و شەو گملە ناموسولمانانە له چاھەمنى و بلاؤکراوه کانىاندا (رۆزئامەي گۇرتسى كار و رۆزئامەي ئاماناتك = كات) ئى ثەرمەنلى و رۆزئامەي کورد تعاون ترقى - كە زمانى ئۇرگانى کۆمەلە ھاواکارى و پېشکەوتى کورد بۇ ، و يەكمەن ژمارەي له ۱۹۰۸/۱۱/۲۹ لە شەستەنبوول دەرچوو، و بەر لەۋىش له رۆزئامەكەنی کوردىستان دا - ۱۸۹۸ (۱۸۹۸) بەردەۋام بۇ بەھىزىز كەنلى ھاواکارى و برايمەتى تىيەدەكوشان .

بۇ بىتىه رووسيا بە ئاشكرا دەيگۈوت " بىدەنگى لەو برايمەتى و ھاواکارى يەى كورد لەگەنلە ئەرمەنەكاندا دەيکەن ماناي تى يە . كوردىكان له زۇر تىۋوچەي و لايمەت و گوندەكاندا مىي واندارىتى شۇرۇشكىرىھ ئەرمەنەكان دەكەن و ئازووقەيان دەدەنلى و رېسۇنىشىيان دەكەن . (۱۳) .

كاتىك رووسەكان شەۋەيىان بۇ ئاشكرا بۇ كە كورد بىيھىج دەستكەوتىك خۇ بەدەستىيا نەوهە نادەن، شەۋاجا كەوتتە پېلان دانان بۇ چەكداركەنلى ئەلە ناموسولمانەكان . بۇ وىنە تېرىمىن لە رايپۇر تەكىمدا نوسىبۈو : " لە ولايمەتى وان دا ژمارەي ۱۲، ۷۳۵ خانوو ھەمە و لە بتلىيس ۲۲۳، ۳۲۶ (مەبەستى لە خانوو ئەرمەنەكانه - ل . ع) كە لە ھەر خانوو ھەكىدا دوو كەسى تېڭىيە كەللىكى چەك ھەلگەرتىنی ھەبىت ۱۰۰ ژمارەي ۹۵۰۰ كەس دەتوانرى چەكدار بىرى كە ۱۰ بەتالىيۇنى مەلىشىيانلى پېڭىك دېت كە دەتوانى خزمەت و سوودىيەكى زۇر بە ئىچە (مەبەستى رووسىايە . ك . ع) بەكەيەن و كوردىش ئەو دەمە ھېچ شتىيەكى دىزى ئىچە (رووسيا) پىناڭرى " (۱۴) . جىھە لەۋە رووسيا دەبۈيست سوود لە جەماوەرى ئەرمەن لە پەيدا كەن و كۆكىنەوەي ئازووقە و رېنىشاندانىش وەر بىگرى .

سەبارەت بە ئاسورى يەكانىش رووسيا باش دەيىزانى ھەرمەك كورد و ئەرمەن دوو زەمنى خۇبىنەخۇرى توركەكان و مەيلەتكى تەواويان به لاي خۇيانىا ھەمە، بۇ يە بەھەمان مەبەستى سىاسى يان ھەر لە سالى ۱۸۹۸ ھەزاز ئاسوريان ھاۋىشته نىيۇ كلىسىي سلا قىيانى يەوە (۱۵) . كە دوايە دوايى شەۋىش سەرددەۋام ئەو چەند پېيەندى يەيان لە نىيۇ ندا ھەبۈوه، ئەمە جىھە لەۋەي كە دەيانوپىست ئەواتىش وەك ئەرمەنەكان چەكدار بەكەن و بۇ شەپىكى گەورەي دىز بە توركىيان ئامادە بکەن . بۇ وىنە لە ھەمان رايپۇر تېرىمىن دا باسى چەكداركەنلى ۲۰ ھەزاز ئاسورى دەكتە، كە بە بىرۇرای ھەو " نىوهەيان بېرىنە نىيۇچەكانى شەر و شەو ۱۰ ھەزازەي دىش بارمەتى دەر دەبن و لە ھەمان كاتىشدا ئازووقە بان پى كوبىكىنەوە " (۱۶) . جىھە لەۋەش تا پېش شەپى جىھانى يەكەميش يارمەتى سا لائەنە كۆمىسىدى ئۇرتۇدۇكىس بۇ ئاسورى يەكان لە بازىزىي ورمى لە ۳۴۴۰۰ روپىلەۋە بۇ ۴۰ ھەزاز رۇبل . تەنانەت شەو كۆمىسىتە بىبۇوه مەلبەندىتىكى پۇرپاگەندەي رووسيا كە كارى كەرىدۇوه سەر ئاسورى يەكانى كوردىستانى و سەمانىش كە شان بە شانى شەو رووسيا دەبۈيست تاسىيرىكى سىاسى بکاتە سەر ھەموو نىيۇچەكانى كە ستان . بەلام شەو جەمۇ -

توانریت به هُوپانهوه تاسیری خویان له کوردستاندا فره پی بدنه " (۲) ، و له لایمکی دیکهش کیروگرفت بُو موسولمانهكان، بیتاپیمهتی بُو کورد درووست بکمن، که گوایه سا ویلکن و ززو به پُرپاگمندهی پان ثیسلامیزم هەملەخەلتین و دەدەنە پال تورکەكان . جا بُویه رووسیا ح شەرمن و ج ئاسوری يەکانی بە قەلایمکی پەتموی خۆی دەدایه قەلمەن تا بەیمەکجارەکی جى بىرى خۆی لە رۆزە لاتى ئىمپېراتۆرىتى ووسمانىدا قايم بکات، و هەر زووش رووسیا كەوتە بايەخنانیکی تايپەتى بەو كەلەنە لمپیش چاوی كورد دا . شان بە شانى رووسیاش رۆزئاوابى يەکان ، بە تايپەتى مسیونیرەكانى ئینگلېز و شەمرە - يکا بە نىتىپى بلاوكىردنەوهە ئابنى ديانى (مسيحى) بەو كەوتەنە جى قايم كەردى خۆ . يان لە نىو شەرمنى و ئاسورى يەکاندا . لمگەل ئەمەشدا هەولیان دەنە مەيلى كورد بە لای خوپاندا راكىشىن و لە ئەنجامىشدا وەك دن . خالقين دەبىزى " توانيان پیوپەندى لە كەلەتەدىك ئاغا و شىخى كورد دا درووست بکمن و چەند كەسيكىيان لى بکمنە دۆستى خوپان " (۸) .

بەلام هەر لە بنەرەتەوه شەو هەلۈيست و جموجۇلەمى سېپۆنۈرەكان هىچ بەرژەوەندىيەكى بُو گەله ناموسولمانەكان تىدا نەبىوو، چونكە ئامانچە راستەقىنەكەيانلى شاردىبۇونەوه كە پىلاني جاسوسى كردن و بەیمەكدايانيان بولۇ لمگەل كورد دا . بُو وېنە كەردىمەوهى چەند قوتاپخانەيەك بُو ئەو گەله ناموسولماناتە و ساختە بايەخنانىكى بى يان بە نىتىپى ئائىن و ئايپىزايەتى بەوە لە پېش چاوى كورد دا ، جىڭ لە فەندىو فېل و مەرامى خوپان هىچ بەرژەوە ندىيەكى سوودەمندى بُو ئەو گەلەنە تىدا نەبىوو، ئەم فۇۋەتەش باش ماوەيەكى كەم ئاش كىرا بولۇ، كاتىيەك لەگەل تۈركە هاودۇستەكابىاندا يەكىان گەرتەوە (ھەمەو شەو و ولاقتەنەى كە هيپىز بەرژەوەندى يان لە تۈركىيا كۆپۈوە و چاوجىنۇكائەتى يان دەرپوانى دەزى ھەمەو بىزۇوتەنەويەكى نەتەوايەتى مىللەتە ناتوركەكان بولۇن ، چونكە مەترى پارچەبۇونى تۈركىيائى زېرددەستيانيان تىدا دەدى) ، نەنائەت ئىنگلېزەكان بولۇن كە دەستيان لە كوشتنى مار شەمعەن دا هەبىوو " (۹) .

پىگومان ئەمە جىڭ لەھەنە كە تۈركەكان بەرداھوام خەرىكى پىلان ئانان و سیاستى بەگزىدا كەردىنە كورد و شەرمنى و ئاسورى يەکان بولۇن . بەتاپیمەتى دۇواى دۇرپانى ھەر شەپەرەك بان (لمگەل ئىتالىيادا ۱۹۱۱ - ۱۹۱۲ و شەپەرەكەنلىكى يەكەم ۱۹۱۲ - ۱۹۱۳) اھەمەو درىندىبىي و تۆلەمى شەپەرەكانيان لە مىللەتە زېرددەستەكائى و ولاتەكەيان دەستانى، وەك ماتقىيەت دەبىزى " مەترى پارچەبۇون و نەمانى دەسە لاتى ئىمپېراتۆرى يەتەكھەيان لەو مىللەتاتەنەدا دەدى " (۱۰) .

كار بەھەشەوه نەھەستابۇو بەلكو زۆر جار بُو لىيەنلى ئاسورى يەکان دەچۈون جلوپەرگى كوردى يان لەپەر خۇ دەكەرد " (۱۱) . هەر ھەمان سیاستىشيان و بگە كەلەك تاوانساز تەپرامىمەر بە كورد و شەرمنە هەبىوو " (۱۲) .

بەم پى يە دەبىتىن كە ڑۇن تۈركەكان و بەرەي رۆزئاوا و رووسیا دەستىكى با لایان لە تىكىدانى دۆستايەتى و برايەتى نىيوان كورد و شەو گەله ناموسولماناتەنە هەبىوو، تىز

رووی سمندنی باج و سه رانه وه، به لکو که وتنه بهره‌لستی شو بزووتنه وه چه کداره‌ی میر سالاریش که له میز نمبوو دزی رزیمی قاجاری له نیوچه کرانشان پیه هستا بوو . جا رووسیا نیازی وابوو که کورد چه کدار بکات و ئا لمو لمشکره‌ی بخزیتی، چونکه به هیچ چهشیلک نمیده ویست نیوچه کانی سه سنور بیتیه مملیندی جموجولی همندی که سانی وەک شیخ تمها نایری و عبدول رماق و سکوی شکاک و ۰۰۰ هتد که به ببرو رای رووسیا " شو که سانه له سه رانه وه دهیانویست کوردى ئیران بکهنه یەک و پاشان

بۇ همان ممهست بکهونه نیو کوردى تورکیا ۰۰۰ بەکگرتنه وه کوردى ئیران و تورکیا نەک هەر لەگەل بەرژه‌ندی رووسیا دا نمده‌گونجا، به لکو مهترسی بەکی گهوره‌شی له نیوچه کانی سه سنور بۇ پەیدا دەکرد " (۴) .

ئەمەش بە پیچەوانەی خواستی سەرکردە کانی کوردە وه بۇو که دەبانویست بارودوخى ئا - بۇورى و سیاسى گوردستان پېننەوە سەرخۆی و شەوچا بەراستى بکەوتیه زېر بالى رووسیا . تمانانەت جىگرى قۇنسۇلى رووسیا له وان ئۆلۈفىرېف له روانگىنەکى دۆستانەوە لەو مەسىھى دەروانى و دەیگووت: " پېۋەندى مەسىلمە کورد بە رووسیا وە لە بوارى سیاسى و ستراتېجىو وە بىي بايدىخ نى يە كە دەپتىت رووسیا پىت لە هەر كەشكىكى دىكە ئاكاى لەو مەسىھى زەراندى دەسە لائىكى ئۇنۇنومىدار بۇ کورد چىتەت وەک لە شەرەمىنى يەكان " (۵) .

بەلام بەگشتى بېرۋىزاي نويىمەراسى رووسیا له تورکیا و ئیران وابوو که نەک هەر يار مەتى کورد نەدرى، به لکو ھمول سەرى كە شیخ تمها نایری و عبدول رماق بەدرخانى لە رېڭىدە رووسیا وە بۇ دەرەوە بنېردىن .

تمانانەت يەكىكى وەک ف . مينۇركىش شو سەردەمە بېرۋىزايەکى نەيارانە بەرامبەر شیخ تمها نایری و عبدول رماق ھبۇو کە گوايە لە زېرەوە بە تورکیا گىردىراون و لە سەر دوو پەت دەلىزىن (يارى دەكەن) . مينۇركى بىي وابوو کە " بەرژه‌ندى رووسیا وا پېۋىست دەکات شو سنوروە جوگرافى بىي کە تورکیا و ئیران سالى ۱۸۴۸ نەخشەيان كەپ شا بۇو ھەر بەرددەوام بىت لە دابەشکەرنى كوردىشىن لە دوو بەشمەوە - لە هەمان كاتىدا مينۇركى بىي وابوو کە - كوردە كان ھېشتا بىنكمەيەكى كولتۇرۇي بەکگرتتنۇيان نى يە بۇوە كەر بىت و يەك بىگەن رەنگە ئەم يەكىتى يەيان بىتىتە دروستۇونى بزووتنەوە يەكى كىيۇيانە، بە وېنەي ھەمان ھە لاتىنە كە شیخ عوبىدو لاى نایری سالى ۱۸۸۰ لە فارس (x) ۰۰ بەرژه‌ندى رووسیا وا دەخوازى كە بەمەكجاري ژيانى كوردە کانی فارس و تورکیا لە يەكدى جىا بکرېنەوە " (۶) .

بۇ بە ئەنجامدانى شو سياسته رووسیا ھەندى پىلاسى دىكەشى دز بە بزووتنەوە و يەك گرتنەوە کورد ساز دا ، كە ئەوشى نانەوە ناکۆكى و دووبەرەكى و دل لەمەك كرمى كردن و بەيەكدايانى كورد و گەله ناموسولمانە كانى تورکیا و كوردستاندا بۇو، كە لەو رى يەوە دەبىويست ئاسورى يەكان بۇ نیو كائىسى شۇرۇتۇرۇكى رابكىشى و بە ئاشكراش گىرس پىتى لەو دەنا كە " نەستۆرى يەكان چەكىكى زىندۇون بەددەست رووسیا و دە -

نگو و هوّمهر بهگو و ۰۰۰ هند سوو له‌گمل شیخ‌ته‌های نایبری و عهدول ره‌زاقی سدرخان که
شو کاته له‌موی سوون . جگه له‌مهه ژون تورکه‌کان بُو به ئەنجاماتی شو کاره‌یان زوله کو-
ردیکی و دلک شەممەد ئاغایان له قەقادسەوە ناردبیوه کوردستان و ئەوش لە رئی پاره‌دان
و همندی کاروباری دەولەتی بى يان بُوی لوابوو کە فربیوی چەند کوردىک بىكىت و بىانەی
بىتە نېو سواراتى حەممىدى يەوه .

شاياني باسە کە تورکه‌کان هيچ دەمپاک نەيان نوانىيىو (ھەرچەندە مىزۇۋەتكى كۆنيسان
بەرامبەر كورد و لەنچىپەرىدى راپەرىنەكانى لە رئی چەند سەركىرىدە و سەردارىيکى كورده
وە هەسوو) هەمتى كورنایەتى و تىكۈشانى جەماۋەرى كورد بەتەواوی دابىرلىكىنەوە و تۇ
و بىر بىكەن .

جا رووسا شو جموجۇل و بىرۇپاڭەندەيە تورکيائى كردبىووه هوّىيەكى سەرەكى و مە-
ترسى يەمكى كەورەشى بُو خۇي درووست كردبىوو کە سەر لە سوی بىزۇۋەتسەمەئى كورد پىشت -
گۇي بخات . تەننی لە بەھارى ۱۹۱۲ نا کە شەپى بەلگان دەستى پىكىد، وەزىرى ھەندە -
رانيان سازانۇف كەونە خۇسى و پىتى وابوو کە دەپىت : " شو دەرفەتە لە دەست نەدرى
وە هوّلۇ لەمەككەرىدى تورك و كورد بىرى و هوّزەكان كۆپكەرىشەوە و چەكدار بىكەن و هېز
يىكىان لى درووست بىكىت " (۳) .

ئەم بىرۇپايدە كاتى هاتە كايدەوە کە لەشكەرى تورك نېچە داگىر كراوهەكانى جى هىشت و
بەرەو توركى (لە ئۆكتۆبەرى ۱۹۱۲) كەرىدەوە . بەلام بە چەشىتكى و مەبەستىكى دى
كەوتىنە چەكدار كەردى كورد، و لەم مەيدانەشدا دوو جۇرە بۇچۇنى رووسا خۇبا (دىار)
دەپىت :

۱) دەست بەسىر اگىرتى رووسىا بەسىر نېچە چۈلکراوهەكانىدا (پاش نەمانى دەسە
لائى تورك و گەپانەوە لەشكەركەميان بە هوّى خەرىك بىوونى يەوه بە شهرى ئىتالىسا و
بەلگانەوە) بىووه هوّىيەك كە بىتر مەملى كورد بە لاي رووسەكاندا بىكشى، و لە ھەمان
كەتىشدا دەرفەتىكى چاك بىو بۇ رووسىا كە دەسە لائى لە كەلپۈكە وتۈرى رۈزىمى شاي
قاجارى لە كوردستاندا بە هوش خۇرى سېنىتەمەوە، كە لە راستىدا ئەممەش دەستاۋىزىك بىوو
كە لە رىيەوە دەبىويىست مەبەستە سىاسى يەكانى لە رۆزە لاتىدا بىتىنە دى . بەلام بەو
جۇرە كە رووسىا بىرى لى دەكرەدەوە بۇي نەچچووه سەر، چونكە زوو تووشى سىاسەتى
بەرهەلسەنانى ئىنگلىز و ئەلمانەكان لە ئىراندا ھات .

۲) هەولۇدان بۇ نەھەيشتى تاڭوکى ئىوان ھەندىك لە سەرەك هوّزەكانى نېچە سەر
سنوورى يەكانى ھەردوو پارچەي كوردستان، لە راستىدا ئەممەش بۇ مەبەستى ھېمەن كرد
نەوهى شو نېچچانە بىو كە گەلپاڭ جار مەترى بۇ رۈزىمى شاي قاجارى درووست دەكەرد
و لە لايدەكى دېكەشمەوە بۇ دەست بەسىر اگىرتىن و پەتكەردى دەسە لائى خۇيان بىو كە
رۆزئاواي ئىرلان بەتەواوی بىكەۋىتە بن كۆنترۆلى خۇيانەوە . شان بە شانى ئەممەش روو -
سيا بەتالىيۇزىكى لە كەزاخەكانى ئىرلان بە سەركىرىدەتى زەخارچىنگۇ درووست كردبىوو
كە هەر زوو دەستىيان كىردى زۇرپارى كىردى بەرامبەر بە دانىشتوانى كورد، نەك تەننی لە

نی رۆزئاوا رئی‌هاوکاری و دوستایانیتی بان لی ده‌گرتن و مسملەی ئابنرايەتی بان دەکرده دەستاویزیک و بە گۈز يەکدی باندا دەکردن .

ھەلۋىستى شەزارەكانى روس و دېپلۆماسى يەكانيان لەگەل شویندا ئەو راستى يەی سەرە وە دەسلەمیئن، و لىيەمدە ھەندىكىيان دەخەينە پېش چاو :

كانىڭ لەشكىرى زۇن توركەكان ھەر وەك لەمەوبىرىش ووتمان كە نىبۇچەمەكى كوردىستان و ئازاربايجانيان لە ئېرىان داگىر كردبۇو، رووسپا ھېچ ھەلۋىستىكى توندى دەستورىدانىي پېشان نەدان، ھەرچەندە دەولەتى رووسپا خۇي بە بەرپرسىيارى شاي قاجارى دەزانسى و لەشكىرى خۇشى لە ئېرىان خزاندبۇو (۱)، ئەمە جىڭ لەمە كە كوردىش ئامادەيى خۇي بۇ وەدەرنانى لەشكىرى تورك و دەزگە و دايىرەكانيان پېشان دابۇو . "ئىمە شەواو گەمىشۈنە ئەو بىرورايە - ف . مىنۇرسكى و نوینەمرى ئىنگلىزەكان لە راپورتىكى ھاوېشى باندا نووسپىپويان - كە ئىبارەت تورك بە ھېچ جۇرپىك جىڭ بایەخ و رىزگرتن نىن لە نىتۇچە داگىر كراوهەكانى كوردىستاندا ۰۰۰ بۇونى لەشكىرى تورك بۇتە بارىكى زۇر گران لە سەر شانى جووتكاران و ئەمەش بۇتە ھۆي دەرىپىنى نارەزاىي بەكى زۇر بەرامبەريان" (۲) .

شان بە شانى ئەمەش ژمارەيەكى دى لە دېپلۆماسى بە رووسەكان بۇ حکومەتمەكەمان پېشنىار كردبۇو كە شەو دەرفەته لە دەست نەدرى و بۇ بەيەكدانانى كورد و لەشكىرى تورك بە پارەو چەمك و تەقەدمەنلى پشتگىرى يەكەميان بىكىت . ھەر لەم رووهە لە راپۇز تىكى فراوانى چىڭرى قۇنسۇلى رووسپا لە (وان) گۆلۈپىن نا گەلىك لايىنى شەو بارو دۆخە دەۋوارەي كوردىستانلى لېزانتانە و بابەتانە و بۇ بەرۋەمەندى حکومەتمەكەدى دەستىشان كردبۇو . گۆلۈپىن پىتى واپۇ كە " دەبىت بە لايىنى كەممەو و بۇ بەرۋەمەندى خۇمان يارىمەتى يەكى مەرالى كوردەكان بىدەپىن لە دىزايىتى كەندييان بەرامبەر بە توركەكان .

بە پېچەوانەي ئەمەوە گەر كوردەكان خۇ بەدەنە پاڭ توركەكان، ئەو دەمە نەك تەمنى لە رۆزە لاتى نىۋەرات (توركىيا و ئېرىان) دا ناو و ھەيمەتمان بە جارپىك نامىنى، بىكەر لە قەفقاشىشا ۰۰۰ پېۋەندى نا بەدللىمان بەرامبىمع بە مسملەى كورد كلىپەيدەك درووست دەكا ت كە رەنگ بى ئاگرىكى بى كۈرەنەوە لە دووابېككە لە ئەنچىمامدا زۇر بە ئاسانى ھەمو شەو پېۋەندى يە مىزرووبى يە سەمان سالەيەمان لە رۆزە لاتى ئىسلامىدا بە فيرۇ بېچىت . خۇ گەر پان ئىسلامىزم توانى لە وو لاتى شىعە كاندا سەركەوتتىكى گەورە بە دەست بىنى ، شەوا ئەو دەمە بى تونانىي و ھاوکارى رووسپا دەبىتە ھۆيەك كە تورك مەبەستى خۇي لە دامەر كاندىنەوەي عارەب و ئەلبانەكان و لىيەنانى گشت كوردە ھاۋا ئايىزاكانىدا بە ئەنجام بىگەيمەنلى . شەوجا ئەم كارەي و سەمانى يەكانىش گىروگىرتىكى وا درووست دەكتەن كە رwoo سيا خىر لە خۇي نەبىنىي" (۳) .

راستە پىروپاگەندەي پان ئىسلامى توركەكان لە ئېرىاندا بە گەشتى بۇ تىكىدانى پېتى -

ندى راستەخۇي نىۋان رووس و كورد بۇو ، لە ھەمان كاتىشىدا بۇ راکىشان و بە لايىنى كەممەوە بى لايىنكردىنى سەركەر كەنلى كوردىستانلى قاجارى : سەكۈي شەراك و تەيمۇر جا

پیومندی نیوان کورد و روسیا

لە سەرەتائی سەدە بىستەم دا

کەممال عەملی

لە بەشی يەکەمی ئەمم ووتارەدا چەند لایەنگى سیاسەتى روسیا
مان لەگەل كورد دا ، و بىرورپایەکى پىرىنسىپانە لە پېتىگىرى كردنى كورد دا نەبوبو . هەر لەپەر
مان بەرامبەر بەھو سیاسەتە دەستتىشان كرد . لەم بەشەشدا كورتە
يەكى لایەنگى دىكەمەنلىقىسى دېپلۆماسى يە روسەكان و سیا
سەتى دەسە لەتدارانى نیومندى يان لە كوردىستاندا و پیومندى يان
لەگەل مەيلەتە ناموسولمانەكان و كورد دا دەخەفینە بەرمەست .

شايانى باسە كە ئىمپېراتورىتى روسیا ج لە كاتى شەر و ج لە كاتى ئاشتى دا لەگەل
تۈركىيا ھىچ بىرورپايەكى پىرىنسىپانە لە پېتىگىرى كردنى كورد دا نەبوبو . هەر لەپەر
ئەممەش بۇ كە روسیا نەيدەتۋانى ھىزى بە تواناى كورد بە لای خۆپىنا بکىشى و بىكەتە
ھاودۇستىكى ستراتىزى خۆپى و سوود لەو دەرفەتانە وەرىگىرىت كە بە درىزايى ھەمۇ
ئۇ سەرەتەمانە كورد بۇيى رەخسانىدۇون .

بە بىرپای روسەكان دەبوايە كورد شەو گۈولە بى دىركە بن كە خۆپىان دەبىانویست ، كە
ئەممەش نەك بە كورد نە دەكرا بەلکۇ بەم ھەملىقىسىتە روسیا سەرىشى لە كورد شىپۇ
نەبوبو . كاتىكىش كە كورد دەبىویست بە ھاواكارى روسەكان شەرى تۈرك بىكەت رئى يان لى
دەگىرنى ، كاتىكىش داوابى پالپەشتى و رېتىۋىنى يان لى دەكىردىن مەتمانەيان بە كورد نەدەكىرد
و پېتىگۈي يان دەختەن . كاتىكىش كە كورد دەبىویست بىرايەتى و دۆستايەتى لەگەل
مەيلەتە ناموسولمانەكانى تۈركىيا و كوردىستاندا بەھىز بىكەت ، ئۇواج روسیا و ج وو لاتا

پیوهندی له گدل پارتی کومونیستی عیراق ههبووه . ههر له سالی ۱۹۴۸
پولی سی ناوهندی له قوتاخانه شهوان تعواو کردوه .
چهند ریبازیکی ئهدبى وەك : کلاسیزم ، رومانتیزم و ریالیزمى
رهخنه گرى له شیعره کانى بەختیار زیوهدا رەنگیان داوهتموھ ، بەلام
ھیلی سمرەکى له شیعره کانى دا رومانتیزم شورشگىری بووه .
له ناوەراستى ۱۹۴۸ شاعير توشى نەخوشیکى گران دېت و
عەمەلياتى کاسەی سەرى دەكىت و له ئەنجامدا ، دواي شەش مانگ كۆچى
دوايى كردوه له روزى ۱۲/۳۱ ۱۹۵۲ و له گورستانى گردى جوگە لە
سلیمانى نیزراوه .
دۇو نمۇنە له شیعرە کانى :

وتارى كوردىك

”گيانە كەم هەركەس راست و رەمان بىـ
بە كىردار دەرخا نيازى جوان بىـ
دلىزى من و تو و نېشتمان بىـ
حەز ئەكاكى كۈرى سەپان و شوان بىـ
ئەمەكسە روـلەمى كوردى ھەـمـزارە
با توشـنـەـيـنـاسـى وەـكـوـ روـزـ دـىـارـە“

ماموستاي دلىز

”مەلـەـتـىـكـ هـىـوـاـيـ بـەـرـزـىـ ژـىـانـ بـىـ
تـېـنـىـوـىـ ئـازـادـىـ وـ دـىـلـىـ زـەـمـانـ بـىـ
بـەـنـدـىـ وـ ھـەـزـارـىـ زـۆـرـ لـاـگـارـانـ بـىـ
ھـېـزـىـ مـەـرـدـانـەـىـ كـەـ هـاتـەـ گـەـرـدـشـ
وـەـكـ ئـەـ تـۆـمـ زـەـمـىـنـ دـېـنـىـتـەـ جـۆـنـبـوـشـ“



دا ۰ یه‌کیک له سروده بدن او بانگه کانی ، که له روژی شمشی ئەمیلولى
۱۹۳۰ له چاپخانه کانی سليمانى و به دەنگى ره سول عبدوللاھانى
خملکى ئەدا :

چەند شیرینه لام
بە فیدای ئەکەم
دارو بەردى وەتەنەم
روح و گیان و بەمدەنەم
بەختیار زیوه‌رله چىلەکاندا ناوبانگى دەركىرىدبوو و بەشدارى خەباتى
سیاسى دەکرد و پیوه‌ندي هەمبۇوه له گەل كۆمەل و رىڭخراوه سیاسىيەكان -
دا ۰ له سەرەتا له گەل كۆمەلەي " ۋى-كاف " و له سالانى ۴۷ - ۱۹۴۸

بەھىار زىوەر

١٩٥٨ - ١٩٠٨

بەختىار زىوەر - ناوى راستەقىنەي فايىق - ، كورى شاعيرى
بە ناو بانگى كورد زىوەر ئەفندىيە ، لە سالى ١٩٠٨ لە سليمانى
چاوى كردوتموه ، لە حوجرهى مزگومتى خويندوه ، پاشان چوتنە قوتابخانە
و پولى شەشى سەرەتايى تمواوا كردوه . دوايى چويتە بەغدا ، لەويىدا
دەورەيەكى بىرىن پىچى ئازەلى بىنىيە ، پاشان بە موزەمیدى بەيتەرى
دامەزراوه . . .

لە سەرتا دا شىعىرى بە ناوى / سەركەمتوو - واتە فايىق / بىلاو
كردوتموه ، بەلام دوايى ناز ناوى بەختىاري هەلبىزاردوه . هەر چەند
شاعير نەخوش و كلۆل بۇوه ، بەلام كۆلى نەداوه و ۋىيانى لە بەر چاوا
تارىك نەبۇوه ، خۆي بە بەختىار زانىيە .

شاعير بەرھەممەكانى خۆي بە دوو قۇناخ دابەش كردوه . يەكەم : لە
١٥ ئەدىلولى ١٩٢٥ وە تا ١٥ مارتى ١٩٢٨ ، قۇناخى دووهمى : لە
٣ ئەممۇزى ١٩٣٨ تا سالى ١٩٥٠ . شاعير دوو سال بەر لە كۆچى دوايى
شىعىرى نەنۇوسىيە .

شاعير مان رېچكەمى باوکى گرتوهە بەر لە شىعەر سرودى نىشتەمانى

هەلیان بۇ ھەلکەوت و خۆیان کرده میرى سەر بپو رى يان لە گەشەکردنى
ھەموو جۆرە بىرىيکى سەربەست و پىشكەوتتەخواز لە كوردىستاندا گرت و
ئەو داۋ و دەزگەميانەي كە به خويىنى هەزاران جوتكاروسەپان و زن و منال و
رۆشنېبرى شۇرۇشكىرى كورد نامەزرابوو ، لە جياتى ئەوهى بۇ بەرزىكەدە
نمەھى پايەي خويىنەوارى و رووناکبىرى گەل بەكاربەيىنرىن ، ھېيدىكىان
بە دىيارى دران بە كوتە خويىنەوارى ماستاۋ ساردىڭەرەوهى كلك ھەلسەنگىن.

ھەر لەبەر ئەوهەش ببوو ، هي وا كەوتتە " كۇرۇ زانىيارى كورد " ھۆھ كە
جى يەكانيان تەننیا وەك پاداشى كلكە لمقى يان بۇ كاربەدەستى تا دىلسۇز
و سەركەردە كوردى نەزانەھەكانى پارت ، پى بەخشرابوو .

ئەگەرچى لە قانۇونى " كۇر " دا - كە پارتەكان خۆشيان لە دانانى دا
بەشدار بۇون ، ئاشكرا نۇوسراواه ، ئەو كەسەي دەكەرىتە ئەندام ، دەبى
زمانى كوردى زۆر باش بىزانلىق .

(٣٠) - لە دوووايى دا بىيىستم كە " كۇر " ئەم كارەي كردووھ . بەممە دىيارە
يەكىيەك لە پىيويىستى يەكانى سەرشانى خۆي بەجى ھىناواه ، ئەگەرچى
نازازم ئەوانەھى نىرماون لەسەر ج بىنچىنەيەك ھەلبىزىرماون .

(٣١) - لورەكان بە بىرورپاى مىژۇنۇوسانى بەنیوبانگى خۆمانەھى وەك
بىتلىسى و بىگانەھى وەك (المسعودى) و (ابن قتيبة) و (الطبرى) و
(راولسن) و (ريچ) و ۰۰۰ هەندى ، ھەر لە كۈنهوھ بە كورد ناسراون . لورە
كان خۆشيان لەسەر ئەو باوهەن . بۇ وېنە كىيى بىيى و بويىرى بە فەبلى يەك
بلىق : (تۇ كوردى نىيت)ا . شاييانى باسە چەند سالىيەك پېش جەنگى جىھانى
يەكەم ، ئۆسکارمانى ئەلەمان ، لە نەزانانىنەوە ، شىۋەھى لورى لە زمانى
كوردى جىاکرەھەوە . لەم دوووايى يەشدا ، ھىننەي كورد ، كە دىلنيام ھىچ
كاتىيەك نەيانتوانىيە تىيكتىيەكلى لورى بە پىيى زانستى زمانەوانى بەراور
دكارى شى بىكەنەوە ، خەرىك بۇون لە رىئى چاولىيەكەرى كويىرانەوە لورى
لە كوردىتى " بخەن " . راستى يەكەم ، لورى راستەقىنە كوردىن .
بە لام ئەوهەھەمە ، ھىننەي ھۆز پى يان دەگوتلى " لور " كەچى مافيان
بە لورەھە نى يە . لە نامىلىكەيەكى دى دا دېمەھە سەر ئەم باسە .



داوه • نووسهره کوردهکانی ناوجه‌ی ههورامان و زنگنه و کاکهی که بهم زاراوایه قسه دهکهن ، بُّ نووسین زاراوای سلهیمانی - سورانی بهکاردهبهن•

زاراواکانی زازاش له ناوجه‌کانی بین گُول و ناوجه‌کانی ئەلەزىز (دېرسیم ، خەرپووت ، مەعدن) و ناوجه‌کانی دیاربکر (قولب ، ھینه پیران ، چىرمۇوك) و له ئورفه (سیویزەك) له لايەن ۲۵۰ ھەزار كەمسيكە وە قىسيان پى دەكرى • زازايى لە گۇرانى يەوه زۆر نىزىكە و لمبىر ئەوه يە كە ھەردووكىيان بە كۆملە شىۋەيەك دادەنرىن • بە لام ئەوه ھەيدى زازايى هىچ كاتىك شىۋەيەكى ئەدەبى كوردى نەبوبو و ئەوانى بە زازايىش دەدونن ، چونكە له نىو كرمانجەکانى ژۇرۇرو كوردىستاندا دەزىن ، بە زۆرى بە شىۋەي كرمانجى ژۇرۇرۇ دەپەيقۇن (قسە دەكەن) و ھەر ئەھ شىۋەيەش بُّ نووسین بەكاردەبهن • كۆملە شىۋەي گۇرانى - زازايى ، ھەرچەندە تا ئەندازەيەك كەتووته ژىر تاوى فارسى نىۋەپاستەوه ، بە لام ھىشتا شوينەوارى زۆر كۇنى پىوه ماوه و ھەل دەگرى خەرىكى بىبىن و زمانە ئەدەبى يەكەمان بە ووشە و ووتە رەسمەتكانى دەولەمەندىر بکەين•

ۋىدەمەكان

(۲۸)- لە شوينى خۆى دا ماناو مەبەستى ئەم ووشە بىگانانە لىك دەدە-

• يەوه •

(۲۹) - لىرەدا مەبەستىم ئەوه نى يە خوانەخواستە لە سەرپۇتە لاكى كەس بىدەم ، يَا نىئىي ھىچ كەسىك بە نارەوا بە سارد و سووکى بەرم • بە لام شتىكى ئاشكرايە و ھەممۇ كوردىكى بە رۇمىتىش دانى پىدا دەنلى كە بەرھەي سەرلى شىۋا و ھەلمەمەتە كاسە و داگىركەربەرستى كورد ، بە سەرۋەتى دەرەبەگ و ھوردەبورۇوا مۇلخواردووهكانى نىيۇ پارتى دىيمۇ كراتى كوردىستان و بە پىئى پىلانىكى وورد رېكخراو لە لايەن دوزھىمنانى گەلى كوردهوه ، بەتاپىتەتى دوواي رېكمەوتەكى (۱۱) ئى مارتى ۱۹۷۰ ،

۲ - کرمانجی شیوه‌بست :

ئەم شیوه‌یەش زاراواکانی سلمیمانی و سنه‌بی - ئەردە لانی و کەركوو
کى - گەرمیانی و ھەولییرى - سۇرانی و موکرى و شاربازىرى و پىزدەرى
دەگریتەوە كە زاراواي سلمیمانی بەسەر ھەمووياندا زال بۇوه و خۇی كرد
ووه بە شیوه‌ی ئەددەبىي ئەم كۆملە .

ب - دوو شیوه لاتەنیشتمەكە

۱ - کرمانجى ئېروو :

ئەمەش زاراواکانی فەيلى و كرماشانى و لەكى و كەلھورى خانەقىي
نى و ھېندي لە زاراوانە دەگریتەوە كە بە شیوه‌ی "لۇپى" (۳۱) دەدر
يىنە قەلەم . بەرزترین شاعيرى ئەم شیوه‌یە با با تايەرى ھەممەدانى و مەلا
پەريشانى كورد بۇون .

شاياني باسه كە ئەم شیوه‌یە وەك شیوه‌یەكى ئەددەبى ، ماوهەيەكى زورە دەو
رى خۇی وون كردووھ . كورده فەيلى يەكانى عىرّاق ، لە بەغدا بن يان
بەدرە يَا مەندەلى يَا جەسان يَا زەپباتى يە يَا كوقوت ، زمانى ئەددەبى يان
ھەر ئەو كوردى يە كە كوردىستانى عىرّاقدا بەكاردەھىنرى . كورده كا
نى كرماشانىش ھەر ئەو كوردى يە يَا نېزبىڭ لەدە به شیوه‌ی ئەددەبى خۇ
يان دەزانىن . بە تايىبەتى چونكە لە كوردىستانى ئېرەندا شیوه‌ی موکرى ،
كە زاراوايەكى كرمانجى نېۋەپاستە و لە زمانى نووسىنى كوردى يەوه
نېزىكە ، بە كوردىي " راستەقينە " دەدرىتە قەلەم و ويستگەي رادویش
ھەر بەو شیوه‌یە پۈرۈگرامەكانى خۇی بلاودەكتەمە .

۲ - كۆملە شیوه‌ی گۇرانى - زازايى :

زاراواکانى گۇران - ئەدو زاراوانەن كە لە ھەورامان و ناوچەي زەنگمنە
و ناوچەي كاكەيى يەكان لە كەركووك قىسىي پى دەكرى و بە زمانى "ماچۇ"
- واتا " دەلىم " - نېۋى رۇپىوھ . زاراواي گۇرانى ، رۇزى لە رۇزان زمانى
رسىمىي مېرىنىشىنى ئەردە لان و تا ماوهەيەكىش هي بايان بۇوه . لە شاعيرە
گەورەكانى ئەم شیوه‌یە ، خاناي قوبادى و مەھولھوي . ئەھوي شاياني باسه
ماوهەيەكى زورە ئەم شیوه‌یە دەوري خۇی وەك زمانىي كى ئەددەبى لە دەست

"سندویچ" کراوه به "شاطر و مشطور بینه‌ما کامخ" و "ئیلیپس" (له ماتماتیکدا) بووه به "شلغمی" و "کولتورو" یشیان لى کردووین به "فلطور".

بەرەو زمانیکی يەكگرتووی ئەمدبى

بەر لە ھەممو شتىڭ دەمەۋى ئەوه بلىّم كە لىزىدە ووشەي (کوردى) و ووشەي (کرمانجى) ھەردووکىيان بۇ تاقە يەك مانا بەكاردەھىن. چونكە بە راستى ھەردوو ووشەكە، ج (کوردى) و ج (کرمانجى) ھەرىيەكىن و (کرمانجى) ش وەك (کوردى) ھەر زمانى کوردى دەگرېتىمە، بە ھەممو شىّوه و زاراوه‌كانى يەوه ئەۋەتا خاوهنى "شەرەفنامە" و ئەحمەدى خانى و مەلا مەحموودى بايەزىدى و گەللىك لە زانا و نۇوسەرەكانى کورد، ھەر لە كۆنەوه ووشەي (کوردى) و (کرمانج) يان ھەر بەيەك شەنداواه و لە جياتى يەك بە كارىيان ھېنپاون. جا لمبەر ئەوهى خۆم لە سەر ئەو باوه - رەم كە ووشەي (کرمانجى) لە ووشەي (کوردى) كۆنترە، بە زۇرى لىرە دا ووشەي (کرمانج) بەكاردەھىن و (زمانى كرمانجىش) بەسەر دوو شىّوه بىنچىنەيى و دوو شىّوه لاتەنیشدا نابەش دەكەم. مەبەستىش لەم دابەشكىرنە بەم جۇرە، كەم كەردىنەوهى نىرخ و بايەخى ئەو شىوانە نى يە كە بە لاتەنیشىتىان دادەنیم. بەلگۇ مەبەستىم لە شىّوه بىنچىنەيى بەكان ئەو شىوانەيە كە ئەمرو بۇونەتە زمانى ئەددىبى و شىّوه لاتەنیشەكانىش ئەوانەن كە دەمېكە ئەو دەورە نابىين. جا لمبەر ئەوهى كە بە تەمام بەر گىكى تايىبەتى بۇ لىكۈللىنەوه لە خۇمالەكانى زمانى کوردى و شىّوه كانى تەرخان بکەم، نامەۋى لىرەدا بە دوورودرېزى لە ھەرىيەكى لەم شىوانە بىدۇوم، ئەۋەنە نەبى كە پىۋەندىي بە باسەكەوه ھەيە.

آ - دوو شىّوه بىنچىنە يى يەكە

1 - كرمانجى ژۇرۇو :

ئەم شىّوه يە زاراوه‌كانى بۇتانى و جىزىرەيى و ھەكارى و بادىنالى و ئاشىتىھى و بايەزىدى دەگرېتىمە كە زاراواي جىزىرە بەسەر ھەمموياندا زال بۇوه و خۆى كردووه بە شىّوه ئەددىبى ئەم كۆملە.

راستی یه‌که‌ی دهوله‌مهندی زمان بهوه نی یه بُـ تاقه مانایه‌ک چهند ووشمیه کت ببی (بُـ وینه: چیا ، کیو ، شاخ ، کیف) ، که‌چی بُـ ههزاران ووشمیه‌ک فیزیک و فلسفه‌قه و زانستی کُـمه لایه‌تی و تهکنیک و ۰۰۰ هتد تاقه ووشمیه‌ک بت لـ بچیت‌هه قاتی . بونی چهند ووشمیه‌کی هاومانا ، بهرامبه‌ر یه‌ک مانا ، شتیکی خورسکی یه و پیویست به خـ هـلـکـیـشـانـ نـاـکـاتـ .

که گـهـلـیـکـ ئـاـخـرـیـ شـهـرـ بـوـ وـ بـوـ بـهـ چـهـنـدـ هـوـزـ وـ تـیرـهـیـکـیـ پـچـرـپـچـرـهـوـ وـ هـهـرـ بـهـشـمـیـ بـهـ شـیـوـهـیـکـیـ تـایـبـهـتـیـ قـسـهـیـ کـرـدـ وـ زـمـانـیـکـیـ ئـهـدـهـبـیـ یـهـکـ کـرـتـوـوـشـیـ نـهـبـوـ ،ـ دـیـارـهـ بـوـ هـیـنـدـیـ مـاـنـاـ ،ـ لـهـ جـیـاـ تـیـ وـوـشـمـیـهـکـ ،ـ چـهـنـدـ وـوـشـمـیـهـکـ درـوـوـسـتـ دـهـبـنـ .ـ ئـمـهـشـ بـهـلـگـهـیـ پـچـرـپـچـرـیـ وـ یـهـکـ نـهـگـرـتـوـوـبـیـ زـمـانـهـ ،ـ نـهـکـ دـهـولـهـمـهـنـدـیـ زـمـانـ .ـ

به کورتی : "کـوـقـارـیـ کـوـپـرـیـ زـانـیـارـیـ کـوـرـدـ " ،ـ پـیـوـیـسـتـهـ لـهـ هـمـمـوـ شـتـیـکـ پـتـرـ پـیـپـوـیـیـ دـهـسـتـوـوـرـیـ "ـ نـهـختـ وـ پـوـخـتـ "ـ بـکـاـ وـ شـوـیـنـ کـلـاوـیـ باـ بـرـدـوـوـیـ "ـ زـوـرـ وـ بـوـرـ "ـ وـ خـوـ بـهـ زـلـ گـرـتـنـ نـهـکـهـوـیـ "ـ بـهـ لـایـ منـهـوـ ،ـ سـهـخـتـگـیـرـیـ (ـتـعـصـبـ)ـ تـاقـهـ هـهـوـیـنـیـ پـیـشـکـهـوـتـتـهـ "ـ هـیـجـ کـارـیـکـ بـهـ خـاـوـخـلـیـ چـکـیـ وـ خـواـزـهـلـوـکـیـ نـاـچـیـتـهـ سـهـرـ "ـ بـهـ لـامـ ئـیـمـهـ دـهـبـیـ "ـ سـهـخـتـگـیـرـیـ کـوـیـرـاـ نـهـ =ـ الـتـعـصـبـ الـاعـمـیـ)ـ لـهـ (ـ سـهـخـتـگـیـرـیـ بـیـنـیـانـهـ =ـ الـتـعـصـبـ الـوـاعـیـ)ـ جـیـاـ بـکـهـیـنـهـوـ "ـ یـهـکـمـیـانـ فـرـیـ بـدـهـیـنـ وـ بـاـوـهـشـ بـوـ دـوـوـمـیـانـ بـکـهـیـنـهـوـ ،ـ ئـمـوـجاـ پـیـشـ دـهـکـهـوـینـ .ـ

جاـ لـهـبـرـ ئـهـوـهـیـ ھـیـشـتاـ هـهـرـ هـیـوـامـ بـهـوـ ماـوـهـ کـهـ "ـ کـوـپـرـیـ زـانـیـارـیـ کـوـرـدـ "ـ رـوـزـیـ لـهـ رـوـزـانـ هـهـسـتـ بـهـوـ بـهـرـپـرـسـیـارـیـ یـهـ گـهـوـرـهـیـ دـهـکـاـ کـهـ پـیـ سـپـیـرـرـاـوـهـ ،ـ وـاـ جـارـیـ بـهـمـ چـهـنـدـ سـهـرـنـجـهـ کـورـتـهـ نـابـیـنـ دـهـبـمـ "ـ بـهـ تـهـمـایـ ئـهـوـهـیـ "ـ کـوـپـرـ "ـ کـارـیـکـیـ وـاـ بـکـاـ کـهـ لـایـهـکـ مـتـمـانـهـیـ پـیـ بـکـهـنـ وـ رـیـزـیـ بـرـیـاـ رـهـکـانـیـ بـگـرـنـ وـ هـاـوـکـارـیـ لـهـگـهـلـدـاـ بـکـهـنـ "ـ چـونـکـهـ ئـهـگـمـرـ "ـ کـوـپـرـ "ـ خـوـشـهـ وـیـسـتـیـ خـوـیـ وـ زـهـبـرـیـ زـانـسـتـانـهـیـ خـوـیـ لـهـسـرـ بـنـچـینـهـ بـاـوـهـ بـیـکـرـدـنـ بـهـ سـهـرـ گـهـلـدـاـ نـهـسـمـیـنـیـ ،ـ ئـهـوـسـاـ کـارـهـکـانـیـ هـیـجـ نـرـخـیـکـیـانـ نـابـیـ وـ ئـهـوـ وـوـشـانـهـیـ دـرـوـوـسـتـیـشـیـانـ دـهـکـاـ ،ـ وـهـکـ ئـهـوـانـهـیـ جـارـانـیـ "ـ مـجـمـعـیـ عـلـمـیـ عـرـاقـ "ـ يـانـ لـیـ دـیـ کـهـ کـاتـیـ خـوـیـ زـانـاـ عـرـهـ بـهـکـانـ بـهـ گـالـتـمـیـکـرـدـنـیـکـهـوـ دـهـیـانـگـوتـ :ـ مـیـکـانـیـکـ "ـ بـهـ عـهـرـهـبـیـ بـوـوـهـتـهـ "ـ عـلـمـ حـیـلـابـیـ مـوـسـیـ "ـ وـ

پیش "ن" ای چاوگی که وتووه له ووشی "کردن" و "رشتن" دا ، ئەو تیپه دەنگداریه که به عەرەبی "الكسره المختلسه" و به ئەلمانی Murmelvokal و به کوردیش "بزروکه" يان بۇ داناوه (لەبەر ئەوهی بە ئەلفوپیی عەرەبی نانووسرىّ و له نووسیندا بزر دەبى) . بەلام kirdin کە ئەم دوو ووشیه بە ئەلفوپیی لاتینی بنووسىرىن ، بەم جۆرە rıstın ئەوسا بە تەواوى بۇمان دەردەکەوی کە تیپی پیش "ن" اکه "ن" يە واتا تیپیکی دەنگدار (بزوپىن) دەنگى نەك تیپی بى دەنگى (صامت) ای "د" دا "ت" .

ئەمجا ئەگەر هاتوو يەکىك ووتارىك يا نامەيەكى نووسى ، سا بە هەر بۇنەيەكەوە دەبى با بىي ، نابى لە پېيڭىدا بچى و چەند رستەيەك بە زارا وەيەكى ناواچىيى (محلى) تېكەل بە نووسینەكەي بىكات . ئەمجا ئەگەر كار دابەشكرا له نىيواوكارانى كۇرۇما و يەكىكىيان كتىپى "ئاۋىستا" ئى بەركەوت بۇ "لىكۈلېنەوە" ، پېيوپىستە ئەوهە دىيارى بىكى كە ئەملىكۆ لېنەوەيە لە ج روویەكەوەيە و بە ج ئاماڭچىكە . چونكە لىكۈلېنەوە لە ئاۋىستا ئەوهەنە زۆرە لە زمارە نايە خۇ ئەگەر ئەملىكۈلېنەوەيە بۇ ئەوهەي پېيوەندىي زمانى كوردى و ئاۋىستايى پېشان بدرى ، ئەوا لېرەدا بە ئاشكرا دەيلىم ئە ووتارەي لە "كۇفارى كۆپ" دا بلاوكىرا بوبوھە بۇ ئەوهەي پېيوەندىي رېزمانى كوردى و ئاۋىستايى بخاتە رwoo ، نە لىكۈلېنەوەيە لە ئاۋىستا و نە ئەو مەبەسىشى پېيَاوە كە بۇ دانراوە . چونكە يەكەم نووسىنەكە خۇي كورتەيەكى هيئىدى باسنى ، كە بە زمانى ئىنگلىزى لەسەر ئاۋىستا بلاوكىراونەتەوە ، لەبەر ئەوهە كورتەيەي بە كوردى نووسراوە " وەرگىرانە" و "لىكۈلېنەوە" نى يە و بىيچگە لمۇھەش ، ھىچ پېيوەندى يەكى تازە دۇزراوەي بەينى رېزمانى كوردى و رېزمانى ئاۋىستايى پېشان نادا ، تا نىيۇي بىرلى "لىكۈلېنەوە" .

دووايى لە ھەموو شتىك ناشيرىنتر ئەوهەيە ، پېياو بە راست و بە درو لە خۇي بايى بىي و بکەۋىتە مەتحى زمانى كوردى و بە زمانىكى يەكچار دەولەمەند بىداتە قەلەم و سوارى ھەسىپى خەيال بىي و بەلگەشى تەنبىا ئەوهە بى كە بۇ هەر مانايەك چەندىن ووشە ھەن (بىروانە ل ٤٢٢) .

شیوه‌هی له‌سهره‌وه با سمان کرد . "کوْر" ده‌بی بهر له هه‌مموو شتیک، سالی چهند خوینکاریکی لیوه‌شاوه له ده‌چووانی بهشی کوردی زانستگه‌ی به‌غدا یا سلمیمانی ، بنیوی بوْ ئه‌ورووپا بوْ خویندنی " زانستی زمانه وانی ی گشتی " و خویندنی " فیلولوژیای ئیرانه‌وانی " تا ده‌بنه پسپو ری زمانه‌وانی کوردی (۳۰) .

ئیسته‌ش لیره‌دا ده‌مموی چهند سه‌نجیکی خوم له باره‌ی هیندی شته‌وه که له ژماره‌ی یه‌که‌می " گوچاری کوْری زانیاری کورد " دا بلاوکرابووه‌وه بخمه بدرچاو . ئمه‌وهش وەک دلپییک له زه‌ریایه‌ک :

بوْ وینه : ئەگەر ووتاریک له‌سهر تیبی " ی " ئی خستنے پال (اضافه) له ریزمانی کوردی دا نووسرا و کروک (جوهر) ئی قسه‌کان هه‌مموو بهشی یەک دوو لاهه‌ری کرد ، نابی حفتاو پینچ لاهه‌ری له‌سهر رهش بکریت‌مه‌وه ، به جوْری که زوْری قسه‌کان پیوه‌ندی بان به بابه‌تەکه‌وه نه‌بی .

زانست ئه‌وه‌یه بابه‌تانه بی . لادان له بابم نه پیکانی ئامانجی کورمکی (مرکزی) بابه‌تمه . خوْ ئەگەر هاتتو له‌سهر " پیشگری : ڭه " و " پاشکر ی " و " ووتاریک نووسرا ، ئەوا نابی کاریکی واپکری ، ئەگەر شاره‌زا یەک خویندی یه‌وه ، بلى ئەمده هه‌مموو دوپاتکردن‌هه‌وه‌یه و به چهند دیریک ده‌ووتراء . هەروه‌ها نابی هەلمى وا گەورە بکری له چەشنى ئه‌وه‌ی " حرفي صحیح " ی عەرەبی به " تیبی دەنگدار " ئی کوردی (بروانه : ل ۶۹ ، ل ۲۴۰ ، ل ۲۴۲) بدریتتە قەلەم . چونکە " حرفي صحیح " و " حرفي صامت " هەردووکیان هەر یەکن و بى دەنگن ، له کاتیکدا " حرفي عله " دەنگداره . واتا " تیبی بزوین " و " تیبی دەنگدار " هەردووکیان یەک مانیان هەیه و یەکن . ئه‌وه‌ی ببزوی دەنگداره و ئه‌وه‌ی نصبزوی بى دەنگه . یا هەلمى لەمە زوْر زلتە : وەک ئه‌وه‌ی بووترئ " ن " ئی چاوگى (نون المصدرا له کوردی دا ، ئەم تیپانه‌یان پیش دەکه‌می : آ (وەک : سووتان) ئی (وەک : بېرىن) ، وو (وەک : چوون) ، د (وەک : کردن) ، ت (وەک : رشتىن) - بىروا نە ل ۲۵۳ .

